



# REWŞEN

Kovara Navenda Çanda Mezopotamya

---

<i>Şervanekî Azadiyê "Seyîd Riza"</i>	★	<i>Felat DILGEŞ</i>
<i>Ziwanê Kurdî - Diyalekta Kurmancî De Pronom</i>	★	<i>Lerzan JANDIL</i>
<i>Hin Nêrûtên Kurdên Yezidî</i>	★	<i>Amed û Zînê</i>
<i>Şer û Sosyolojiya Kurdan</i>	★	<i>Şevîn CIVAKNAS</i>
<i>Xelîlcan û Perîşan</i>	★	<i>Saîd HESTE</i>
<i>Rawestanê Le Lay Sayîr "Letîf Helmet"</i>	★	<i>PISMAM</i>
<i>"Roman ve Zaman"</i>	★	<i>M. YÜCEL - Ö. E. BULUT</i>

---

Sibat '94

Hejmar 12



*"...Di dawiyê de  
Kurdistanê got :  
Tiştê ku em niha bikarin ji bo te bikin,  
tenê ev e:  
Em dikarin te  
weke gul û nan û azadî  
li canê xwe hilbigrin..."*

**REWŞEN**

Kovara Kurdî ya çandî,  
hunerî, wêjeyî û zanyarî.

Mehê hejmarek tê weşandin.

Li ser Navê MKM Ltd. Şti. Xwedî:  
Hüseyin Kaytan

Berpirsiyara Nivîsaran:  
Edibe Şahin

Redaksiyon û Rêzkirina  
Nivîsaran  
REWŞEN

Navnîşan:  
Tarlabası Bulvarı  
No: 128  
Beyoğlu / İSTANBUL  
Tel: (1) 254 76 28

Şertên Abonetiyê:  
Nav Welêt:  
6 meh: 120.000 TL  
1 sal: 240.000 TL

Derveyê Welêt:  
6 meh: 30 DM  
1 sal: 60 DM

Bank:  
Edibe Şahin  
Hesap No: 0527432-9  
Döviz Hesap No: 3001696-4  
Yapı Kredi Bankası  
Taksim Şubesi  
Taksim / İSTANBUL

Qapax :  
Wênevanekî Başûrê Kurdistan

Çapxane :  
Yön Matbacılık  
Baskı Tarihi: Şubat 94

**NAVEROK**

Rûpel

Sergotar :	
REWŞEN .....	4
Şervanekî Azadiyê "Seyîd RIZA" :	
Felat DILGEŞ .....	5
Ziwanê Kurdî Diyalakta Kurmancî De Pronom :	
Lerzan JANDIL .....	7
Bo Sazekanî Mezrabotan :	
PISMAM .....	12
Tirs :	
TORÎ .....	13
"Teatra Jiyana Nû / Ta":	
Murat BATGÎ .....	18
Hin Nêrîtên Kurdên Yezîdî :	
AMED û ZÎNE .....	21
Şer û Sosyolojiya Kurdan :	
Şevîn CIVAKNAS .....	23
Xelîlcan û Perîşan :	
Saîd HESTE .....	25
Hevpeyvîn Bi Koma Avreş Re:	
REWŞEN .....	29
Mirovê Ku Li Felkê Digere :	
Samed Behrengî .....	31
Nîştimana Xwe Binase "SEMSÛR" :	
Rojê CIVAKNAS .....	33
Zman û Rastnîvis :	
F. Huseyn SAĞNIÇ .....	37
Çarşem :	
F. Huseyn SAĞNIÇ .....	40
Şêxo Zura :	
Seîd VERROJ .....	43
Turneya Navenda Çandê Li Kurdistanê Başûr :	
Î. XORT .....	49
Rawestanê Le Lay Sayîr "LETÎF HELMET" :	
PISMAM .....	52
Meşa Azadiyê : Bonn-Bruksel :	
Yusuf CACIM .....	53
Zaroyên Agirî :	
Şevîn CIVAKNAS .....	55
Înceleme "Roman ve Zaman":	
Müslüm YÜCEL - Ö. Enver BULUT .....	57
Danasîna Pirtûkan "Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri"	
Cemil GÜNDOĞAN .....	68

# SERGOTAR

*Xwendevanên hêja,*

Di warê hunerê de, problema edebiyata şoreşê, problemeke pir mezin e. Hunermend û wêjevanên Kurd, divê li vê problema xwe xwedî derkevin. Ev yek, berpirsiyariya hunermendiyê ye. Divê wêjevan li ser edebiyata heyî rûnenê, tiştên nû tevî edebiyata Kurdî bikin. Wêjevan, divê problemên xwe û çareserkirina wan bafirîne. Giha li ser koka xwe hêşîn tê. Pirs, ên me ne. Em divê li pirsên xwe xwedî derkevin. Ji hunermendên me gelek kes, hîna jî, pirsên edebiyata şoreşê di mejiyê wan de ne zelal in. Gelo, pirsên edebiyata şoreşê ya Kurdî çi ne? Çima mirovên me nikarin bi rîya hunerê xwe îfade bikin? Herkes helbestvan û general e. Û gelek kes, karê wan afirandina peyvên nû ye. Divê bê zanîn, ê ku ziman dafirîne, gel bi xwe ye. Ev nexweşiya afirandina peyvên, li ba ronakbîrê me hene, ji ber ku ronakbîrê me ji gel dûr e. Yek jî, zimanê zanyarî

ye, ew termînolojiyê navnetewî ye. Ne divê her peyvek zanyarî, Kurmanciya wê hebe. Geografya, ciyografya an jî cihografya, li her derê cihografya ye, lê erdnîgarî çi ye? Ji xwe di koka peyvên Latîni de Kurdî heye. Ji peyva "helîkopterê" re peyveke nû ne lazim e, ji bo ku "helî" îro jî di Kurdî de heye (eylo, helî). Ma ji afirandina peyvên pê ve karê me tune? Ma tu kar nemaye? Ji ber gelek sedeman, ev hejmara Rewşenê ya ku niha di destê we de ye, bi mehan dereng derket, ji ber ku ekonomiya Rewşenê pir dijwar bû. Nikarîbû xwe finansê bike û di ev rojên tengasiyê de, ji Navenda Çanda Mezopotamyayê re, bûbû bar. Problemên qadroyan hebûn, problemên têkiliyan hebûn, problemên belavkirinê hebûn û ev problem niha jî hene. Lê divê bîrê halkirinê. Niha, qadroyê Rewşenê yê teknîkî nû ye. Di belavkirinê de jî, me têkiliyên nû danî. Ji vê hejmarê pê ve, Rewşen wê bi mehan derkeve. Û ji vê hejmarê şûn

de em bi biryar in, ji Navenda Çanda Mezopotamyayê re nebin bar û divê Rewşen weke avahiyeke serbixwe, ji aliyê aboriyê li ser piyên xwe bisekine, xwe bi xwe finansê bike. Divê hûn jî, xwendevanên hêja, alîkariya Rewşenê bikin. Divê xwendevanên Rewşenê li Rewşenê xwedî derkevin, xwendevanên nû û abone peyde bikin. Hejmara nû ya Rewşenê ya meha Adarê, wê bi dîtî û formeke nû derkeve. Em dixwazin kovara me hîn bêtir ciwan û bi şahî be. Di vê kovarê de, divê beşek bi Tirkî jî hebe. Xwendevanên Rewşenê yê ku li unîversîteyan dixwînin, divê em bersiva pirsên wan ên hunerî û wêjevanî jî, bidin. Xwendevanên ciwan! Rewşen kovara we ye. Lazim e hûn alîkariya wê bikin, wê bidin xwendin, bidin belav kirin û berhemên xwe yê hunerî jê re bişînin û wê rexne bikin. Heya hejmara bê, bimînin xweş!

REWŞEN

# Şervanekî azadiyê Seyîd Riza

Felat DILGES

Tam 56 sal berê, di 18'ê Çiriya Pêşîn a sala 1937'an de, serokê serhildana Dêrsimê Seyid Riza û hevalên wî hatin îdamkirin. Seyid Riza, di 10'ê Îlona 1937'an de, li ser banga berpirsiyarên dewleta Tirk, ji bo peyivîna mercên lihevhatinê çû Erzinganê; lê belê dijmîn ew bi bêbextî girtin û avêtin girtîgehê.

Li gor dewleta Tirk, Serhildana Dêrsimê, roja Newroza (21'ê Adarê) sala 1937'an de, bi şewitandina pira li ser Newala Xarçikê dest pê kiribû. Lê belê bûyera şewitandina pirê, ji bo êrîşên hovaneyên dewleta Tirk tenê behane bû. Lewra ji mêj ve planên tenkîlîkirina (îmhaya) Dêrsimê dihatin kirin û ji bo vê yekê qanûnên taybetî (Qanûna Tuncelî - 1937) dihatin derxistin. Di sala 1935'an de, Mustafa Kemal di vekirina parlamentoyê de bi vî awayî dipeyivî :

*"Di karên me yê hun-dir de tiştê herî girîng pirsê*

*Dêrsimê ye. Ji bo çareserkirina vê birînê, vê kûnêra bi tirs û xof, bi çî awayî dibe bila bibe divê biryarên acîl bînin sitandin û selahiyeteke tam û fireh bikeve destê hikûmetê."*

Dewleta Tirk a dagirker bi Peymana Lozanê (1923), Beşê Kurdistanê yê ku para wê ketibû

sitandibû. Bi serhildanên Qocgirî û Şêx Seîd, Kurdistan hatibû "kedîkirin"; lê belê di Kurdistanê de devereke hebû ku nedihat, serî li ber tu kesî neditewand. Bêguman ev dever Dêrsim bû. Dewleta Osmanî bi xwe jî, gelek caran li dijî Dêrsimê serî li tevgerên leşkerî dabû û bi vî awayî xwestibû

ku koka wê bîne; lê belê li hember Dêrsimê bi ser neketibû. Dêrsimê kelemê nav çavên dijmîn, kela berxwedana Kurdan bû. Bi gotina Elîşer, *warê şêran* bû. Dêrsim azad bû, azad dijî û dixwest azad bimîne. Dêrsim di Kurdistanê de "*Kurdistanek azad*" bû. Kulên wê di dilê dijmîn de gelek bûn. Ew ji bo dijmîn tirs û xof; serêşek mezin bû.

Kemalîst dixwestin ku otorîta xwe bi hemû awayî li Dêrsimê jî pêk bînin û li vê herêma Kurdistanê jî pergala xwe ava bikin.

Lê Dêrsim bi hêsanî nedihat rê. Ji ber vê yekê, wan xwest ku ew pê



bi pê Dersimê dabigrin. Di serî de heyetên xwe yên şîretî şandin Dêrsimê; ji dîne îstifade kirin; derewên alewîbûna Mustafa Kemal li hawîrdorê belav kirin; berê eşîrên Dêrsimê berdan hev; qala avakirina birina rîyan û "medeniyetê" kirin. Hêdî hêdî dest bi berhevkirina çekên eşîran kirin; di vî karî de jî her carê eşîrek ji xwe re bijartin û eşîrên din li derveyî bûyeran hiştin.

### 1937 û "Tevgera Paqijiyê"

Di sala 1937'an de hêzên dewleta Tirk, li Dêrsimê dest bi "tevgera paqijiyê" kirin. General A. Alpdogan, di dîrokê de wekî Celadê Dersimê derbas dibe, bi selahiyetek gelek fireh bûbû serokê tevgerê. Gotina wî zagon, şopa wî xwîn bû. Mîrasa bi-hovîtî-kuştina Kurdan ji Alpdogan re, ji xenzûrê wî Nûredîn Paşa mabû. Nûredîn Paşa "hunera xwe" di serhildana Qoçgiriye de nîşan dabû û bi kirin û gotinên xwe navê xwe di dîroka hovitiyê de nivîsibû. Gotina xenzûrê Alpdogan, Nûredîn Paşa ewha bû :

"Me li Tirkiyê, yên ku digotin 'ZO' qîra wan anî; îcar dor, a yên ku dibêjin 'LO' ye."

Bêguman yên ku digotin 'ZO' Ermenî, yên ku digotin 'LO' jî Kurd bûn. General Alpdogan bi vê hestê û bi vê ramanê liviya.

Di serhildana Dêrsimê de hêzên dewleta Tirk, ji balafirên cengê bigire heta gazên jehrîn (çekên kîmyayî), hemî çek li dijî gelê Kurd ê destvala bikaranîn. Gund, tev gundiyan hatin şewitandin û xera kirin; jin, zarok, kal, pîr, bi sedan mirovên Kurd di şikeftan de bi jehrkirinê hatin kuştin. Dîroka mirovatiyê li Dêrsimê bû şahidê hovitiyên nehati-

ne dîtin. Di navbera salên 1937 û 1938'an de li Dêrsimê bi hezaran mirovên Kurd ji aliyê Tirkên hov ve hatin kuştin.

Herçiqaş îro peyva "Serhildana Dêrsimê" wek peyveke dîrokî cihê xwe sitandibe jî, bi rastî li Dêrsimê serhildanek tunebû. Lewra :

1) Jixwe Dêrsim heta sala 1937'an herêmek serbixwe bû

2) Serhildan, bi xebatên rêxistinî ve, li gor hin plan û bernaman pêk tên. Ev yek li Dêrsimê tune bû. Li hember êrîş û hovitiya Tirkan li Dêrsimê raperînek Kurdan pêk hatibû.

Serokê Serhildana Dêrsimê, Seyid Riza bû. Dr. Nûrî Dêrsimî û Elîşêr (Ev herdû kes serokên serhildana Qoçgiriye jî bûn) alîkar û şewirmendên herî girîngên Seyid Riza bûn. Di serhildanê de rista jina Seyid Riza, Besê û jina Elîşêr Zerîfê ne hindik bû. Elîşêr, bi bebêxtî, ji hêla biraziyê Seyid Riza, Rehberê ku xwe firotibû dewleta Tirk ve hat kuştin; Dr. Nûrî bi pêşniyara Seyid Riza derket derveyê welêt.

Û Seyid Riza li ber dara sêpiyê ewha qêriya :

"Ez 75 salî me. Va ye ez jî dibim şehîd û tevî şehîdên Kurdistanê dibim. Serhildan têk diçe; lê belê Kurd û Kurdistan dijî û xortên Kurd dê heyfa (tola) me bistînin.... Bimirin talankar, qatîl û zalim! Bimire hikumeta bê rûmet û derewkar!"

Kurdistan di serhildanan de dijî.

Kurdistan di berxwedanan de dijî.

Rihet razê, Seyid Riza!

Rihet razên, şehîdên Kurdistanê!

Ciwanên Kurd tola we distînin!...

## ax wondêra

### Çuxur

a

(Gelêrî)

Ax wondêra Çuxur a, lemin sono  
gavan o  
Celal Bayar amo, emso ma rê  
meyman o  
Non w sola ma nêweno, ma de  
xayîn niyadano  
Vano "zerê mi terseno, zalim ma  
ra az nêverdano"  
De wayî wayî wayî, wiy bege mi  
wayî  
Dest û bojiyê ma zumîn ra  
girêdayî  
Tê dima girêdayme ma cenî û  
camêrdî  
Kerdîme top, berdîme verê  
kerte Mazgêrdî  
Ardî verva ma axir makîneliye  
qurmîs kerdî  
De wayî wayî wayî, wiy begemî  
wayî  
Va ke "zalimû rew mara nê,  
domanê ma vişayî"  
De biye biye, wiy bege mi biye  
Bervena dana xo ro, Fîda  
Xatuna ceniye  
Vana "pîl w qizê Dêsimî qir  
kerdê, ti ra xo ver mekuye  
Wurze ra, na makînalîyê bîce,  
Dêsim ro bifeteliye"  
De wayî wayî wayî, wiy bege mi  
wayî  
Peyra sungî sanay ma, cîgeronê  
ma de vejayî  
Ver ra nay ve ma ra, qulunconê  
ma ra perayî  
Ma wuca vindarnayme, bira vîşt  
û çor sate  
Zalim ma zere de cîgerê ma  
potî  
Hên ke nay ma ra, top û qersuna  
polatî  
De wayî wayî wayî, wiy bege mi  
wayî  
Tija ammonî vera cendegê ma  
poyayî

# ZIWANÊ KURDÎ<sup>(1)</sup>

## DIYALEKTA KURMANCÎ DE

### PRONOM<sup>(2)</sup>

Lerzan JANDIL

#### Çend Persê Verênî

Xêlê waxt o ke ez gramerê Kirmancî ser ro xebetîn. Sebeta ke verê ma de karê gramerê Kirmancî çînê, bê guman no kar gelê (xêlê) derg wonceno, xêlê zametiyê xo benê û nae ra dot jî, bê kêmasiyan, bê şaşiyên nêbeno. Wayştina ma na wa ke, kesê ke sarê xo na derheq de dajnenê û na derheq de kar kerdo û ci ra fam kenê, alîkariya ma bikerê. Ma dest bidîme jûbînî: Karê xo, xebatê xo jû kême.

Ebi lebetiyene mordem nêşikîno karanê hewl veco. Zaf kesê ke Kirmancî zanê û şikînê ebi Kirmancî binivîsnê û biwanê, ya ebi Tirkî nivîsnenê yan jî ebi Kurmancî (Kirdaskî) nivîsnenê. Ez bi xo, hemberê nayê nîne. La belê, ha ebi Tirkî bo, ha jî ebi Kurmancî bo, xêlê nivîskarî estê. Teyna Kirmancî de kêmasiya zanîne esta. Zê her çî, derheqê ziwani de jî, bîr û bawariya mi na wa ke, ganî her diyalekta Kurdî bişikiyo xo hîra û xorî kero. Jûbiyena ziwani ebi zor nêbena, ebi hîra û xorî vilabiyena diyalektû bena. Na derheq de kêmasiya ma, kêmasiya rewşenbîranê ma û şarê ma zaf a. Ez wazena îta watenêde jû "rewşenbîrî" seba

wendoxan binivîsnê. No mordemek mi ra ebi Kurmancî vano ke "Tiştên zanyarî, polîtîk, îlmî û tiştên din ên zor, ez bi Kurmancî dinivîsnim, lê tiştên rehet, wek çîrokan û yên din ez bi Zazakî dinivîsnim." De yê bînî, çiyê ke peyê na perse de vîndenê, şima xo rê bifikirê. Çiyê niyanênî neraştê ne çiyê zanitenê û ne jî karê rindê. Ganî ma rayê ro nîna bicîme. Rû medîme mordemanê nîyanêna, cayê dîna ma miyan de çînêbo. Ma ganî pelêde bîne rakême. Sebeta daye jî, mi nayê ra ver vatîbî ke, "...Waxto ke her kes na derheq de fikrê xo vaco û binivîsno, ez bawer kena ke, no xebat tayîna raşt û rind êno kerdene û zonê ma tayîna zêde beno zelal" (Rewşen, mara taybetiye 10, pele 98). Ebi raştîyê, qe waxtê ma ê vîndkerdene çîno. Ma çîqa destê xo rew bicîme, hindê rew, hindê zaf xizmeta ziwani Kurdî û xizmeta şarê Kurdî keme. Ebi na bîr û baweriye, ebi na hêwiye ez piyakarkerdena ziwanzananê ma wazena û înstîtusyonanê Kurda zê YRWK silaynena ke, wa her kes na derheq de rolê xo kay bikero.

18. 08. 1993

(1) Ziwani Kurdî çik o? Zaf hêf o, la belê ziwani Kurdî seba tayine "Kurmancî" yo, seba tayine "Sorani" yo, seba tayine jî "Kurmancî û Sorani" yo. Ma Kirmancî yan jî ebi vatenêde zaf meşure "Zazakî"? Wo jî koî ra vejîya? Çiyêde henên jî bî? Mîr Celadet Bedîrxanî ra bicêrê hetanî ewro, nizana hetanî kamî, qe kesî, hama qe kesî dest nêeysto na diyalekte. Waxto ke mordem çiyê vaco jî, "rewşenbîr" vano "di zimanê Kurdî de ev ne wisa ye". Çima? "Ji ber ku C. Bedîrxan wisa gotiye" Ma bado na mesela ser ro bîr û bawariya xo nivîsneme, hatanî wo dem....

(2) Ez derheqê pronomî de, yanê name-diyen yan jî virayştene de tayê ebi ters a. Xêlê piyayî xo ver ra nama, persa, bîngersa virazenê; yan jî diyalektanê Kurdî yê bîna ra cênê. La bele xêlê xeletî û şaşiya jî kenê. Ze "hest". Hest kirmancî de hemberê nerm û axwinî (ebi Tirkî "katî") yo. Yan jî "qeleme". Xêlê Kurdî vanê na perse erebî ya. Na rayşt niya. Na perse Sanskritî ya. Persa "pênûse" na mana de bê qîmeta. Sebeta ke tayê caya de Kurdî, hurendiya "pê" de "te" vanê ganî na pênuse wuca "tênus" e bo. Ne çiyê niyanênî zaf e. Baş ez bawer a, na sate di hebî bes ê.

Ziwanê Kurdî (diyalekta Kirmancî "Zazakî"<sup>(3)</sup>) de hî-rê pronomê yewmarî û hîrê pronomê zafmarî estê û nê pronomî ze naman yê nê wontene. La belê, *Kirmancî* de kesê hîreyîne *Kurmancî* ra cuda wo. Kesê hîreyîn ê yewmar di heb ê. Yew nêr, yew jî makêk o.

**1 - Pronomê halê raştî<sup>(4)</sup>,**

**yan jî pronomê grupa yewîne<sup>(5)</sup>.**

*Formê yewmariyê*

1. ez

2. tu<sup>(6)</sup>

3. wo<sup>(8)</sup> (n<sup>(9)</sup>)

3. wa<sup>(11)</sup> (m<sup>(12)</sup>)

**2- Vernamê halê wontî<sup>(13)</sup>**

**yan jî pronomê grupa didîne.**

*Formê yewmariye*

1. mi<sup>(14)</sup>

2. to

3. ey

3. aye

*Formê zafmariyê*

1. ma

2. şima<sup>(7)</sup>

3. ê<sup>(10)</sup>

*Formê zafmariye*

1. ma

2. şima

3. yîna<sup>(15)</sup>

**Karardena pronoman :**

Vernamê grupa yewîne (ez, ti, o - a / ma, şima, ê), demê nikay de, hem ebi lêkeranê ke derbaz benê û hem jî derbaz nêbenê, ênê wontene.

**1. 1- Pronomê grupa yewîne ebi lêkeranê ke derbaz benê, demê nikay de:**

*kesê yewmarî*

Ez vînen (vînitên)

Ti wena (werden)

Wo nivîsneno (nivîsnayen)E nivîsnenê

*kesê zafmarî*

Ma vîneme

Şima wenê

A wazena (waştên)

**1. 2- Pronomê grupa yewîne ebi lêkeranê ke derbaz nêbenê, demê nikay de:**

*kesê yewmarî*

Ez miren (merden)

Ti şona (şiyen)

Wo yêno (amayen)

A kuna ra (rakewten)

*kesê zafmarî*

Ma mireme

Şima şonê

E kunê ra

**1. 3- Pronomê grupa yewîne (ez, ti, wo - a / ma, şima, ê), ebi lêkeranê ke derbaz nêbenê, demanê verêna de û kîpa de ênê ontene.**

**Demê verî de:**

Ez merda.

Ti şiya.

Wo ame.

A kewte ra.

Ma merdîme.

Şima şî.

E amêy.

**Demê verî yo rew derbaz bî de :**

Ez merdênê.

Ti şiyênê.

Wo amênê.

A kewtênê ra.

Ma merdênê.

Şima şiyênê.

E amênê.

**Demê verî yo rew derbazbî de :**

Ez merd(î)<sup>(16)</sup> bî.

Ti şîbî.

Wo amêbî.

A kewt(î) bî ra.

Ma merd(î) bîme.

Şima şîbî.

E amêbî.

**2- Pronomê grupa didîne (mi, to, ê - aye / ma, şima, îna), ebi lêkeranê ke derbaz benê demanê verî de ênê wontene.**

(3) Ez bîngêpersa (kavram) "Zazakî", "Dimilkî", "Dimilî", "Dumbelî" û êb, rayşt nêvînenena. Ma bi xo, xo ra nêvato "ma Zazay me, ziwanê ma Zazakî yo". No namê şaranê xerîba, kesanê xerîba no ma ra. Waxto ke mordem na rayştiye pers kero, kesê ke ebi "Zaza" yê nê namekerdene yan jî nas kerdene, xo ra vanê "Kirmanc yan jî Kird" û ziwanê xo ra jî "Kirmancî yan jî Kirdkî". Hemberê nayê de jî, kesanê ke Kurmancî qese kenê ra vanê "Kirdasî" û diyalekta dîna ra jî "Kirdaskî", nêvanê "Kurmanc" yan jî "Kurmancî". Persa "Zaza û Zazakî" 1820 ra nat ama nivîsiyen. Ewro jî saya sarê "rewşenbîranê" nezana biya aktuel û her kes jî vano : "Ez Zaza wa". Rind baş, wa to "Zaza" be. La belê mi ra jî nayê mevaze. Sebeta ke mana xo xirab a, mordema û mordematiye qij vînenena, kena nizm. Qe jû Kurd nêwazeno ke kes dê ra vaco "Kiro". Hama Kirmancê ma xo hênî qij, xirab û nizm vînenê ke, ebo xo, xo ra vanê "Ez Zaza wa". Mana persa "Zaza" jî ze persa "Kiro" xirab a. "Zaza" mana "Lal, pelt, kekeş, bê heş û bê fam" de amo û êno vatene. Rind! ma kam nê "Zazakî" ser ro xebetîyo yan jî ser ro xebetîno? Qe kes! Zaferiyê xo Tirkî yan jî Kurmancî. Seke nêvana "na diyalakte xora ziwan niya"!

(4) Halo rajyşt ebi Latîni (Casus Rectus) û ebi Tirkî jî (yalın hal) o

(5) Ez naca waxto ke mesela gramerî derbaz bo hurêndiya jî... de yew... cêna. Labelê sebeta ke lewê ma de niyo ro, ez zo bîn jû...cêna.

(6) Tayê caye de hurendiya "ti" de "to" jî êno vatene, la belê no rayşt niyo. Ganî "to" halo wonte de bêro vatene. Xêca "to", "tu", "tiyê" jî êno vatene.

(7) Hetê Dersîm û Erzinganî de hurêndiya "şima" de "sima" êno vatene.

(8) Hurêndiya "wo" de xêlê caya "aw", "ay", "yo", "yû", "o" jî ênê vatene.

(9) n = nêrî

(10) Hurêndiya "ê" de tayê caya "ay", "ayî", "ey", "jey", "yey", "îy", "yî" jî ênê vatene.

(11) Hurêndiya "a" de "aya" jî êno vatene.

(12) m = makêkî

(13) Halo wonte ebi Kurmancî halo rast yan jî ebi Latîni (Casus Obliquus) o, û ebi Tirkî jî halê "i, e, dan, den" î yo.

(14) Tayê caya de "min" jî vanê. (N. Rewşen, rûpelê 9.)

(15) Hurêndiya "îna" de "înan", "îne", "yêy", "yîni" û "yiyî" jî ênê vatene.

(16) Kirmancî de xêlê caya herfa "î" jî êna miyanê koka lêkerî û pirtûkanê dema. Ze "werdî bî, kerdî bî, nivîsnayî bî, kiştî bî, eyştî bî, vatî bî" û êb.



## Demê verî de :

Mi dî (ye).	Ma dî (ye; yê).
To werd (-e / -î). <sup>(17)</sup>	Şima werd (-e / -î).
E nivîsna(-ê / -ayî).	Îna nivîsna (-e / -ayî).
Aye waşt (-e / -î).	

## Demê verî yê dergî de :

Mi diyênê.	Ma diyênê.
To werdênê.	Şima werdênê.
E nivîsnênê.	Îna nivîsnênê.
Aye waştênê.	

## Demê verî yê rew derbazî de :

Mi dîbî.	Ma dîbî.
To werd(î) bî.	Şima dîbî.
E nivîsnaybî.	Îna dîbî.
Aye waştbî.	

## Rawayê (kîpê) waştene de :

Mi bidiyênê.	Ma bidiyênê.
To biwendênê.	Şima biwendênê.
E binivîsnênê.	Îna binivîsnênê.
Aye biwaştênê.	

## Raweyê (kîpê) vatene de :

Mi dî /-yo/-ya/-yê. <sup>(18)</sup>	Ma dî/-yo/-ya/-yê.
To wend / o/ a/ ê.	Şima werd / o/ a/ ê.
E nivîsn/-o/-a/-ê.	Îna nivîsn/-o/-a/-ê.
Aye wayst/- o/ a/ -ê.	

A- Waxto ke demê nikay de pronomê grupa yewîne kerdê / kerdox<sup>(19)</sup> (özne) bê, pronomê grupa didîne jî pişkver (tümleç) û rolê pronomanê halê rayştî jî vînenê (ebi lêkeranê ke derbaz bêne)

Ez to vînena.	Ma şima vînene.
Ti ê ana.	Şima îna anê.
Wo aye kîşeno.	E ma kîşeme.
A mi wazena.	

B- Demanê verêna de, pronomê grupa didîne kerdê lêkeranê ke derbaz nêbenê wê û pronomê grupa yewîni hurêndiya halê rayştî cênê.

Mi ti diya.	Ma şima dî.
To wo qarna.	Şima ê qarnayî.
E a tirtê.	Îna ma tersnayîme.
Aye ez tersna.	

## C- Pronomê grupa didîni

hurêndiya pronomanê milki de jî ênê vatenê.

Pronomanê îşaretî de, kesê 3'ne n û m'yê yewmariyê û kesê hîrînê zafmariyê de herfa 'd' ye êna verê pronomî.

Astorê mî.	Bonê ma.
Maya to.	Karê şima.
Kavirê (d)ê?	Darê (d)îna.
Çîmiyê (d)aye.	

D- No hal seba namanê ke eşkera niyê jî derbaz beno.

Astorêde mî.	Bonêde ma.
Birayêde to.	Karêde şima.
Kavirêde (d)ê.	Darêde (d)îna.
Çiyêde (d)aye.	

## E- Pronomê grupa didîne

rolê halê wontî (c. obliq.) jî vînenê.

Ez to ra vana.	Ma şima ra va.
To mi ra wazena.	Şima ma ra waşt.
Wo aye ra cêno.	E îne ra cênê.
A dê ra remena.	
A dê re <sup>(20)</sup> vana.	Merga ma de vaş zaf o.
To de şekir esto?	Şima de kar çîno.
E de nêweşiye esta.	Îna re bere.

Xape aye de ra.	
Ez dana to ro.	Ma dame to ro.
Ti merge ro şona.	Şima merge ro şonê.

Wo qule ro derbaz beno. E qule ro derbaz benê.

A ko ro şona.

Pronomo xoser : "Xo"<sup>(21)</sup>

"Xo" seba kesa û cinsa pêrîne, seba dema pêrîne derbaz beno, xo nêvûrnenê û hurêndiya pronomê ke pişkevê lêkeriyê cêno.

## 3. 1- "Xo" ze pişkevê lêkerî :

pronomê normalî	xo
Ez to wazena.	Ez xo wazena.
To mi wazena.	To xo wazena.
Wo aye wazeno.	Wo xo wazeno.
A ê wazena.	A xo wazena.
Ma şima wazeme.	Ma xo wazeme.
Şima ma wazenê.	Şima xo wazenê.

(17) Kirmancî de xêlê caya lêkerî demê verî de gor kesa û cinsa êne wontene. Eke dawîya lêkerê wontî de "e" bibo, na nîşanê makekî ya. To werd. To çî werd? Mi non werd. Naca "non" nerî yo, herfe nêna dawîya lêkerî.

\*Şima çî werd? Ma none werde. Naca "none" makekiya û "e" ye êna dawîya lêkerî. Îna çî werd? Îna di nonî werdî. Naca "nonî" zafmer ê û "î" êno dawîya lêkerî û geganê jî herfa nêmvenge, herfa "y" ye ena miyanê nê pirtika, ze diye, diyê. Wendevan ganî nê halî bicêro çîmanê xo ver.

(18) Mi dîyo : Naca çîyo ke amo diyene çiyêde nêri yo. Mi diya : Naca çîyo ke amo diyene çiyêde makekî yo. Mi diyê : Naca jî çiyê ke amê diyene çiyê zaf ê. Kirmancî de no qeyde gramêrî zaf muhîm o. Bê nê qeydî xêlê caya ziwan nêno famkerdene.

(19) A juyîne sebata ke ez hatanî nika ser ro nêxebetiyane, ebi raştîye ez bi xo nêzana pirtikê dawiyê "ox" formê Kirmanciyê bingehî de esto, yan jî çîno. La belê hetê Sîwerek, Pîran û cayanê bîna de ebi na pirtika dawiyê xêlê namê ênê viraystene. Ze "kerdox", "wendox", "aredox" û êb. Hatanî nika hetê ma de ez teyna rayştê "werdox"î biyane. Namê zafêrî ebi "van", "wan", "ji", "ik", "ek" ênê viraystene; Ze "gawan", "golokvan", "berxvan", "bilurvan", "avdelij", "hesenij", "leylik", "lacek", "ox" kotî ra amo ez nêzanena. A didîne jî ez nêwazena ze tayîne sarê xo ra persa, bingepersa vécê kes jî cira fam mekero. Seba nayê jî mi bingepersê gramêrî zafêrî Kirmancî ra gurefî ke bê zamat bêrê famkerdene. La belê ganî mordem dest berzo ci, nê karî ser ro bixebetîyo.

(20) Hurêndiya "dê re" de xêlê caya "dê rê", "î re" û "î rê" jî êno vatene.

(21) Hetê Dêrsimê tayê caya de hurêndiya "xo" de "ho" tayê caya bîna de jî "xwî" êno vatene.

E îna wazenê.	E <i>xo</i> wazenê.
Mi to diya.	Mi <i>xo</i> dî.
To ez diya.	To <i>xo</i> dî.
E a diye.	E <i>xo</i> dî.
Aye wo dî.	Aye <i>xo</i> dî.

**3. 2- "Xo" ebi lêkeranê ke derbaz benê û derbaz nêbenê.**

Ez to kîşena.	Ez <i>xo</i> kîşena.
	Mi <i>xo</i> kîşt.
To mi kîşena.	To <i>xo</i> kîşena.
	To <i>xo</i> kîşt.
Wo aye kîşeno.	Wo <i>xo</i> kîşeno.
	E <i>xo</i> kîşt.
A ê kîşena.	A <i>xo</i> kîşena.
	Aye <i>xo</i> kîşt.
Ma şima kîşeme.	Ma <i>xo</i> kîşeme.
	Ma <i>xo</i> kîşt.
Şima ma kîşenê.	Şima <i>xo</i> kîşenê.
	Şima <i>xo</i> kîşt.
E îna kîşenê.	E <i>xo</i> kîşene.
	Îna <i>xo</i> kîşt.

**3. 3- "Xo" ebi lêkeranê xoçarnaya (refleksiv /- dönüştü)**

Ez <i>xo</i> kena derg.
Ez <i>xo</i> erzena.
Ez <i>xo</i> pêcêna.
Ez awe kena <i>xo</i> ro.
Ez çî wele <i>xo</i> ro kerî.
Ti rûyê <i>xo</i> terena.
A porê <i>xo</i> şane kena.
Ma destanê <i>xo</i> şume.
Şima <i>xo</i> vilêznenê ra.
E <i>xo</i> xecelnênê.

**3. 4- "Xo" ze pronomê milkî, ze kerdî, ze pişkevî; bê îstisna *xo* halê wontî de hirêndiya varnama pêrîne cêno. Eke bingepers yan jî bingepersê hevoke hurêndiya kerdî yan jî pêrotiya kerda bicêro, *xo* êno xebatnayene û hurêndiya pronomê milkî jî cêno.**

Dara mi derg a.	Ez dara <i>xo</i> ya derge birnena.
(dare kerde)	(ez kerde)
Beranê to xurt o.	Ti beranê <i>xo</i> yê xurtî perjnena.
Gayê dê paygiran o.	O gayê <i>xo</i> yê paygiranî rameno.
Leçega daye sur a.	A leçega <i>xo</i> ya sure girê dana.

Bonê ma berz o.	Ma bonê <i>xo</i> yê berzî dawasneme.
Loxa şima giran a.	Şima loxa <i>xo</i> ya girane benê.
Mişonê dîne newe wo.	E nişenê mişonê <i>xo</i> yê newî.

**3. 5- Waxto ke hevoke de zaf kerdê bibê, "xo" dawiyê de hurêndiya kerdê dawiyê (pêrîne) cêno.**

Ez û birayê mi (ma) şomê çê apê <i>xo</i> .
Ez û to (ma) dawarê <i>xo</i> çirayneme.
No layik û na çêneke teba piyê <i>xo</i> ra şî dewe.
Ma û şima merga <i>xo</i> çînite.

**3. 6- Waxto ke pronomê milkî hurêndiya kerda pêrîne mecêro, teyna dîna ra hurêndiya jûkekî bicêro, mordem nêşkîno "xo" bixebetno.**

Ez û ti, ma nonê to rême ra.
Şima û dîna şonê malê dîna ver.
Alan û Şekire şonê malê Şekire ver.
Dîlane, Zozane û piyê daye (piyê Zozane) ma de niyadanê.

**3. 7- Waxto ke hevoke de kesî pêro ju bê, hevoke de xêlê kerdê bibê, teyna juyê dîna ze pronomê milkî êno xebatnayene.**

Ez û piyê <i>xo</i> ême.
A û maya <i>xo</i> şonê.
Ma û şima bonê <i>xo</i> virazeme.
Layik û çênêkê dewe malê <i>xo</i> benê bêriye.

**3. 8- Îta de "xo" nêno xebatnayene, sebeta ke pronomê ne cayê ju kerdî, ne jî cayê pêrîne cênê.**

Ez, ti û maya to şime.
Lajêk, cênike û mêrdê daye ênê.
Ma şima û piyê mi, ma şome.
Dîlane, Zozane, Gulbaharê û maya dîna mal doşenê.

**3. 9- Çand nimunê seba baş famkerdena "xo" yî.**

Ez ere biza <i>xo</i> cêrena.
Ti ero kardiya <i>xo</i> cêrena.
Wo karê <i>xo</i> de ro.
Dîlane, Zozane, Gulbahare teba maya <i>xo</i> ra malê <i>xo</i> doşenê.

Mêrik nêweşiya <i>xo</i> , <i>xo</i> de veceno.
Dela nê de niyadê, <i>xo</i> se kerdo derg!
Kutik siya <i>xo</i> de ginene waro.
Şima <i>xo</i> teyna diyo!
Ez, to û birayê <i>xo</i> vînena.
Şima qe <i>xo</i> ra nêşermayîne, çiyêde niyanên kenê!
Mordem ganî virêndî û pêyniya <i>xo</i> bizano!

4- Vernamo hurdemînhet (karşılıklı) : Jûbînî<sup>(22)</sup>

Jûbînî jî ze xo nêwurîno. Teyna hurêndiya kerdanê formê zafmariye ke hevoke de rê û eleqa xo jûbînî de esta, cêno.

Ma xatirê jûbînî zaneme.

Şima jûbînî de qese nêkenê?

E jûbînî ra hes kenê.

Îna û dîna daybî jûbînî ro.

Ma malê xo jûbînî ra bare keme.

Ma dereza û birazayanê jûbînî nas keme.

Ma mordemê jûbînî me.

E jûbînî ser ro mendî.

4. 1- Xebetnayena jûbînî, ze pişkevê lêkerî yo direkt yan jî îndirekt. Sebeta ke mordem bişikiyo ferqa "xo" û "jûbînî" rind fam bikero, çend nimûnê. Naca mordem rind vînenê ke "jûbînî," teyna hurêndiya kerdanê zafmaranê ke girêdayê jûbînî yê û eleqa xo jûbînî de esta, cêno.

<i>xo</i>	<i>jûbînî</i>
Ez awe kena <i>xo</i> ro.	Ma awe keme <i>jûbînî</i> ro.
Ti piyê <i>xo</i> ra vana.	Şima piyanê <i>jûbînî</i> ra vanê.
Wo hêgayê <i>xo</i> çînenê.	E hêgayanê <i>jûbînî</i> çînenê.
A kincanê <i>xo</i> derzena.	E kincanê <i>jûbînî</i> derzenê.
Ma awe keme <i>xo</i> re.	Ma axe keme <i>jûbînî</i> ro.
Ma <i>xo</i> ra hes keme.	Ma <i>jûbînî</i> ra hes keme.
Ma <i>xo</i> rê bon hêrna.	Ma <i>jûbînî</i> rê bon hêrna.
Domana <i>xo</i> şut.	Domana <i>jûbînî</i> şut.

4. 2- Ebi "jûbînî" mordem Kirmancî de lêkeranê jûbînîdayiya (hevedudaniyan) jî virazeno.

Mezela jûbînî kinitene. Şima qeyî mezela jûbînî kinitene?

Xatirê jûbînî zanitene.	Ma xatirê jûbînî zaneme.
Jûbînî (nê) waystene.	E jûbînî nêwazenê.
Jûbînî (nê) wontene.	Lac û pî jûbînî nêwocenê.
Jûbînî kîştene.	Şer de mordem jûbînî kîşeno.

## 4. 3- "Jûbînî" ze pronomê milkî :

<i>xo</i>	<i>jûbînî</i>
Ez û ti ma malê <i>xo</i> çirayneme.	
Ez û ti ma malê <i>jûbînî</i> çirayneme.	
Ma çê <i>xo</i> de rîme ( <i>xo</i> dîme).	
Ma çêyanê <i>jûbînî</i> derîme.	

plural :

Şima daranê <i>xo</i> birnenê.	Şima daranê <i>jûbînî</i> birnenê.
E şonê dewanê <i>xo</i> .	E şonê dewanê <i>jûbînî</i> .

## 4. 4- "Jûbînî" ze pişkevê (tümleç) verpirtika :

Jûbînî de qese kerdene	Ma <i>jûbînî</i> de qese nêkeme.
Jûbînî re kilamî vatene	Dewijî <i>jûbînî</i> re kilama vanê.
Jûbînî ra hes kerdene	Domani <i>jûbînî</i> ra hes kenê.
Jûbînî ra vatene	Ma <i>xo</i> rê, <i>jûbînî</i> ra vame!
Jûbînî ro dayene	Dişmenî danê <i>jûbînî</i> ro.

## ELO Û QELEN

Berhevkar : Girê Dersilê

Ji Eloyê Bolşî re jinê dixwazin. Elo dibe zava û roja din diçe rêçberiyê. Meha wî diqede, jina wî jî dikeve sergo, sergîna çêdike. Roja Elo dizivire mal, jina wî di nav rêxê de winda bûye. Elo ji xwe re dibêje :

– Bavê min jî dibêje, min ji kurê xwe re jin xwestiye.

Jinik tarê sergînan diqedîne û diçe kaniyê, ser û cilên xwe dişo. Jinik hîna li kaniyê ye, Elo kera xwe dibe ser avê, rastê jina xwe tê. Devê wî vekirî dimîne, ava heft çeman ji devê Elo diçe û ji jinikê re dibêje :

– Ezê te birevînim.

Jinik dibêje :

– Eman yeman! Elo, ez jina te me.

Elo dibêje :

– Xwezî tu jina min bûya...

Elo jina xwe direvîne. Li welatê Hezro jî, mirovê ku jinê birevîne qelen dide Baran Begê. Elo jinikê dibe Hezro, mala Baran Begê. Baran Beg dibêje :

– Elo ezê mara we bibirim û tê qelen bidî min.

Jinik dibêje :

– Heyran ez jixwe jina Elo me.

Baran Beg dibêje :

– Ez fêma nakim. Piştî Elo te revandiye, wê qelenê min bide.

Elo jina xwe dibe Bolşê, ji nû ve dawetê datîne. Gundî jê re dibêjin :

– Elo, jina te ye, tu çima dawetê datîni?

Elo ji wan re dibêje :

– Çi ji we re? Baran Begê doh qelen ji min stend. Îro daweta min e.

(22) "Jubînî" tayê cayanê bîna de ze "jûvîn(i)", "yewbîn(i)", "zûbîn(i)", "zûvîn(i)" "jûmînî" jî êno vatene. Ez sebeta jûtiya ziwanê ma "yewbînî" tayîna rind vînenê. La belê na nêna na mana ke "jûbînî" şaş o.

# bo sazekanî mezrabetan

## Pismam

Le spêdeykî geş û pir le wirşe wirşî beharî  
mêjiwman da

Diway xewnêkî qûlî jêr destan  
Diway geruw tasanêkî dirêjxayen  
Le parçeyekî em Kurdistanê xemgiyne da  
Sazekanî Mezrabetan...  
Mezrabetanî welatî şaristaniyet û mirovayeti...  
Çawy wewewziyan kwêr kird û rabûn  
Rabûnêk ke îdî be hîç hoviyeke  
Tirîsnak geruwî awazî netasênrêt  
Hemin rabûne û pencekantan paktir le rohî çoleke  
Be ser jiêy liq asay sazekantanewe  
Semay jîyan û berxwedan û serfirazî deken  
Ziyatir û ziyatir dexwazîn...

Dexwazîn :  
Geruwtan gewre minarey ras bêjî û netirsî gûtin  
bêt

Dexwazîn :  
Hevokekantan kevokî aşitî bin û le esmanî  
Kurdistan û  
Mirövayeti da le şeşey bal biden û sitran bo  
şehîdan û gerêla bibêjin

Dexwazîn :  
Mêşk û hizrî Kurdaney resenman le hegbey em  
sefere sexte binên

Dexwazîn :  
Ew sazane ke le temenî sawayeti le qonaxî dare  
dare dan,

Le amêzî zimanî şîrînî Kurdî da gir û gel biken...  
Çunke ke çewit helkişan, îdî rast nabinewe  
Dexwazîn :

Ziyatir û ziyatir dexwazîn...

Gelo :

Ba zewy ew baxçe renga û renga  
Be awy sazigarî Kurdistanê têr aw bêt  
Ta ziyatir û çaktir gûlî al û wala û be  
Bon û beramey xoş le amêz binêt.  
Ew holane bihejênin ke le derwazekanyan  
Awdiyw debin... Wa bêt millet hest biken:  
Le naw çiya û le nawendî şerî gerêla dan.

Çunke :

*Doza me tim serxwebûn e  
Ne talan e, ne kuştin... (\*)*

Gelî birayine : emro berpirsariyekî mezin  
Le estoy êwe da ye û be milwênan  
Kurdî tînûy azadî çawyan lew saz û  
Male birywe, ke ewey le amêzdan  
Eweş debê : ew berpirsariye le hemû  
Sat û kat û cêgakan da bihêninewe  
Berçawy xotan.

Eweş debê : dest lemlanêy çand û  
Folklor û dîrokî resenî milletekeman bin.

Eweş debê : Herdem kemasiyekanî xotan ça biken  
û be xoda biçnewe

Eweş debê : Sazekantan tifeng

Asa temaşa biken, çunke

Zor mezin in û mayey tirs û dûdilîn bo dujmin...

Belê, ew sazane mezin in... Le tifeng

Mezintir

Eger na... be tifeng û polisewê rû-be-rûyan  
nedebûnewe...

(\*) *Dêre helbestêke le sitranêkî Koma Çiya-NÇM*

# T I R S

## TORÎ

Tirên ji nişkê ve ji istasyona Erganiyê rabû, ber bi Diyarbekirê ve weke marekê kişiya. Hêdî hêdî xwe şidand. Hew bilûrvanê kor derdikete pêşiya wê. Kul û kovanên dilê xwe, xizaniya xwe jê re digot. Bê bilûrvan, îstasyon li trêne gelekî sar dihat. Pêwanê diviya kêlî berî kêlîkekê ji vir rabibî, xwe bigihêjenî istasyonên pêşî xwe. Rêwiyên xwe dabixî, bişînî cem xwediyên wan.

Bi rabûna trêne, Mendik çavên xwe ji ser avahiyên istasyonê rakir. Ji nav tariya şevê, ji wir û pê de, vegerande ser tava Bakur; ji wir, bi dilekî şikestî bir ser bajarê Erganiyê. Ji bo ku hêj xweştir bibîne, eniya xwe sipart ser cama şibaka trêne. Lê mixabin tariya şevê mefer nedayê ku bi dilê xwe Erganiyê bibîne. Tirên di neqeba pêşiya xwe de, Ergani li paş xwe hişt. Ma ji ku zanibû ku beriya van deveran weke prangekê xwe berdabû ser perên dilê wî. Nizanibû bê Mendik çiqas dixwest ku vê derê jî wekî deverên din bibîne... Ji istasyonê bi peyayî riya Erganiyê girt. Bi dilê xwe, di nav şinayên di keviya rê de ber bi bajêr hilkişiya herana bajêr. Niha, di bajar de guhertinên bûyî bî jî, ew têra xwe li taxa Bagur bimeyizandana. Ji wir hewaketana nav bajêr. Çawa biba, tev kolan û seqemên bajêr nas dikir.

Ne hewce bû hin bidine pêşiyê, wîna li nav bajêr bigerînin. Pêşî herana ber deriye mala mamoste Newîn. Zixurekê biavêtina cama wê. Newîn layî her carî wê zaniyana ku Mendik hatiye. Wê daketana pêşiya wî. Wîna hemêz bi kirina. Ser dilê xwe de bişidandana. Di navbera ştexaliyê de wê dîsa gazin ji suxteyên xwe yên Kurd bikirina. Li hember tev kêferatên wê, bi dilê wêna fêrî Tirki nedibûn. Lê tev suxte layî Mendik dilsoz, dost û dilovan bûn. Seba vê yekê, gelek hez ji wan dikir. Ne hewce bû ku tiştin ji wan bîn pirsîn, her tişt ji çavên wan dihatê xwendin.

Herçend Mendik ji ştexaliyê wê têr nebibana jî, di kolana ser milê rastê herana, mala ku apê wî lê diman. Bi dotmama xwe ra, li devê derî qasekê ji xwe ra biştexiliya. Bi dehan sal buhuribûn. Di van salan da, gelek qerqêşûn buwartibûn. Wê van bigotana dotmama xwe. Wê giraniya keser û kovanên dilê xwe liçekê hilwesandana. Bi vê sivikayiyê, wê ji cihê mayî têkoşîna xwe bidomandana. Ji wir, wê dîsa biketana nav Erganiyîyan. Bi wan ra hilkişiyana çiyayê ku Ergani pala xwe dayî yê. Li devê deriyê ziyareta Zilkif Pêxember, herdu destê xwe rakirina ber bi ezmanan û dia bikirina. Heye ku dilê Zilkif

Pêxember bi wan bêşiyana, herana ba Xwedê, ew jî, ji bo wan di daxwaziyan de bibana. Dê ji wan xizanî û belengaziyan rizgar bibana. Hew mêrxasên wan bihatana kuştin. Jinên wan bê mêr û zarkên wan sêwî bimana. Bi tu awayî gundên wan nehatana kambaxkirin, çiyayên wan nehatana şewitandin, malên wan neçûwana mîratê. Ji wir daketana şikeftên Hîlar. Nivîsarên di eniya şikeftên de bixwenda. Bixwendana: Bê kalikên wan Xaldiyî çawa yekîtiya êl û eşîrên Kurdan pêkanîne. Di nav wê yekîtiyê de bihneke farah derxistana. Ji wir, qîr bidana heval û hogiran. Qîr bidana Qerecdax, Cudî, Herekol, Sîpana Xelatê, Agirî û Cilo, dê ew jî deng vedin guhên derdora xwe. Dê tamara xewê rabî ji ser çavên wan. Bi hev re govendekê bigirîn. Keçên me bilîlênin ji wan ra. Dengên binê lingên wan deng vedana li tev nawal û geliyan. Ji serên çiyayan de ew deng hilkişiyana ezmanan. Ji wir, di mêjiyên mirovan de birawestana.

Bi rawestina trêne li istasyona Erganiyê, Mendik serê xwe ji ber cama şibaka trêne rakir. Li xortê pêş xwe yê razayî meyizand. Ew jî, layî xortên din ji êvarî ve razayibû. Hejîna trêne layî hejîna deydikekê li wan xweş hati bû. Xew ji nişkê de xwe berdabû ser

perên çavên wan. Xwe ji nişkê ve gêr kiribûn. Di naviyê de gelek nebûhurî, xew li derdora çavên Mendik geriyabû. Lê ew dîtina derdora xwe ji xewê çêtir didît. Ev çend sal hebûn ku nehatibû welat û gelekî bêriya welatê xwe kiribû. Dîtina seqlan, newal, çiyay û geliyekî, giraniyek ji ser mêjiyê wî radikir. Bi vê, hew ser dilê wî dikizirî, kelên giriyê hew qirika wî dişewitand. Girêkên di gewriya wî de sist bibûn ji nişkê ve :

- Pismam, got xortê li pêşberî Mendik gêrbûyî. Ez dibêjim, te hez ji cihê xwe nekir.

- Na, got Mendik. Ez ji bonî razanê cihan nabijêrim.

- Nexwe, tu çima nerazayî?

- Min dîtina derdora xwe ji razanê çêtir dît.

- Ma ne tu dever xwiya nakin. Di vê tariyê de, tê kîjan deverê bibinî?

- Dîsa ez deverina dibînim. Seba ku ez gelek caran ji van deveran de buhurîm, dizanim bê ji cihên em jê dibuhurin, hene. Ez wan bi tevayî nebînim jî, layî ku ez wana dibînim li min tê.

- Nexwe pismam, got yekî din ji wir ve. Bi min bî, te gelek bêriya welat kiriye. Wî em tev ji vî welatî ne. Em bi te nizanin lê, em gelek caran ji vir buhurtine. Em jî dizanin, bê li ku çî hene. Lê wilo li me hatiye ku em wan deveran hew dibînin. Bi tenê li ber çavên me dibuhurin. Wî tu divêyî deverê bernedî, wan cihan dîsa bibinî.

- Belê, got Mendik. Min gelek bêriya welatê xwe kiriye. Lewma ez divêm deverê bernedim, teva bibînim.

- Di nav wîqas xweşikayiyên Stenbolê de, te çawa bêriya welatê xwe kir? got ew zilam. Ma

ne te got 'ez li Şîşlî runiştî me'. Şîşlî û tarên derdora wê gelek xweş in. Mirov di nav wan xweşikayiyên de xwe ji bîr dike.

- Birako, got Mendik. Min derî Şîşlî û derdora wêna, gelek xweşikayiyên Stenbolê dît. Deverek jê nema ku ez neçûm ê. Ez wan deveran jî xweş nas dikim. Ez ne bêganeyê wan xweşî û xweşikayiya me. Lê...

- Lê çawa, got yekî din, ji cihê gêrkirî. Niha tê bibêjî ku ew der biqasî welatê min ne xweş in. Tê wêna bibêjî me.

- Na kekê min, got Mendik. Ez wêna nabêjim. Helbet ew der gelek xweş in. Min welatên Ewropa jî bi salan dît. Ew der jî gelek xweş in. Lê mixabin, ewqas xweşî û xweşikayî ne yên me ne. Kurên ciwanmêran welatên xwe ava kirine. Tiştê li ser rûyê gerdûn heyî, anîne ber destên xwe. Ew der ne yê me, yê wana ye. Em li wan deveran kesine bêganeyê ne.

- Welatê Ewropiyayî belkî, got dîsa ew kes. Em li wan deveran kesine biyan in. Lê li Stenbolê û bajarên din ên Tirkan, ne wilo...

- Te dît, got Mendik. Wî tu jî dibêjî bajarên Tirkan. Seba ku em Kurd in, ew bajar ne yên me ne...

- Em karin ji dîla wêna tiştê kî din bibêjin, got ew kes.

- Layî çî, got Mendik.

- Em karin bibêjin 'bajarên Endolê'.

- Ne di vê gotinê de jî ramana çida heye. Piştî ku em nebêjin bajarên welat, di tevan de cudatî heye. Ha te got bajarên Tirkan, ha te got bajarên Enedolê. Herdu jî tene gotinekê.

- Ne hewceyî gotinê ye, got yekî din, piştî ku cihê razayî da-

kete xwar. - Pismamê me rast dibêjî. Ew der ne welatê me ne. Em çî bikin jî em nabine kesên wan deveran. Erê emê herin û bîn, lê dîsa her kes li welatê xwe, li ser axa bav û kalan bextewar e. Ma wî ew jî hez ji me nakin. Di radyo û televizyonên xwe de bi navê "kîro" me dinavênin.

Tirên bi tev hêza xwe nêzika-yî dida Diyarbekirê. Rêwing bi Mendik ra şiyar bibûn. Pêşî guhdarî Mendik û du rêwing bûbûn. Piştî ra ew jî têkilî axaftinê bûbûn. Lê vê carê Mendik dev ji wan ve geriyabû û ew xwe bixwe miqeresî dikirin. Bi tevayî jî ya Mendik digotin. Ta trêna kete istasyonê, axaftina xwe domandin. Bi rawestina trêna li istasyonê, ew ji dev jî gotinên xwe berdan. Li keviya şibaka trêna rawestîn, jî xwe re li istasyonê meyizandin. Çend kes bi tûrik li milê wan, bi kîsikên di destên wan de, bi lez bazkî trêna ve dihatin, ji bo lê siwar bibin. Hin jî, ji trêna peya dibûn, ber bi teqsiyan ve diçûn, ji bo herine nav bajêr. Ji rêwingiyayî hin jî peya bibûn, li ber kaniya istasyonê civiyabûn, bi herdu kulmên xwe av li rûyê xwe dikirin, dixwestin ku tamara xewê ji ser xwe bavêjin. Da (Ji bo ku) qeremên xwe vebikin, çend serî di ber wagonan de çûn û hatin. Li ber rabûna trêna, her yek ji wan çûne cihên xwe. Derî çend karbidestên istasyonê û trêna, kes li ber trêna nema. Bi rabûna trêna wê ew kes jî li holê nebin. Wê derdor jî mirovan vala bibana. Ev yek bala Mendik jî kişand. Çend sal berî niha û salên buhurî de, rewş ne wilo bû. Ta sibê, mirov ji istasyonê kêr nedibûn. Ger ji rêwingiyayî, ger ji kesên ku wan bi rê dikirin, kesên ku dihatin pêşiya rêwingiyayî xwe, is-

tasyonê dadigirtin. Biqasî wan, kesên ku ji bo firotina tiştine istasyonê hebûn. Lê wî niha kes nebû. Lê çima Diyarbekirî ne di holê de bûn?

Tirên dîsa ji nişkê ve rabû. Hi-no hino (hêdî hêdî) li xwe şidand piştî ku ji istasyonê derket. Pêşî berê xwe da baskî deriyê Mêrdî-nê. Pişt ra vegeirî ber bi pira hesinî ya li ser çemê Dîclê. Wê ji wir ve jî, ber bi Bismilê ve herana. Di vê naviyê de, rêwingiyên bi Mendik ra, serên xwe danîn û razan. Mendik dîsa eniya xwe siparte camê, li derve meyizand. Qasekê tişteke nedît. Lê pişt ra çavên wî hînî tariya şevê bûn. Ji xwe ra deverin dît. Bi wan bîrokên xwe nûjen kirin. Pîrekên mastfiroş anî bîra xwe. Ew, her roj, ji berbangê ve şiyar dibûn, ji gundên nêzikî istasyonê radibûn, di destên wan de sitil an kulingên mast, li trêna danê sibê siwar dibûn. Hêj bajariyê Diyarbekirî şiyar nebûyî, ew dadiketin cihê bazarê. Ta firavîna dereng, li berbendî firotina mastên xwe radiwestîn. Piştî firotina mastên xwe, li istasyona Diyarbekirê dicivîn. Ji bo vegeirê, siwarî trêne dibûn. Vedigeriyan malên xwe. Haziriya roja dinê, ewê mastên xwe dîsa bibine Diyarbekirê. Di vê çûyîn û hatinê de, pîrekên mastfiroş gelek dadiwestiyan. Haveyna bextewariyê di rûyên wan de nebû. Di her dîtîna de Mendik berbendî yekê ji wan bûbû ku di nav xwe de an bi hinê din ra bikenin. Lê hêj rastî rûyekî wan pîrekan ê bî ken nehatibû.

Di nav tariya şevê de, li pêşîriya trêne, li deverekî dûr ronayî xwiya bûn. Ronayî li pey hev rêzikirî bûn. Ev jî nişan dikir ku nêzikayî didane Batmanê. Wê qaseke din li wir peya bibana. A baş

ew bû ku haziriya xwe bikirana. Rabû, benê şekala xwe girêda. Ji cihê daleqandî, rahişte saqoyê xwe. Rabû ku li xwe bike. Di wê naviyê de rêwingiyên din şiyar bûn. Wan jî haziriya xwe ya daketinê kirin. Yên li ba wî jî daketin xwarê. Di bihnekê de xwe şidandin. Runiştin cihên xwe.

- Pismam, got yek ji wan. Ma cihê te yê çûyînê heyê?

- Du malên xwişk û pismamên min hene.

- Tu bi ya min bikî, neçe mala tu kesî! Malên me bi xwe jî li Batmanê ne. Lê em naçin malên xwe. Hema li teniştê istasyonê çend otêl hene. Emê tev herine wan otêlan. Tu jî here yek ji wan otêlan. Seat jî didoyê şevê ye... Tê îşev li otelê bimînî. Bi şiyarbûne here malên merivên xwe.

- Ew çima? pirsî Mendik. Ezê ta ji Stenbolê bêm vê derê, malên mirovên min ji istasyonê di çend sed metreyî de bin û ezê rabim herim otelê? Ma ev dibe? Ma wê mirovên min çi bibêjine ji min re? Ya herî xirab, ezê çi bibêjime ji xwe re? Ez ewqas bêriya xwişk û xwarziyên xwe bikim, ez bême nêzikî wan û ez neçim wan nebînim? Ma ev qet dibe?

- Hema ez dibêjim, tu têgihêştî gotina min nebûyî... Ne, wa ye malên me bi xwe li vir in. Em bi mêvantî naçine tu deveran. Lê dîsa emê li otêlan bimînî. Tu bi ya me bike û here otelekî. Meçe nav bajêr.

- Ma çima hûn ya rastî ji wir nabêjin? pirsî yekî din ji wir. Berê bizane ku eger ew biçe nav bajêr, wê bê kuştin. Dema ku vê gotinê bibihîse, wê hingê xetera li pêş xwe de bibîne û wê berî me riya otelê bigire.

- Ma tu nabêjî min, bê wê kî min bikuje? pirsî Mendik. Ma

ne, tu dijminên min nîn in."

- Ma ne, dijminên me jî nîn in, pismam! Ma em evqas xwedî dijmin in? Ji bo em bîn kuştin, ne pêwîst e ku em bibinê xwediyên dijminan. Kurdbûyîna me besî wê ye.

- Ew kî ne? pirsî Mendik. Kî ne ku derdikevine nêçîra mirovan? Nas, nenas kî derkevî ber wan de dikujin? Ma ew jî ne Kurd in? Ma ne, em xwe bi xwe ne... Ma ne, di nav me de kesine biyan nîn in... Ev der welatê me bi xwe ye, ma ne? Çawa dibe?

- Lo bavo! got dîsa ew kes. Ku em zanîbana ku kî ne, ma me digote te? Ezê biçûwama, wan bi destên xwe bixeniqandana. Lê wa ye tu dibînî, em jî neçar in. Te dît ku hatin ji pay mirovî ve mêjiyê wî bela kirin û ji holê winda bûn. Ev ne karê mêranî an tirsonekiyê ye. Wa ye tu me dibînî! Ma çavên tirsê bi me ra hene?

- Bi rastî têngahim, got Mendik. Mirov çawa li welatê xwe, li nav mirovên xwe bitirse? Cihê ku mirov tê de di rehetiyê de be, bi tenê welatî wî, li nav mirovên wî ye. Ez bi salan ji derveyî welatê xwe me. Di van salan de min di rehetiyê de bi dilê xwe de nedît. Her tim di nav wan de yekî biyanî bûm. Tu carî em li hev germ nebûn. Ez bivê jî, ji min nayê. Ji min nayê ku ez li wan germ bibim. Ez bawer im ku ew jî di rewşa min de ne. Seba vê jî, em li wan bajaran li taxina, di seqem, kolan an di apartimanan da civiyane. Wan jî wilo kirine. Her kes bi mirov, nas, heval û hogirên xwe ra. Bi tenê bi wî awayî bîhna me derdikevî. Em li wan deveran jixwe bi hev digirin. Em li wan deveran jî, bi hev heyîna xwe didomînî. Nexwe, wê me bi hêsani jî holê rakin.

- Pismam, got yekî din ji rêwingiyên. Yên ku tu dibêjî, tev rast û bi serê xwe ne. Di welatê xwe de, li nav mirovên xwe, berê em tev di rehetiyê de bûn. Lê ew rehetiya ku tu dibêjî, nemayîye. Welat ne welatê berê, mirovên me ne mirovên berê ne. Seba vê yekê jî, way li wî ku ji welat bar bike, bireve, here deverine din. Rewşa me ev e. Edî tu û dilê xwe.

- Spas, birayên delal! got Mendik. Ez zanibim ku qatîlê min hema li derî îstasyonê li ber bendî min e, ezê dîsa layî berê yekser herime mala xweha xwe.

Ser vê gotina Mendik, hew tiştin gotine hevdu. Di navberê de gelek nebuhure jî, trêne kete îstasyona Batmanê. Berî rawestina trêne, kesên ku wê daketana, li ber deriyê wagonê civiyan. Mendik berî wan li ber derî bû. Bi rawestina trêne derî vekir û daket. Rêwingiyên pê ra û yên din jî daketin. Bi daketîna rêwingan tev dest bi bazê kirin. Bû raprapa binê lingên wan. Layî bablîsokeke li xwe şidandin. Di kêlikekê de ji riya trêne buhurtin û ji wir dûr ketin. Kêlikeke dengê binê lingên wan ji kolanan hat. Pişt ra ew jî hew hatin bihîstin. Mendik tenê bi serê xwe ma. Ew jî ji îstasyonê derbas bû aliyê bajêr. Çavên xwe li teqsiyekê gerand ku pê here mala xweha xwe. Lê di wan deveran de rastî tu teqsiyî an tu kesî nehat. Ta jê hat, di nivê seqemê, pişt ra nivê kolanên jê buhurt de diçû ku bi hêsaniyê bê dîtî. Heke hinin li kuştinê ber bendî hina bin, wê wî bibin û ew ji dêla hinên din ve neyê kuştin. Hingî seqem û kolanên jê buhurt xalî bûn, bitenê dengê binê lingên Mendik dihata bihîstin. Ew deng ji hêtên avayiyên deng

vedidan û li Mendik vedigeriyan. Mendik xwe li dengên binê lingên xwe digirt. Baweriya xwe bi wan danî. Bi vî awayî xwe gihan-de ber deriyê mala xweha xwe. Tiliya xwe birê ser cerasa derî. Dengê cerasê xurt derket, Mendik tiliya ji ser cerasê rakir. Bihnekê ma. Dîsa tiliya xwe rakir. Guhdarî hundirê hewşê kir. Lê tu deng ji hundir nehat. Vê carê bi kulma xwe li derî xist. Dîsa ber bendî pismamê xwe ma ku bê derî jê ra veke. Lê kesek nehat. Mendik, vê carê bi lingên xwe li derî xist. Pê ra jî navê pismamê xwe hilda.

- Segvan, Segvanooo! Kuro ez im! Ez Mendik! Mendikê pismamê te! Ez ji Stenbolê tîm.

Qaseke din bêdeng ma. Guhdarî hundir kir. Tu deng ji hundir nehat. Dîsa li cerasê da. Dîsa rawestî. Navê pismamê xwe dîsa hilda. Navê xwe got ê. Bi kulm û pêhna xwe li derî da. Di taliyê de deriyê hewşê ji nişkê ve vebû. Mendik tenê çavên pismamê xwe dît.

- Xêr e bavo! got Mendik. Ev çi tu xew e ku li hember vîqas lêdana derî tu şiyar nabî?

- De were, got Segvan. Zû bikeve hundir.

Bi vebûna derî Mendik kete hundir. Segvan bi dest deriyê hewşê girt. Çinqal li pay derî da. Mendik da pêş xwe û ketin hundirê malê.

- Ma bi rast we dengê cerasê an dengê derî nebihîst?

- Çawa me nebihîst, got Segvan. Bi dengê cerasê ya pêşî ez şiyar bûm, hatime pey deriyê hewşê. Ji hingî ve ez li pey derî bûm.

- Ma te dengê min jî nas nekir malava?

- Min nas kir. Lê ne bi teva-yî. Ta ku ez qenc ewle nebûm,

min newêra ku derî vekim.

- Keko, me bibexşe, got xweha Mendik. Wa ye tu dibînî ku bi me çi anîne.

Pişt ra çû herdu rûyê Mendik. Wî hemêz kir. Mendik jî çû eniya xweha xwe. Wê li teniştê xwe rûniştand.

- De ka bibêje min! Tu çawa yî? Zarokên te baş in ma?

- Spas keko! Em tev baş in. Xwedê kêmayiya te şanî me nede. Hûn çawa nin? Jinbira min, biraziyên min çawa nin? Hema te wan jî bi xwe ra baniyana.

- Sipas xweha min, tev baş in. Biraziyên te di kar de ne. Diya wan jî ber bendî wan ma.

- De here sax bin keko! Hatina te jî besî me ye...

- Niha Mendik birçî ye, got Segvan. Rabe tiştêkî bide wî!

- Na, got Mendik. Ez ne birçî me. Lê de ka bibêjine min, bê çi hewala van kesan e?

- Ma tu nizanî bê çi hewala wan e? got Segvan; ev çend sal in ku dewlet û Partiya Karkeran a Kurdan rahiştine hevdu.

- Belê ez wîna dizanim. Lê bitenê ne li vir e. Bi awayekî din mirov tîm kuştin. Kes nizanî ku kî wan mirovan dikuje.

- Ma karê kuştinê ye? pirsî Segvan. Ev ne kuştin e, qirkirin e. Mala hina li mîratê tînin. Didine ser malan, ew zarok, pîrek, kal û mavser, kî derkeve ber wan, dikujin. Ew malbatên ku diçin serê, ji binî ve diqelînin, tove wan ji ser rûyê dinyayê radikin.

- Ma ne, te got Partî û dewlet rahiştine hevdu... Ma ya van malbatan çi ye ku tîne qirkirin?

- Ew hevalbendên Partiyê ne. Ji malekê kesek hevalbendê Partiyê be, ew tîra aliyê din dike. Dêla ku bidine ser wî kesî, didine ser malbata wî jî, wê tofanê



bi serê wê malbatê tev ve tînin.

- Ew aliyê din kî ne ma? Bi-qasî tê zanîn, li aliyekî dewlet, li aliyê din Partî. Yên din kî ne êdî? Ew jî milîs in ma?"

- Na bavo, kesên li aliyê din ne milîs in? Milîs têne nasîn. Ew kesine çekdar in. Dewlet wan xwedî dike. Wan çekdar dike û berdide barstika Partiyê. Ew xwe venaşêrin. Her kes wan nas di-kin. Çekên wan di destên wan de, digerin. Lê li vir milîs nîn in, li vir celebekî din hene. Tu kes ên li vir nas nake.

- Ha ez bi vê yekê têngîjim... Wê hin ji malên xwe derkevin, bidin ser malina, wan malan li mîratê bigerînin. Layî tiştê nebûye, vedigerine malên xwe û kesek wana nabine... Ma ev qet dibe? Ma ne, li vir herkes herkesî nas dike... Vê carê bibêje min? Bê ev yek çawa dibe?

- Ez ji ku zanim? got Segvan. Tiştê ku ez dizanim, hêj tiştêk bi min û malbata min nehat û tu jî ji istasyonê bi sax û selametî hatî. Ez tiştêkî din nizanim.

- Na lo! Ma tu dibêji wê min jî bikuştana?

- De ka tu rastî wan bihata-na, wê te di cih de bikirina term!

- Ew çima? Ma ne, min nas nakin. Ez ne Batmanî me û ev çend sal e ku ez nehatime van de-veran.

- Ma qey wê ji te bipirsiyana bê tu kî yî, ji ku têyî? Jixwe, te yê belabûna mêjiyê xwe jî nedîtana...

- De devê xwe li xêrê veke! got xweha Mendik. Gotina wê jî, li yekî xweş nayê.

- Ew li me xweş bê an neyê, a ku dibe ev e... A baş ev e ku tu rabe cihekî ji birayê xwe ra rast bike ku bila razê. Sibê, emê dût û dirêj bişetixilin.

## gotinên pêşiyên

Berhevkar : Girê Dersilê

*Tu tenekê di nav ava zêr re kî,  
dîsa teneke ye.*

*Xwedê serî dibîne  
kumê lê datîne*

*Xwedî kir bi destê xwe,  
kir emelê serê xwe*

*Xwarin ya her kesî ye,  
mêranî ne ya herkesî ye*

*Zor digîhîje tor,  
tor ji taşiyê siviktir dibe*

*Tu bidî zîtika, nedî zîtika,  
tu yê bidî heqê dîzika*

*Bayê lêxist bir,  
çû ber tira golika*

*Gava dê bibe damarî,  
bav dibe filê kavarî*

*Kerê lawê kerêm av li berê  
bikeve şerê,  
heb ji hebê bike derê*

*Gur ji baranê bitirsiya  
wê ji xwe re kurk çê bikira.*

*Dirîka xwe  
bi destê min dernexe.*

*Kevirê aş çiqas giran be jî,  
aşvan bi fena xwe wî radike*

*Kes nakeve gora kesî*

*Jin û mêt, weke teyr û bêr*

*Ji serê çijikê qelî çê nabe*

*Kes delalya kesî xweyî nake*

*Bizina belek, şivanê kulek,  
êvarê bi hev re tên guhara teng*

*Bi qîzanî mûr bû,  
bi jinanî pîr bû*

*Diya zavê lotik diavê,  
diya bûkê kûkê kûkê*

*Diz ji beroşê re dibê  
wê de biçê rû teniyê*

*Hîv çiqas bedew be jî  
dîsa qusûrek wê heye*

*Hinek dikin, hinek dixwin*

*Dijmin nas bê jî,  
neke paşila xwe*

*Rewşa daran belg û fêkî ne*

*Rewşa malan zarok in*

*Rewşa çiya dar û devî*

*Rewşa kalan darik û qelûn*

*Rewşa mêran simêl û rû*

*Rewşa pîran tevn û teşî ne*

*Rewşa zeriyan bisk û kezîn e*

*Aş digere bi avê,  
law dike karê bavê*

*Bipirse ji kalê zeman  
û xortê geriyayî*

*Bixebite heta xwîn  
di ber neynûkê te re bavêje*

*Berxê sêwî beran jê der nayê*

# TEATRA JIYANA NÛ

## t a

Murat BATGÎ

Teatra Jiyana Nû, di ev 2 mehên dawî de, lîstikek bi navê "Ta / Sê Ewrên Dûr" pêşkêşî te-maşevanan kir. Bi form û nave-roka xwe ve ev lîstik, ji bo teat-ra Kurd a li Kurdistanê Bakur, gaveke nû bû.

Ji bo çi "Ta / Sê Ewrên Dûr"? Li Kurdistanê jiyana çî-

mê mirinê ne. Weke, "heyva Nî-sanê ku darên ter û mirovên çê wê xemlên xwe wergirin. Û fê-m bike û qenc bizane ku darên hişk û mirovên xirab wê ji agî-rê dojhê re bibin xwirde û nan."

Jixwe li Kurdistanê tu tiyatrî-dîn jî nemaye. A li Kurdistanê jî-

neke nû dijwar e. Lê li Kurdis-tanê, îro tu tiştêk li cihê xwe na-mîne. Jiyana diguhere, fikr û ra-mana jiyaneke nû û serbixwe li çiyana, li gundan û li bajaran deng dide.

"Teatra Jiyana Nû" bi vê ras-tiyê, di Pîşpera (Hezîrana) sa-lê 1992'an de ava bû. Bi skeç û

qas ji hev dûr in, ewqas jî nêzê hev in? Şoreşge-rî çiqas biserkeve, wê fe-odalî, koletî û kevnepe-restî jî ewqasî winda bi-be.

"- Ji nava tariyê ha-war dikim, ji binê erdê gazî dikim. Zincîrên koletiyê dêşinin milên min. Ey zeman, dayê min bîne ser dinyayê."

Li Kurdistanê bi şit-lên nû, bi bizirên nû ha-tina ser dinyayê dijwar e. Zincîrên koletiyê mî-na ku êdî tu car bi hev negirin, hatine perçe ki-rin. Zincîrên koletiyê hatine şikestin û li Kur-distanê jiyaneke nû tê ser rûyê erdê. Jiyanên din ên kevin jî, mehkû-



Perdeya Yekemîn 'Ta'

kurtelîstikên xwe eşkere dîke û armanca ku dide ber xwe jî, ev e, ku êdî lazim e teatrekî Kurdan jî hebe. Teatra Jiyana Nû bi skeç û kurtelîstikên xwe dest bi xebata xwe dîke. Piştî ku van skeç û kurtelîstikên xwe li hîn şev û şahiyana pêşkêşî gel dîke, valahiyek mezin di nav çanda Kur-dî de bêtir dibîne û dest bi lîstikên dirêj dîke, we-ke "Mirin û Jiyana", "Ji-nên Bindest" û "Dewaya Generalê Teneke". Ev lîstik, di Teatra Kurdan de rolên xwe leyîstin. Bi kêmasiyên xwe û bi çew-tiyên xwe ve ev lîstik di dîroka Teatra Kurdan de wê cihê xwe bigrin.

Lê Teatra Jiyana Nû, di lîstika "Ta / Sê Ewrên Dûr" de lîstikvanî, mûzîk, dekor, ronahî, derhêner û nivîskarî bi hunermendiyeke zêdetir tê dîtin.

Tenê mesajên sloganî û ziwa tune ne, mesajên hunermendiye jî hene. Ji bo ku temaşevan bifikirin û ji xwe hesabê mirovatiyê bipirsin lîstikeke baş e. Ev lîstik ji lîstikên din cûda ye. Lê ji ber ku "Jiyana Nû" teatrekî nû ye, kêmasiyên "Jiyana Nû"

wê hebin. Lê ev lîstika ku nû hatiye çêkirin (Ta / Sê Ewrên Dûr) hêviyek dide mirov ku wa ye teatra Kurdan jî çêdibe.

Lîstik sê perdeyên jî hev cûda ne, di navbera perdeyan de têkiliyên eşkere tune ne. Hatiye xwes-



Perdeya Duwemîn, 'Nêçîrvanê Kusiyan'

tin ku bi hevo-

kek an jî du hevokan têkilî çêbibe. Ji xwe derhêner û nivîskar Huseyîn Kaytan bi xwe jî dibêje, "di navbera perdeyên vê lîstikê de têkilî ne hewce ye"... Ji ber ku çiqas mekan ji hev cûda bin jî, her sê bûyer di eynî demê de diqewimin.

Jiyanek li Kurdistanê, jiyanek li metropolê Tirkîyê û jiyanek ku ji lawijên Yêzîdîyan hatiye girtin. Ew sê ewrên dûr in.

Di lîstikê de perda yekemîn, bi navê "Ta" ye. Ta, weke ku ew bi xwe jî dibêje, ji cemseye-

kî leşkeran hatiye avêtin, di şevkî reş de, wî ji nav miriyan avêtin xwarê :

*Ez avêtim vira*

*Vî bajarî biçûk*

*Tik û tazî ez ketim vira*

*Ez avêtim nav miriyan*

Li hember van tiştan Ta, tenê ji dil dixwaze ji xwe re here Kurdistanê û ji bo wê ji xwe re gemiyek çêdike. Mirov ji xwe dipirse "gemî û Kurdistan?" Ew tu car nayên ber hev. Lê Ta, li

em zanin nîn e. Ew tenê bi navê xwe ve Parsek e. Parsek weke ku xwe ji dinyayê veqetandiyê. Tiştê ku jê re pere dike tenê araq e. Li gor wî jî, "ev ava jiyane ye" :

*"Ev ava jiyane ye. Ku ev nebe, ez dimirim."*

Parsek bi navê Kurdistanê tu cîh nas nake. Ew dibêje :

*"Bi navê Kurdistanê tu cîh tune ye",* weke ku çepên Tirkan yê Kemalîst dibêjin. Bi vî ras-

tiya xwe, Parsek tiştên ku li Kurdistanê diqewimin, tiştên ku "Ta" qal dike, haya wî ji tu tiştê tune, an jî em bêjin li hesabê wî nayê.

Di vî perdeyê de hevalê ku "Parsek" dilize vî rastiye bihunermendiya xwe baş nîşan dide.

Lê hîn kê-

gorî xwe tîne ber hev :

Gemiyek bi çi awayî? Ji bo ku mirov gemiya Ta bibîne, divê mirov lîstikê bibîne.

Lê îro li Kurdistanê û li metropolên Tirkîyê tenê bi xwestina dil tişt çênabin, tiştêk nameşe. Divê mirov jiyana xwe, xwestinên xwe, pêşeroja xwe li gorî şer çêke, her tiştê xwe li gorî şerê amade bike.

Lê ev tiştên ku em rêz dikin, Ta bixwe ne di nav van de ye. Li vî perdeyê lîstikvanek din jî Parsek e. Parsek, parsekê ku

masiyên hevalên ku "Ta"yê dilize hene. Ji ber vê yekê "Ta", hêj baş eşkere nebûye.

Kêmasiyên derhêner jî, li ser rolê "Ta" hene. Ji ber vê yekê, Ta hêj baş eşkere nebûye, her tiştê Tayê nehatîye eşkere kirin. Lê dîsa jî, pir tiştan tîne ber çav. "Ta" xwe dide naskirin ku mirovên wisa ji nav gelê Kurd de hê jî, hene.

Li Kurdistanê hemî tiştên nû bi êşên mezin ava dibin. Xerakirina kevn û çêkirina bingeha nû, bi êşên mezin ava dibin.



*Perdeya Sêwemîn : 'Meşa Sucdaran'*

Di vê perdeyê de, li welatê Kurdistanê tirsas mezin, tiştên ku kevn in xera dike.

Kemal axa, ku bavê "Ta" ye, bi tirsas xwe ya ku pê diçe mirinê, an jî em bêjin tirsas mirinê, jiyana wî diqedîne. Weke tirsas Ta, tu dibê qey ev tirsas îrsî ye.

Şerîfe ev tirsas mirinê ya ku di dilê Kemal axa de ye dibîne û ji ber vî tirsas wî jî, ji wî natirse û pê qayîl nîn e. Ji xwe berê jî, bi wî qayîl nebûye, weke ku ew bi xwe jî dibêje :

"Min ji wî hez nekir, ez ji axê hez dikim. Û ji bo ku ew xwediyê axê ye, ew jî ji axê hez dike. Em herdu jî, ji axê hez dikin."

Li gorî Şerîfê evîn ev e. Lê dilê Şerîfê qet wisa nabêje. Wê hêj tu tiştêkî ji bîr nekiriye jî evîna Elî. Û bi Elî ve dixwaze ku xwe bigihîjine jiyaneke nû.

Elî, jiyana xaka ku endamê mirinê ye dibîne. Ji ber vê yekê, di dilê xwe de dev ji Şerîfê jî bernade. Û bi xwe jî, jê re dibêje :

"Heftê sal jî bibe ezê li benda te bisekinim."

Lê Elî, haya wî ji şer jî heye. Û ew jî di nav şer de ye. Ji xwe mirovên ku li Kurdistanê ne, bi tevayî di nav şerde ne.

Elî tirsas ku axa dibe mirinê dibîne. Lê belê Elî ev tirsas xerabûna feodalîzmê ku di dîroka Kurdistan de heye nayine ber çavan. Yanî bi her tiştên xwe bi zanistî nameşe, lê dixwaze li gorî rastiya ku Kurdistan îro tê de ye bi wî awayê bimeşe. Lê mixabin, divê daxwazî û zanistî li cem hev bin, weke şervanên Kurdistanê.

Bi rastî li ser perdeya sêwemîn mirov dikare pir tişt bibêje. Lê belê ev tişt bê zanîn ku di vî sahnê de nivîs ji aliyê Celadet Alî Berdirxan ve hatiye berhev kirin. Tekstê vê perdeyê ji lawîjên Yezîdîyan hatiye girtin. Yezîdî li du miriyên xwe, li goristanan, van xwestinên xwe yên olî (dînî) tînin zimên.

"Lo, ev dinya mîna ye : Zivistan ku darên ter û hişk û mirovên çê û xirab yek awa ne. Û sibeha qiyametê mîna ye : Heyva nîsanê ku darên ter û mirovên çê wê xemlên

xwe wergirin. Û fêm bike û qenc bizane, darên hişk û mirovên xerab yê ji agirê dojhê re bibin xwirde û nan."

Lê li hin cih jî, Hüseyin Kaytan bi xwe nivîsiye û xwestiye hin mesajan bide :

"Gotin dijwar e,  
ji kalê zeman birevin  
ji zilmê nerevin, çiya bilind in  
ji êgir nerevin, bimînin li kevi-  
ya çemê Feratê,  
bar nekin, tu kes azad nîne!"  
Wextek bê, emê bajarek çêkin,  
bajarek nû, li dora Dêrsimê,  
belê

...Ji bîr nekin  
gotina marê çiyayên mezin :  
Go, birano, wa niha  
li ser erdê me

ezmanekî reş heye  
wa genim kin û şewitî dimîne  
keser û xem e  
av nîne, tu av nîne  
bila her kes ewrekî hilîne ser  
milên xwe û bîne  
li eniya her kesî, bila rojek wî  
hebe,

rojek xweşik, belê  
bila her kes wekî baranê zelal  
be

belê, bila herkes bibarin  
av nîne, tu av nîne  
wa ew gotinên min ên dawê ne  
ji bo we

ew, pêşkên elmasê spî ne

Di Kurdistanê de her tişt di nav hev de ne. Çê û xerab, çiqas di nav hev de ne, ewqas jî ji hev dûr in. Çiqas dixwazin a kevn xera kin, ewqas mecbur in a nû jî çêkin. Ji xwe çê û xerab, kevn û nû tim bi hev re ne. Têkoşîna rizgariya netewî ya ku li Kurdistanê dimeşe, vê rastiye berî her tiştî xuya dike û tîne ber çavan. Û Teatra Jiyana Nû, bi hunermendî ev nîşanî gel dide.

# hin nêrîtên kurdên yezîdî

Amed û Zîne

Li ser Yezîdiyan bi sedan pirtûk û lêkolîn hatine çar! Tenê bi salan mirov dikare pirtûkan tev bixwîne. Edî mirov gava tezek li ser Yezîdiyan binivîsê, divê şaxekî jê bigre, hingî ku pir li ser hatiye nivîsandin. Biyanîyan -çi Ewropî bin, çi ne Ewropî binola Kurdên Yezîdî bala wan ji zû de kişandiye. Kurd di Rohilata Navîn de, netewek Îranî yê kevnar e û çiqas netewên Îranî hene, li ser hemîyan tesîra çand û olên biyanîyan çêbûye. Mirov dikare bibêje ku ew dirûvên Îrantiyê hema hema nema ne, tevî mîletên din bûne. Yezîdîbûna pariyekî ji Kurdan biyanî germ kirin û lêdan ku li ser Yezîdiyan bikolin û dirûvên Îrantiya kevin, bi taybetî li ser Zerdeştîyê tê de bibînin. Qasî ku em dizanin, pirtûka herî dawîna ku li ser Yezîdiyan belav bûye, ya nivîskarê Amerîkî, John S. Guest e (London, 1987.). Ev camêr bi salan bi Yezîdiyan re jiyaye. Niha gelek nivîskar wekî R. Cizre û yên din, lêkolîn li ser Yezîdiyan amade dikin.

Gava mirov bixwaze Yezîdîyê bi rastî binase, divê ji orf û adetên Yezîdiyan dest pê bike. Ew gelek şop û delavan li ber mi-

rov vedikin. Gelek nêrîn li ser k û ola Yezîdiyan hatine pêşkeş kirin. Nêrîn û tewrên şaş, gava tesîra Erebeke li ser Yezîdiyan tê dîtin, dibê sedemek ji bo Yezîdîyê giş bi musulmantiyê ve girêdin. Pîraniya wan dijminên Kurdan in; dixwazin rastiya mîletê Kurd veşêrin, vî mîletê kevnar wînda bikin, wekî çawa îro bi werîsê Zazatiyê jî dilîzin. Dijminên me dikarin bi armançên siyasî, bi derewan, bi xapandî, bi navê biratiya îslamiyê, bi navê cîhad û hwd... bangî Kurdên musulman bikin û xwe nêzîkî wan bikin. Lê Kurdên Yezîdî? Kurdên Yezîdî ji Kurdî pê ve zîmanekî din naxebitînin; nimêjên wan, adetên wan, qewlên wan, lawijên wan giş bi Kurdî ne. Kêmaqîlî ye, gava Ereben Iraqê wan Erebe bibînin, an jî Ermeniyên Rewanê wan Kurd nebînin.

Bingeha Yezîdîyê ji Zerdeştîyê tê; lê daxwaza înkare ya olên din li ser pir bûye. Çiyayên Kurdistanê, hebûna Kurdan heta îro parastine. Gotina "Ezdî, Yezîdî" bixwe ji gotina Avistayî "Yezete" (peristin, parastin) hatiye. "Yezîdî" ji ferîşteyên ola Zerdeştê mezîna e. Carina bi şeweyê kotir, carina bi şeweyê helo derdikeve.

Ev ferîşte li nav rojê, hîvê û stêrkan dijî. Mînaka din jî : Gotina "dîn" hinek ji Kurdên Yezîdî "dên" lêv dikin, wekî di Avîsta de hatiye nivîsandin.

Kurdên Yezîdî di destpêka biharê de cejnê pîroz dikin, derdikevin ciyekî. Ev cih bi piranî ziyaretek e. Hinek jî jê re dibêjin "cumayê". Hinek ji wan berê bi dizî diçûn, cejna xwe pîroz dikirin. Bi gûmana me, ew cejna Newrozê e. Îro, Yezîdîyên Şengalê êdî bê tirs ji wê cejnê re dibêjin "Newroz". Eger em ne şaş bin, hin Kurdên ku ne ji dil ve musulman in jî, vê cejnê pîroz dikin. Gundî di nav xwe de rojekê dibijêrin, yek derdikeve ser xaniyekî, bangî gundiyan dike ku sibê herin cejnê pîroz bikin. Gel qurban, dahol û zîrnê bi xwe re dibin; li aliyekî keçik direqisin, li aliyekî zarok ji xwe re dilîzin, li aliyê din mêr û jin govendê digrin û hwd... Dawiyê, tev bi hev re nîn dixwin.

Newroz, ji koka xwe ve efsane ye. Efsanebûna Newrozê ji Şahname Firdewsî tê. Çîroka Kawa di Şahnamê de derdikeve. Îranasê navdar, Charles Henri de Fouchecour, li ser Newrozê wiha dinivîsîne :

"Zerdeşt rêbertiya gelekî koçer dikir, li welatekî sar bi çêrandina pêz dijiya. Gel tenê du demsal nas dikirin : zivistan û havîn. Avakarê olparêz (Zerdeşt) wî Newroz çêkir. Newroz, ev cejna mezin a destpêkê diyar dikir, cejneke tim bi nav û deng e. Lê di bin bandora Misirê de, pêncsed sal beriya zayînê, sersal di Berçilê (Decembre) de dest pê dikir. Paşê, sersala Babilonî ciyê wê girt û Newroz ji dema Dariyos ve sersal e." (Histitre des Moeurs III, Encyclopédie de la pléiade, rûpel 1078 - 1079 binêrin).

Di vê gotara xwe de, em tenê li ser orf û adetên Yezîdiyan diwindin (disekinin):

- Yezîdî ji roja Sêşemê piştî nîvro, ta roja Çarşemê piştî nîvro bar li kerê nakin; ne kincan (cilan) û ne jî seriyan naşon. Eger mirov serê xwe hêvara Çarşemê bişo li ba wan gunehekî pir mezin e. Yan bobelatek (qeza), yan belayek tê.

- Yezîdî kincên (cilên) şîn li xwe nakin. Vê yeka hanê gunehekî pir mezin dibînin û henekên xwe pê dikin û dibêjin :

Ew rengê derpiyê pîrên Musulmanan e. Sala 1967'an, li gundê Şadêrê, çiyayên Kurd, li Başûr-Rojavayê Kurdistanê, xortek nexweş bû; "tentûr" (mirovekî xeyalî) dihat ê. Piştî ku şêxên Yezîdiyan hatin ser, gotin ku mala wan kincên şîn li xwe dikin, çi tiştên şîn di malê de hebûn, tev avêtin.

- Divê rengên kincên Yezîdiyan ên binî sipî bin, bi taybetî jî yên jinan.

- Yezîdî di hefteya sêwemîn a meha Yazdan de sê roj rojiyê

digrin. Mêjûya rojiyê wekî ya musulmanan nayê guhartin, ew tim li cî ye. Roja Sêşemê, Çarşemê û Pencşemê rojiyê digrin û roja Pêncşemê hêvarî cejin e. Piraniya wan jî, wê şevê dikê Misrê (Romi) ser jê dikin û dikin şîv. Ji bilî van sê rojan, çelê havînê û çelê zivistanê, mirovê ku bixwaze dikare rojiyê di nava 40 rojê de bigre. Pir kêmkes hene ku karibin herdu çelan bigrin, bi taybetî jî çelê havînê. Hinek ji wan hene jî, jî çele tenê jî çele rojên Çarşeman rojiyê digrin.



- Li nav Yezîdiyan, "Pêxûn" jî heye. Sê rojiyên din jî hene, jê re dibêjin: Rojiya Xidir Eylas. Ev rojiya bêtir ji bo xort û keçên berbext û ji bo kesên din ên ku dixwazin xêrên xwe pir bikin e. Hin kes hene, roja dawiyê tenê digrin. Ewên rojiyê digrin, roja dawiyê pêxûneke şor çêdikin. Nok, dendik, garis, genim û hwd... di sêlê de diqewrînin, dihêrin, xwê pir dîkinê, hêvarê dixwin û nabe kesek pê re avê vexwe. Wê şevê, çi kurik çi keçik, kî

kê di xwê de bibîne, ew dibe destgirtiya (ê) wî(ê). Di rojiyê de divê berf bibare, dibêjin : Rojiya Xidir Eylas li xwe kir keras.

- Yezîdî xesan, qernebîtan û zehîre naxwin. Pir kesên Yezîdî hene di nav Kurdên musulman de bi şaşîtî an bi fedî xes xwarine, lê bîstekê şûn de xwe bi tiliya xwe dane vereşandin.

- Yezîdî navê dermantirşkê bi Erebi hilnadin û wekî Kurdên musulman na bêjin "n'ene" ji ber ku ew nizika gotina "l'ene" ye û eger bi Erebi jî biaxivin, dibêjin: "m'ene".

- Yezîdî tu carî tûyî (tufî) ser hev nakin.

- Yezîdî ji bo Xwedê, Şêxadî û Melekî Tawis şeva îne li ber stêrê pirtiyân (nivîn) postekî û balgiyekî datînin û çira hundirê malê zû vêdixînin.

- Yezîdî kevirêkî soresipî, jê re dibêjin "sîvo" pir pîroz dikin. Kevirê Sîvo bi zarokên xwe ve dikin ji bo çavîni nebin; hinekên wan pê mêst heyvan dikin û hwd...

- Yezîdî biskên kurên xwe hiltînin. Gava zarok mezin dibe, porê serê wî êdî dirêj dibe, her malbatek şêxêkî xwe, biska kurik ji bo cara yekê hiltîne. Mafê kesekî din tune ye ku porê kurik kur ke. Qurban jê re tê kirin, şahî jê re dikin û hwd...

- Avsûn : Zerkek av li ser qewlekî tê xwendin, jê re dibêjin "Avsûn". Yezîdiyên şêxmendî dikarin maran bi canî bi destên xwe bigrin. Me bixwe dîtine, ji maran biparêzin Yezîdiyekî Şêxmendî mal avsûn dikir (av direşand), avsûn dida zarokan ku ne-tîrsin û hwd...

ŞER

Û

SOSYOLOJIYA

KURDAN

Sevîn CIVAKNAS

-1-

Li Kurdistanê her ku şerê qirêj fireh dibe û pêvajoya şoreşê bi pêşdikeve, sistema kedxwariyê ya zorê xwe hîn bêtir xuya dike. Hêzên dagîrker, her ku dawiya xwe dibînin, hîn bêtir ber bi hovitiyê ve diçin û hemû qeweta xwe ji bo ku vê pêvajoya li dijî xwe, li gorî menfeata xwe vegeşînin û ji bo ku temenê xwe dirêj bikin bikartînin.

Îro, li Kurdistanê bêalîtiya nema ye. Ref, heta dawiyê xuya û tûj bûne. Gel îro dizane, bê li kîjan alî wê cihê xwe bigere. Dewlet jî, vê tewra gel dizane. Li dijî gel, di her warî de şerê xwe yê qirêj dimeşîne. Ta ku di vê dema dawiyê de temama gelê Kurd weke teroristan dibîne. Dewlet, li dijî gelê Kurd di nava tewreke hovane de ye. Gund û mezran dişewitîne, kambax dike, wêran û talan dike. Gund, navçe û bajarên dide bergula. Herçî avahiyan ku ji binê destên wan derketine, vala dikin. Di vê dema dawiyê de, ji bo ku van zilm û zordarî û qirkirinên gel ji

aliyên esnafan ve tê protestokirin, berê xwe dan esnafan û karxaneyên wan jî talan kirin. Gundiyên ku berê li gundê xwe ji aliyê aboriyê ve hatibûn fetisandin, li navçe û bajarên jî, esnaf û bazirganên Kurd, ji vê rewşê para xwe standin. Bi vîna, dagîrkeran dixwestin ku Kurdan ji alî aboriyê ve jî, tune bikin. Çiqas dewlet ve armanca xwe bi navê ku pêşiya lojistika destika gerîla bibire jî, ne rast e. Ya rast, di her warî de tunekirina Kurdan e. Dagîrker bi vê armancê dixwaze li ser axa Kurdistanê pîroz, Kurdîtiyê tune bike.

Kurdên ku mal, gund û karxaneyên wan ji binî ve hatin xerakirin, ya çûn bajarên Kurdistanê, yan jî berê xwe dan metropolên Tirkên. Dewlet jî bo ku vê koçberiyê zêde bike, tiştê ku ji destê wê tê, teksîr nake. Bi vê politîkayê, çawa dixwaze ku Kurdan ji welatê Kurdistanê dûr bixîne û şervanên azadiyê tenê bihêle, ji alî aborî, politîka û çandê ve jî, dixwazê Kurdan ji koka wan biqetîne (bibire), wan bê şexsiyet bihêle û dû re vê bêşexsiyeta wan a ecêb, bi şexsiyeta xwe heyvan bike.

Gundiyên ku li gundê xwe qet radyo, televizyon û çapemenî nedîtibûn, gundiyên ku li gundê xwe ji dengê dengbêjan pê ve deng nebihîstibûn, gundiyên ku tenê di govendên dawetê xwe de listibûn û gundiyên ku ji alî aboriyê ve, ji ax û heyvanên xwe pê ve tu têkiliyên wan çênebûn, bi koçberiyê re, bi bandora çapemenî, radyo, tv û hwd. ji cudayî dengbêjên xwe pêrgî muzika erebesk, pop, taverna û hwd. hatin. Ji dêla govendên bi def û zîrnê, li bajarên rastî listikên dans û diskoyê hatin. Ji aliyê aboriyê ve jî, xwe di nava têkiliyên peran de dîtî. Vîna jî, seranser bandora soqê li ser hişt.

Di vê navberê de dewleta da-



gîrker gund û navçeyên ku vala dikir, bi kesên mamur û koçerên Tirk dadigre. Bi vê polîtîkaya xwe, em nizanin bê wê çiqasî biserkeve; lê belê bi vê xebatê dixwaze demografya Kurdistanê ser û bin bike!

Ji gund û mezran koçberiyê mezînan ber bi bajarê ve heye. Ev koçerên ku bi derbê ve têne bajarê,

ji jiyana gundê xwe ya civakî û aborî tîndarî û xwe di nava jiyaneke biyanî de dibînin. Ev biyanîbûn di bajar û metropolên Tirkan de hîn bêtir xwe xuya dike. Ev biyanîbûn li bajarên Kurdan ne pir zêde ye. Ji ber ku Kurdên ku ji bajarên Kurdistanê koç kirine û hatine metropolê, bi xwe re çanda xwe, zimanê xwe û adetên xwe jî anîne. Li bajarên ku jiyana xwe dom dikin, bi pirî awayan, kesên bajarî, ne durî hev in. Bes dîrbûn tenê bi cudabûna çanda çînî ye (sınıf kültürü). Ji xwe ev rastî, bandoreke çandê pir mezînan li ser gundiyên ku ji gundên xwe veqetiyane nahêle. Bajariyên ku bajarî ne, jixwe ne tam bajarî ne; nîgundî ne!

Belê, ev rewş li metropolên Tirkan bi her awa-

yên xwe cuda û dijwar e. Ji ber ku Kurdên koçber, li metropolên Tirkan ji koka xwe qetiyane. Di nava van metropolan de çerxên dewleta dagîrker weke ejderhayê wan daqurtîne. Berî her tiştî li metropolên Tirkan jî, saziyê li gorî çand, orf û aboriya Tirkan a rûniştî tune ye. Di nava saziyê wilo de, jixwe tu hevpariya Kurdan û Tirkan wê tune be. Ev rewş, wê saziya malbatê, ji binî ve ber bi guhertineke nexwezayî (sunî) ve bibe!

Ev malbatên koçer, di malên pir kevin de bi îcar dimînin. Car

caran jî, mînakên wisa hene ku mirov bawer nake. Di malên du mezînan (ode) de, sê-çar malbat dimînin. Jiyanê bi vî rengî bandora xwe li ser her tîkiliyên kesên van malbatan dihêle.

Di nava ewqas tengasî de jiyana carna bandoreke mezînan li ser mirovan dihêle. Divê mirov cihê xwe di nava jiyana civakî de big-

û zabîtan ve tî qedexê kirin, dezgehên wan jî wan tîne stendin, li wan tî lêdan û wan dixin binçav û zindanan. Bi ser de, weke ku sedemê koçberiya wan ne dewleta dagîrker be, jî wan re tî gotin:

"Kurdên pîs, hûn jî bo çî hatine van deveran? Herin welatê xwe!" Ev zordarî û biçûkdîtin,

her gavê di jiyana wan de rastî wan tî. Li kuçaya tî de dijînan çîranên wan jî bo ku bi zimanê Tirkî nizanin, yan jî baş nizanin, her diçe xwe tenê dibînin.

Bela ku vî rastiyê di jiyana xwe de her gavê dibînin, hesreta welat û gundê wan tu carî jî dilê wan dernakeve û bi civaka Tirkan a erebesk re nabin yek. Ji ber vî sedemê jî, di nava jiyana tîkiliyên bajarê de xwe bajarî nabînin û dilşad nabin.

Di van şertên îroyîn de jî, baş dizanin ku nikarin vegehin welatê xwe. Zanin ku vegehin welatê bi mirin û talankirina wan e!... Ev tirs, bi hisa tenêtiyê û bi bandora tekoşîna gelê Kurd, van koçer-



re, û carna jî, bermeqlûbî vî bandorê dihêle û mirov hîn bêtir durî tîkiliyên civakî dixê û kesan li paş dihêle. Ev mirov, li bajarên ku lê dijînan di nav kar û barê zehmet de bê ewlekariyê dixebitin.

Ev kesên koçer ku berê li gundên xwe, di kar û barên xwe de serkeftî bûn, di nava jiyana aboriya bajarê de ber bi windabûnê ve diçin. Di nava van koçeran de kesên ku karin bixebitin, bi piranî li ser dezgehên dixebitin. Di van dezgehên de birinca bi nok, midî, fêkî û hwd. tîne firotin. Ev xebata wan a aborî, jî aliyê polîs

ran jî ber xwe ve li riya xwenasiya xwe digerin. Pêşiyê ev ger xwe li xwedîderketina mirovên xwe, gundiyên xwe û Kurdên nêzîkî xwe, xwe xuya dike. Belê, bi pêvajoya tekoşîna ev tîkilî nema tîrî van kesan dike û berê wan di de gerîneke din. Ev gerîn, gerînek polîtîkî ye. Li dawiya vî gerînê xwe di nava tekoşîna de dibîne û jî nû ve ber bi gund û welatê xwe yî ku koka xwe jê qetandî bû, vî carê bi xwenasiyê polîtîkî û di riya çîyan re berê xwe di de gundên xwe.



edebiyata gel**Xelîlcan û Perîşan**Amadekar : **Saîd HESTE**

Bihara beleka çiyayê Agirî, pir bihareke çavbelek e, beleka xwînkela mirazşabûnê ye; gul û kulîlk bi hev ra dipîşkivin, mêrg û zozan tev dixemilin.

Leqînî ketiye ava berfa belekiyan, hemî şaxmesîl, ava wan dibin tev hev, dikişin. Berfa çiyayê Agirî, ji jêra dihele, hiltê, ber bi qurma çiyê ve hildikşe. El û eşîr, gişk ketine helana malbarkirinê; koç û bar, pez berdan, bi ber ve diçin zozanan. Xewna zozanan, vedigrin konê çarstûnî, konê çardehstûnî, dorê difetilin, vedikşînin, hebin û peşmalan dikin û qîz û bûkê şeng û çeleng çêdikin bêriya bi kulînan.

Şivan û berxvan lêdixine bilûrê, xweş dikin kilama nûrê. Pêşê hawardora çiyayê Agirî hemî bi kon û zomên xelkê koçerî dixemilîne. Lê em vê ji bîr nekin, Kurdên beleka Agirî, çiqas bibêjî ji çiyayê Agirî hez dikin. Lê gelek caran jî, jê hez nakin. Jê heznekirina wan, ji ber wê ye ku, wextê hewamê berfa belekiyan dihele, hildikşe qurma çiyê; îja wê çaxê av çiqas bibêjî dûr dikeve. Bi barê keran avê tînin. Wê çaxê, hêrsa xwe tînin. Ha, dibêjin, ev çî çiyayekî bê bereket e, qet kaniyek lê nîne. Yek jî hewamê ku derdi-

kevîne arê zozana, riyên wê çiqas bibêjî bi hevraz û derece ne û bi asê ne. Bi koç û baran ve, bi barê havînê rê diçin. Îja li wê hewamê hêrs dibin. Lê em vê ji bîr nekin, di nava Kurdên hawardora çiyayê Agirî da, hemî mirov gelekî bi bextewarî, bi hewaskarî, Agirî bi ziyaret dihewsînin. Bi Agirî sond dixwin. Geliyek heye, ji qurma çiyayê Agirî derdikeve; jê ra Geliyê Zeymana dibêjin. Di wî gelî da gelek ziyaretxane hene. Yek ji wan ziyaretxanan, Kurd jê ra "Merzelê Yaqub Pêxember" dibêjin. Yaqub pêxember dibêjin Kurd e, li wir şehîd bûye. Her sal nivê havînê da, diçin li-ser merzelê Yaqub Pêxember, kar û berxan şerjê dikin, qurban didin. Xweliya bin lingê Yaqub Pêxember tînin, li mala xwe xweliya teberik hesab dikin û gava zarên wan da pizik derkevin, xweliyê pizikê didin zarên xwe; ku nexweşî têkeve nav pezê wan, wê xwelî dixine stûyê pezê xwe. Nêzikê merzela Yaqub Pêxember kaniyek heye, ji wê avê tînin, wek teberik vedixwin. Geliyê Zeymanê, gelîkî çiqas bibêjî kûr û fireh e. Di hundirê gelî da buz-xaneyek heye ku berf û av binê ra davêje. Di binê buz-xanê ra av

5 kilometre dikişe, paşê davêje derva. Her sal Kurd diçin ser wî gelî ziyaret dikin. Kar û berxan qurban û şerjê dikin. Ziyaretekî ji wan, jê ra dibêjin Kaniya Şîr. Kaniya Şîr, ava wê çiqas bibêjî şêrîn e. Kurd, ava wê jê ra teberik dibêjin, ava wê bi salan û mehan di mala xwe da vedîşêrin. Kanîkî nêzikî Merzelê Yaqub Pêxember heye, hemû kesî bi destê xwe tanîn, polik û mûrî, gustîl, cem wana çî tişt hebûya, davêjin nav ava kaniyê, destê xwe dîsa dadixînin hundirê ava kaniyê, bi careke destê xwe lê digerin. Çi bi destê wan ve bihata, ew hildidin û derdixînin. Ew ji wan ra dibe tiştê gelekî bi qiymet û teberik. Dora wê kaniyê gelekî kevirên wek mermer hene.

Gelek çîrok û mesele li ser çiyayê Agirî hatine gotin. Gava serê çiyayê Agirî bibe dûmana reş, wê çaxê tê zanîn ku êdî şilî wê bibare. Îja li gorî wê, şixulê xwe dikin. Û gava serê çiyayê Agirî bibe mij û dûmana sipî, tê zanîn ku êdî bayê gelekî dijwar wê bê. Lê sala ku pêşiyê berfa qurma çiyayê Agirî bihele û hevraz here, êdî xelk dizane ku ew sal zivistan wê, gelekî berf wê bibare. Îja li gor wê, kadînan bi debara hey-

wanê xwe dadigirin, xwarin û xwekirina zarên xwe dibînin. Lê hêla Kurdên wir, xelkê koçerî ji xelkê deştî pirtir in. Lê deştî, pir giran li bajarê Bazîdê rûdinên. Bajarê Bazîdê li ser rîya kerwanan e. Lê li Bazîdê Kela Behlul Paşa, kela cihê kerwanan bû, cihê paşa û wezîr û wekîlan bû. Xudanê qelaçî bi celatçiyên bû. Ev der zindan bû, di nava Kurdan da pir navdar bû, hukumdar bû.

Dibêjin birazayekî Behlul Paşa hebûye, navê wî Xelîlcan bû-


ye. Xelîlcan hê zar bûye, dê û bavê wî mirî bûne. Xelîlcan cem apê xwe Behlul Paşa mezin bûye.

Lê Xelîlcan, çiqas bibêjî xortekî xurt bûye, jêhatî bûye, bedew bûye. Xelîlcan dibê şûrvanekî pir giran, jêhatî û çê, hertim pêşiya leşke-

rên Behlul Paşa pê guman derbas dibûn. Behlul Paşa, sa (ji bo) jêhatîbûna Xelîlcan pir pê şa dibû. Paşê, Xelîlcan hespekî wisa dabû peydakirinê, hespekî bijarê û jêhatî bû. Sa Xelîlcan her tim pêşiya esker û leşkerê wî bimeşe, pêşengiyê ji leşkerê wî ra bike. Lê Xelîlcan jî, ji hespê xwe gelekî hez dikir. Navê hespê xwe Kihelê Zerçal danîbû. Hespekî zerçal bû. Xelîlcan wisa ji hespê xwe hez dikir, bi xwe destê xwe alif û cihûr dikir, tîmar dikir û binê wî paqij dikir. Dêl û bijiyê hespê

xwe dikurtisîne. Serê dêla hespê, bi destê xwe her tim hine dikir. Hespê Kehilê Zerçal, pir bi worxe (seglavî) dimeşe. Lê gava Xelîlcan lê siwar bibû, bi rê diket, wisa dimeşî, tu xwelî li ber piyê Kehilê Zerçal ranedibû. Mînanî maran dimeşî. Xelîlcan wisa ji hespê xwe hez dikir, tu carî bi xulamên xwe bawerîya wî nedihat. Kehilê Zerçal nedispirt wan. Lê Behlul Paşa ji bo nêrîna hespê Xelîlcan çiqas xulam, şivan û gavan anî jî, wî li tu kesî amin nedid-

Xelo wê hingê xulamê Emer Axayê Mîrê Mila bû, gelekî ji Bazîdê dût bû. Hêla Kurdistanê ya çiyayê Solhangolê bû. Behlul Paşa gelekî ji Xelîlcan hez dikir, ji bo wê jî, hemî gotin û nêt-meremê Xelîlcan tîne dewsê. Behlul Paşê êdî kete îrîşa (êrîşa) cihê ku Xelo lê ye. Paşê da hînkirinê, girt wezîr û wekîlê xwe şandin, nameyek nivîsî û ji Emer Axayê Mîrê Milan ra da şandinê, Xeloyê xulam da anîne ji bo hespê Xelîlcan.



Xelo merivekî kinik, reş û bedcûre bû. Jarik û serê wî hemsê berda bû. Bi pir xeber nedida û bala xwe nedida mirovan. Lê çiqas bibêjî ji yalê heywanan da pispor û rêzane bû, pêçiriya bû. Wexta Xelo hat, îdî Xelîlcan eşqana (ji eşqa) lingê wî erd nedigirt, lê bû bifire. Xelo wisa bi

bû û hespê xwe nedispirt kesî. Bawerîya xwe li tu kesî netanî. Hemî rêçber û xulam giş zîvirandin. Li wê hêla Kurdan, nav û dengê şivan û rêçberêkî zaf belav bûbû. Bi pesnayî qala wî dikirin. Navê wî Xelo bû. Xelîlcan ji apê xwe ra weha gotê :

- Eger tu herî Xeloyê Xulam bidî wanîne, ezê paşê dest bi nihêrandina Kehilê Zerçal vekşînim.

Xeloyê Xulam ji cîkî zaf dût bû, xulamê Emer Axayê Mîrê Mila bû. Xulamekî pir pispor bû.

pêşkekî rind ve li hespê dinêrî, Kehilê Zerçal ro bi ro hecar (hertim) ser xwe da tê û diqebile. Xelo rojê sê cara, şevê sê cara hespê qeşa dike, lê gihayê rojê tek carekî dide hespê. Ew jî danê êvarê didê. Lê danê dinî hemî ceh didê. Ew jî cehê bê ka didê. Heftê carekê jî derdixîne derva, qerimandina hespê lê dide vekîşandine. Xelo bi xwe jî lê siyar dibû, berê Kehil dida çiyayê berkelê, qasekî dajot û digerland. Hingî Xelo hatibû, giha pir nedida hespê, hesp gelekî sivik bû.

Lê berê giha pir didane hespê, hesp pê qelew bibû. Xelo hat giha da birînê. Kihêl çiqas bibêjî xwe beravî hev da. Xelîlcan bi xwe hespê xwe caran siyar dibû û halê hespê dinêrî ku gelekî rind bûye. Îja wê çaxê gelekî şa dibû, eşqana digirt û çavê Xelo paç dikir.

Îda bihar vebûye, hemî der mêrg û çîmen, gul û kulîlk bi hev ra xemilîne. Xelo îdî Kihêlî çend wext e ku li nav mêrgan ditewilîne. Xelo rokê lê nihêrî, Xelîlcan jî hate hinda (ba) tewla hespê, cem Xelo li çêra hêşîn rûnişt. Xelo ji Xelîlcan ra weha gotê, go :

- Axayê min, tu bi qedrê Xwedê ke, tu çima nazewicî?

Xelîlcan wê gavê pir hêrs bû, hêrsa xwe ji Xelo ra derdixîne :

- Xelo, min ji te hez dikir, tu xwe li ber çavê min didî reşkirinê. Hela ev zewaca min bi te maye?

Xelo dibêje :

- Axayê min, ev çima tu hêrsa xwe ji min derdixî? Ez bo xêra te dibêjim. Min tiştêkî xerab ji te ra negot.

Xelîlcan :

- E Xelo, wileh ez tiştê weha pir şerm dikim. Îja ji bona wê, min ji te ra hêrsa xwe anî.

Xelo :

- Axayê min xweş be, ev tiştêkî helaliya Xwedê ye. Eva serê hemû kesî ye. Lê ez darê dinê da çiqas gerîm, min bi xulam û bi rêçberiya gelek mîr û axayê Kurdistan kir. Min li darê dinê da ser te ra tu bedew nedît. Lê min ser Perîşana qîza Emer Axayê Mîrê Mila ra jî jin nedît rind û bedew. Îja rind û bedew heye, wisa Xuda xaliqandiye, çav û buriyê wê lê şekir dibare.

Xelîlcan wê çaxê tamîş neda, got ê :

- Xelo, hera dîsa ji min ra salixê Perîşanê bide.

Lê Xelo rindbûn û bedewbûna Perîşanê bi devekî wisa bi hûr û gilî dike, Xelîlcan îdî hemû roj tê cem Xelo, hercar dibêje :

- Xelo, de ji mi ra dîsa salixê Perîşanê bide. Xelo bi devekî wisa va salix dike, dilê Xelîlcan kervana dilê wî jê diçe. Carina heye, Xelîl sê-çar caran diçe cem Xelo, rindbûn û bedewbûna Perîşanê bi ser hev dide salixdanînê. Carina jî, wextê Xelo salixa Perîşanê dide, wisa bedewbûn û rindbûna Perîşanê bi dil û canê Xelîlcan da peyda bûye, wextê Xelo salixê Perîşanê bide, Xelîlcan wê hingê bi kervana hêsrê çavan dibarîne, digrî. A li wî qirarî Xelo wisa salixê bedewbûn û rindbûna Perîşanê dida, Xelîlcanê jî qet Perîşan nedîtî, li ser bengî bû. Xelîlcan îdî sa Perîşanê ne li nîn e, ne li avê ye; tim xem û xeyalê wî da Perîşan Xanim tê da rûniştî ye. Çiqa bêjî Xelîlcan jar û dariviye bona Perîşanê. Xelo rokê weha dibêje :

- Xelîlcan, axayê min, mala te xera bibe, tu haqasî ber xwe dikevî, reng û rûçikê te nema ji bona Perîşanê. Eger tu rastî dil kî, ezê te ra vî şixulî biqedînim. Perîşana qîza Emer Axayê Mîrê Mila ji te ra bidime standinê.

Xelîlcan wê hingê agir serê wî dikeve. Dest avîte pêsîra Xelo, dihejand, weha got ê :

- Ez bi qurbana te me, da bêje, tu dê çî qirarî vî şixulî miraz kî? Ev qîza tu dibêjî, ez ji bo wê helyame mînanî wan berfê bekiyan a hanê. Ez dixwazim bibînim, te wisa ji min ra salix kir,

îdî şev bûye xem û xeyalê min, qudumê çongê min nema.

Xelo weha dibêje :

- Axayê min, Xudê ji te razî be, tu ji min ra kapê çî qirarî davêjî? Min heft sal mala wan da xulamî kiriye. Ez wê malê baş dizanim, nas dikim. Lê ez vî gilî didime te, lê belê tu çendekî destura min bide, ez herim wir, salix û suluxê te, nav û nîşanê te, bedewbûn û jêhatîbûna te ezê ji Perîşanê ra salix bidim. Îja tu wê hingê bibîne, Perîşan xanim jî, ew jî bo te bengî û danavî bibe. Îdî agir serê Xelîlcan ketiye, qe mecal nedayî, girt û destûra Xelo da. Xelo rê girt çû, berê xwe da êla Emer Axayê Mîrê Mila. Ela Emer Axayê Mîrê Mila, li zozana serê çiya bûye. Wextê Xelo diçe nava êlê, bi ser hespê peya nabe, berê bala xwe dide ciyê ku Perîşan hertim lê rûdinê. Dinihêre Perîşan Xamin ne li mal e. Perîşan Xanim çûbûye ser kaniya avê. Xelo li wir îdî qe rûnanî, li qesta tiştêkî din, merivê malê dixapîne, li wir şûn da dizivire yalê kaniyê, diçe cem Perîşan Xanimê ra xwe digihîne. Hinga Xelo xwe gihande der kaniyê, hinda Perîşanê. Lê gelekî hev kêfxweş bûn. Perîşan Xanim ji Xelo ra ha dibêje :

- E kuro, bēnanxweyî; tu çiqas merivekî bê kiramet î, bê rûmet î... Meriv rêwîti derbas dibe cîkî, avekî ji kanîkî dixwe, hewamek derbas be, dîsa ku meriv bê hinda wê kaniyê, meriv diçe dîsa ji ser wê kaniyê aveke dî jî dixwe. Te li heft salan mala bavê min da rêçberî û xulamî kir. Heta niha tu ji me qetiyayî çûyî, te gere bigota ez rokê herim, dîsa xatirê xwe ji wan bixwazim. A tu

niha li ser piştê hespê xwe qe peya nabî, dîsa derbaz dibî diçî. Qet nabêjî ez herim qasekî mala wan rûnêm.

Xelo weha got ê :

- E Perîşan Xanim, ez feqîrê Xudê, ezê çawa kim? Diçim dibim rêçberê xelkê, bin tal-niçê xelkê da dimînim. Ji bin belengaziyê da ancax serê xwe xweyî dikim.

Xalo dîsa vedigere :

- Lê Perîşan Xanim, tu qet nabêjî, te xêr e, tu sa çi hatî?

Perîşan :

- E Xelo, ez qijika Xwedê, ez çi dizanim tu sa çi hatî? Tu merivekî ceraçî û hekîm û pisporê hêwîn î. Kî çi zane dîsa kîjan Paşa li pey te ye? Bextewaro, tu îdî bûyî pisporê vê hêla Kurda, te li ser destê xwe digerin.

Xelo :

- Perîşan Xanim, ezê çi ji te veşêrim, îja çawa ji Xudê veşêrim? Ez sa tiştêkî wisa hatime, ev şixul hemî ji bo te ye. Lê belê, gelo ez bibêjim tu hêrsa xwe ji min ra neynî?

Perîşan Xanim bi hêdî ber xwe da dinêre:

- De bibêje, Xeloyê delal! Ez çima hêrsa xwe ji te ra binim?

Xelo :

- Perîşan! Ezê hinekî bi mêranî xebardim. Tu belkî zanî, çavê min îsal du sal in ser te ne. Lê belê ez û tu va qet li hev nakin. Çima? Tu qîza began î, axan î, ez qijikê Xwedê feqîr û rêçber û xulam im. Geh li vir im, geh li wir im, ne li mêrê mal û hala me. Belengaz û stûxwarê xelkê me. Ez ne li layiqê te kibar bi nûbarê me.

Perîşan :

- Xelo, ez bi Xwedê kim, ezê ji birayê xwe ra bibêjim, yê çik û pîka li ser te xin. Lê ez vê jî bibêjim, te gelek alîkarî daye mala bavê min, nanê mala bavê min xwariye, tu çawa kêrê didî nanê mala bavê min? Tu qet şerm nakî, wisakî xeber didî? Ne gerê ez û tu va mînanê xuşk û bira bûna, tu hera hê jî çavê nepakî li min dinêrî? Kuro bênanxweyî, tu çawa cur'et dikî, çawa zarê te aldigere dibêjî?

Perîşan wê çaxê dewiya gotina xwe da kel û girî hêsrê çavan barand. Xelo :

- Perîşan, Xwedê ji te razî be! Hera qasekê li min sebir ke, min sebir ke, ez çi ji te ra dibêjim? Min ji te ra caweka çawa aniyê? Tu çima wisa bêsebiriyê dikî? Tu qîza Emer Axayê Mîrê Milan î; divê tu çiqas bêjî baqil bî, çima wisa zû hiltizî, tu min bawer kî ez vî tiştî ji dilê xwe dibêjim, ez ji bo kesekî dî hatime, tu çima wisa hefsala xwe teng dikî, tu hera qeseke min mêze ke, guhdar ke, ez ji te ra tiştêkî dilxweşî û rind bêjim.

Perîşan, wê hingê hinekî xwe giran digire, pêşa mizara xwe va hêsrê çavê xwe ziwa dike, çavê xwe ber ve Xelo dike, dinihêre, Xelo îdî ser hespê peya dibe li ser kevirêkî rûdinê.

Xelo :

- Perîşan, bira xwezî lingên min bişkesta, ez nehatama vira, xwezî qet ew hesretê nehata. Lê ez dixwazim tu qaseke kerem ke li min mêze ke.

Perîşan :

- Ez hêvya te me. Bêje Xelo, ka tê dîsa çi bibêjî?

Xelo :

- Eê, Perîşan, tu dîsa salix nebî, ez dinêrim ka hê tu gazin lomanî û şeranî.

Perîşan :

- Xelo, kuro ê Xwedê dilê te da xilxem heye, bêje ez guhdar dikim.

Xelo îdî hinekî hêrs bû, serê xwe hinekî ber xwe da danî, ke te mijulbûnê, deng ji xwe birî. Perîşan jî, li wira maye şipê sekinîye ser piya, hemsala aliyê Xelo dinêre.

Perîşan :

- E Xelo, te çima deng ji xwe birî, tu kerema xwe tune çi bêjî, ezê herim, te çima hefsala xwe wisa teng kir.

Xelo wê gotina Perîşan ra hinekî xwe beravî hev da yalê wê nihêrî, wê hingê Perîşan Xanim, hinekî li ber dilê Xelo va hat, weha go:

- Kuro, bê îsaf, tu çi zû dixeyidî, lê tu hewqas gilyê nerind ji min ra dibêjî, qet ez qasî te naxeyidim. Ez gilî didime te, ez te naşkînim.

Xelo wê hingê hinekî xwe beravî hev da geş bû, hîsikek ra hişte qefesa xwe.

Xelo :

- Perîşan, da tu zanî, niha tenê ji bo hespê Xelîlcan ez birim. Xelîlcan birazê Behlul Paşa ye. Behlul Paşa, paşayê êla Kurda a Kurdistanê ya vî alî ye, paşayê me hemiyan e. Li Xelîlcan jî delalê dilê paşayê kilê çevê simil xanimê ye. Xem-xeyal qîz û bûkên bajarê Bazîdê ye, ew zehf mîrekî çê ye, şevê li deşta ye, rojê li çiyê ye. Siwarê hespê Kihêlî Zerçalê ye.

*Dumahîk Heye*

## Hevpeyvîn

bi

## KOMA AVREŞ

re

Mirov hîsê xwe bi muzîkê tîne zimên. Li welatê me hîs, ê şahiya serhildanan e, li pey şehîdan keribandin û hevî ye, ji jana cihêkirinê ye. Muzîka me jî, li ser vê bingehê ava bûye.

NÇM sazenda çanda Kurda ye. Di NÇMê - Şaxê Amedê de gelek

komên muzîkê hene. Koroya zarokan jî heye. Ev kom tev li NÇM - Şaxê Amedê xebatên xwe didomînin. Emrê wan di nava 11 - 15 salî de ye. Navê wan "Koma Şehîd Avreş" e. Helbest û muzîka xwe, bi xwe çêdikin. Me li ser navê Rewşenê, ji bo nasîna wan çend pirs ji wan kir.



**Rewşen :** We kengî dest bi xebatên muzîkê kir?

**Koma Avreş :** - Em her çar merivê hev in. Malbatên me tev bi muzîkê ve mijul dibin. Ji bo vê, em jî ji biçukiya xwe ve di nav muzîkê de ne. Yanî em, muzîkê ji malbata xwe hîn bûn.

**Rewşen :** Berî NÇMê we li ku derê xebatên xwe dimeşand?

**Koma Avreş -** Na! Tu carî li ci-

hêkî din xebatê me çênebû. Me xebatê xwe li malê dom dikir. Hin em li ser besteyên xwe dixebitîn him jî stranên ku li xweşiya me dihatin, em li ser dixebitîn.

**Rewşen :** Çima we xwest hûn li NÇMê bixebitin?

**Koma Avreş :** - A yekemîn, ji

batên xwe bi hev re didomînin.

**Rewşen :** Navê we çima "Koma Şehîd Avreş" e?

**Koma Avreş :** Wexta me dest bi xebata xwe ya vir kir, birayê me Avreş şehîd ket. Keda wî li ser me jî bo muzîkê pir hebû, û ji bo ku em navê şehîdan bilind bikin, me ev nav li

xwe kir. Me ji hevalê xwe yê din re jî got ku em wî navê li koma xwe bikin, wî jî qebl kir. Û navê me bû "Koma Şehîd Avreş".

**Rewşen :** Stranên ku hûn dibêjin, di nav wan de besteyên we jî hene?

**Koma Avreş :** Belê, me him nivîsand, him jî bestê wan çêkir.

**Rewşen :** We qet li ser muzîkê ders dîtiye?

**Koma Avreş :** - Me tu ders li ser muzîkê nedî-

tiye, me li NÇMê dest bi dersên muzîkê kir.

**Rewşen :** Hûn karin muzîka ku çêdikin şîrove bikin?

**Koma Avreş :** Bi dîtina me muzîkê divê zimanê gel be û derdên wî, şahiyên wî û rewşa wî bi her awayî bîne zimên. Em bi muzîka xwe dixwazin bibin zimanê gelê xwe.

**Rewşen :** Di derheqê çêkirina

muzîka rojên azad de, hûn çi difikirin û xeyalên we çi ne?

**Koma Avreş :** – Bê guman muzîka azad di welatekî azad de çêdibe û diji. Îro çiqas bêjin "muzîka Kurdan serbest e û herkes kare çêke", ev gotin ne rast e. Em tu carî muzîka ku dixwazin, nikarin çêbikin. Di rojên azad de, muzîka ku di dilê me de ye, em karin çêkin. Û emê rehetir bigihêjin gelê xwe. Mînak, li vir wê festîvala aşîtiyê çêbibûya. Emê jî li wir derketana programê, cara yekemîn berhemê xwe pêşkêşî gelê xwe bikirana. Lê nehiştin festîval çêbe, em jî negihîştin mirazê xwe.

**Rewşen :** Li dawiyê, tişteki hûn dixwazin bêjin heye?

**Koma Avreş :** – Pêşî em dixwazin li ser mirovên piyasayê yên ku dibêjin "em muzîka Kurdî çêdikin" çend gotinan bêjin. Bi rastî ger dixwazin tişteki ji bo çanda Kurdî çêkin, bila li NÇMê xebatên xwe dom bikin. Hinek ji wan diçin helbestên hunermendan gotinên wan diguheirin; mîna "Kurdistan" dikin "Gulistan", ev ji muzîka Kurda re feyde nîne. A din, rojên ku em tê de ne, rojên giran in. Di van rojan de herkes, lazim e ku tiştê ku ji dest tê, textsîr neke. Mêr, jin, keç, xort, pîr, kal tu kes vala nesekine. Tê zanîn ku zarokên îro, mezinên sibê ne. Ji ber vê, divê bi rastî li ser vî karî bête rawestî û heya ji destê wan tê, navê şehîdan bilind bikin.

Em tu car jî bîr nakin ku zarokê hêviya gelan in ji bo pêşerojê. Zarokên ku di nava şer de mezin bûne û di serhildanan de li pêşî dimeşin, di warê çandê de jî peywira xwe bi cih tînin û şahiya zarokan bi muzîkê tînin zimên.

## pêkenîna rojane ya Kurd

Emin ANIK

Dewletên dagîrker-emperyalîst bi destê dewleta Tirk, ji 1984'an heta 1988'an meyzandin ku şerê bi gerîla re dikin roj bi roj winda dikin û şer ji bo Kurd û Kurdistaneke azad û serfiraz roj bi roj geşdibe û di destpêka serhildana gelê Kurd de meyzandin ku şer windakirin, rabûn li Elmanya li bajarê Dusseldorfê çend kesên hêja girtin. Dewleta Elman di îşkencê de hostayê dewleta Tirk e. Bi hemû qirejî û gemariyên xwe ve derkete holê. Di dawiya Mahkema Dusseldorfê de wec yê wanî bi xwîn qenc derket derve û gelê dinê û alemê ev naskirin. Û ev hevalên hêja, rûpak û sereva rind hatin nasîn. Çavê me ronî be!

Lê di wê mehkema Dusseldorfê ya meşhûr de heval Alî Haydar Kaytan çîrokek ji başsavciyê Elman Ritman re got. Ew çîrok wihabû:

– Li welatê me du gundê cîranê hev hebûn. Li gundekî berx, bizin û mîhê mirovekî hebûn. Li gundê din jî kûçikek mirovekî, dîn û har hebû. Çiqas mîh û berxê gundiye feqîr zêde dibû, Kûçik dihat ew dixwarin. Demekê

wilo berdevamkir. Tu tişt ji destê gundiye feqîr nedihat û pezê wî hîç zêde nedibû. Lê belê rojekê Kûçikê gundî dimire û ji bo ku kûçik dimire pezê gundiye feqîr zêde dibe. Lê belê, xwediye kûçikê tê û ji xwediye pezê re dibêje :

– Xwediye pez! Ji ber ku kûçikê min mir, pezê te zêde bû. Eger kûçikê min nemirba, pezê te zêde nedibûn. Ji ber vê yekê ew zêdebûna pezê te heqê min e.

Gundiye feqîr dibêje :

– Ez te nasnakim, çima ezê pezê xwe bidim te. Li ser vê yekê herdu dikevin qirka hev û diçin mehkemê. Serokê mehkemê piştî ku li herdu gundiyan guhdarkir û pê ve got:

– Na welleh ev zêdebûna pez heqê min e ne ê we yekî ye. Dure hevalê Ali Haydar berê xwe da Başsavciyê Elman û got :

– Hela me derdê xwediye kûçikê fêmkir. Lê tu ji me re bêje, ma ji te re çî kûçikê me, kû tu pezê gelê me dixwazî?"

Herkes bi başsavci keniya. mehdê başsavci weke gu tirş bû.

# MIROVÊ KU LI FELEKÊ DIGERE

Samed BEHRENGÎ

Werger : Felat DILGES

Di demekî de mirovekî hebû. Hergav sîla felekê xwariye, yekî bêsihûd bû. Çi bikira karên wî rast nedîçûn. Rojekî, ji xwe bi xwe re:

- Bi vî awayî bi destên xwe girêdanê û rûniştinê ev kar nameşe, got. Ez dê herim vê felekê bibînim û ji wê hesabê vê qedera xwe ya nebaş bipirsim. Ji bo ku ez ji vê qederê rizgar bibim, ji xwe re çarekî bibînim.

Mêrik, ji cihê xwe rabû û ket riyân. Pir çû, hindik çû, di rê de rastî gurêkî hat. Gur rîya wî birî û jê pirsî:

- Ey kurê mirovan, tu bi ku derê de diçî?

Mêrik got:

- Ez diçim, li felekê digirim.

Gur got:

- Ji bo Xwedê, kurê mirovan, heke te felekê dît, tiştên ku ezê ji te re bêjim, ragihîne. Tê bêjî, silava gur heye. Tê bêjî, her gav serê wî dêşê. Çara viya çî ye, tu dê bipirsî. Bila ji kerema xwe re ji te re bêje.

Mêrik got dibe, û ket rîya xwe.

Mêrik çû, çû... Gihîşt welate-

kî. Qralê wî welatî di şer de têkçûbû direviya. Qral, gava ku mêrik dît nedît, jê pirsî:

- Ey kurê adem, tu bi ku derê de diçî weha?

Mêrik:

- Qralê min, got, ez li felekê digirim. Gava ez wê bibînim, ezê jê re bêjim, bila qedera min biguherîne.

Qral got:

- Tu çawa be diçî wê derê...


siyekî mezin serê xwe derxist û jê pirsî:

- Rêwîtiya te bi ku derê ve, ey kurê mirovan?

Mêrik ji masiyê mezin re got:

- Karên min tev xerab çûn. Ji ber wê yekê ez derketim li felekê digirim. Lê, wisa xuya ye ku, ezê ji vira wê de nikaribim herim. Pêşiya min behr e û keleka min jî tune.

Masiyê mezin got:



Desen : Mehtap

Ji bo min jî tu dikarî viya bipirsî: Ez çima di hemû şeran de têk diçim? Heya niha çima yek carekî be jî, ez bi ser neketim?

Mêrik got:

- Baş e, û berê xwe da rîya xwe.

Gavekî rîya xwe domand û dawiyê gihîşt qeraxê behrekî. Nihêrt, ne gemiyek heye û ne jî rîyekî. Matmayî û bêçare li der û dora xwe nihêrt. Ji nişkê ve, ma-

- Ez dikarim te bidim piştta xwe û di behrê de derbas bikim. Lê şertek min heye. Ku te felekê dît, jê bipirsî, ka çima her gav pi diyê min dixure. Ji kerema xwe re bila ji te re çara vî karî bêje.

Mêrik şertê masî pê re peji-rand. Masiyê mezin jî, ew da piştta xwe û ji vî qeraxî derbasî aliyê din kir. Mêrik ji wê derê rîya xwe domand. Dawiyê, gihîşt cihekî. Li vira rastî mirovekî şalê

xwe hildayî û tevrik li ser milê wî hat. Mêrik bi tevrik baxçê xwe av dida. Di baxçe de, bi hezaran çalên zerzewatên biçûk û mezin hebûn. Xweliya zikê gelek çalan ji bêaviyê terikîbûn. Lê çend heb ji wan, bi avê di dev de tije bûn. Baxçevan, dîsa avê berî ser wan çalên tije dabû.

Çewa ku baxçevan çav bi mêrik ket, jê pirsî:

- Riya te bi ku derê ve, hemseriyê min?

- Ez li felekê digerim.

- Tê çî jê bipirsî?

- Heke ez bibînim, ez dizanim ezê çî jê bipirsim. Ewîlî, ez dê têr çêrî wî bikim.

- Ku wisa ye, wê gavê nesekine. Tê çî bêjî bibêje. Felek ez im.

- Na, ewîlî tu ji min re ew çalên zerzewatan çî ye, bêje!

- Haa... Ew? got baxçevan. Her yek ji

wan serweta mirovên li rûyê erdê ne.

Mêrik jê pirsî:

- Baş e. Wê gavê, ya min kîjan e?

Baxçevan di nav bi hezaran çalîkan de hebeke biçûk û bêav nişan da. Erd ji bêaviyê terikîbû û dilopek av nediket vê çalikê. Mêrik ji vê rewşê gelek aciz bû. Pê re tevrik ji felekê sitand û berê avê da ser çalîka xwe. Piştî ku çalik bi avê tije bû û erd ji avê têr bû:

- Hah, niha bû... got; êdî tu dikarî ji min re bêjî, ka çima pidiyê masiyê mezin ê binê behrê dixure?

Felekê got:

- Perçek yakût bi binê pidiyê wî ve zeliqiyê. Heke tu çend kulman li serê masî bixî, ewê yakût

bikeve û masî jî, ji vî derdî rizgar bibe.

- Baş e. Qralê filan welatî çima her gav têk diçe? Çima heya niha li dijminê xwe neşikandiye?

- Ew qiral jin e. Jineke ku ketiyê şiklê mêran. Heke ku naxwaze careke din têk here, divê bize-wice.

- Pir baş e. Lê gurê ku her gav serê wî dêşe, çara derdê wî çî ye?

- Heke ew jî, mêjiyê serê mirovekî ehmeq bixwe, ewê ji vê



Desen : Mehtap

êşa serê xwe rizgar bibe.

Mêrik bi kêf û şahî ji ba felekê rabû. Hat ber qeraxê behrê. Masiyê mezin li benda wî bû. Gava ku ew dît nedît, jê pirsî:

- Te çara derdê min dît?

- Erê, lê pêşiyê tu min bibe qeraxê wî alî, ezê ji te re bêjim.

Masiyê mezin mêrik da piştî xwe û ew derbasî qeraxê din kir.

Mêrik ji masî re got:

- Perçeyek yakût bi pidiyê te ve zeliqiyê. Divê yek bi kulman li serê te bixe. Wê gavê ev yakût, dê ji cihê ku pê ve zeliqiyê bikeve. Tu jî, dê ji vê xurê rizgar bibî.

Masiyê mezin:

- Baş e, got. Were vî karî tu bike. Bila yakût jî, ji te re be.

Mêrik ji nava xwe têr:

- Edî hewcedariya min bi tiş-

tên weha nema, got. Ji ber ku, min çala xwe ya bexçê felekê heya ber dev av tijî kir.

Masiyê mezin ê belengaz çiqas lava kir jî, mêrik guhdarî nekir. Li riya xwe meşiya çû.

Çavê qral li rê bû. Gava ku mêrik gihîşt balê, hemû tiştan ji qral re got.

Qral got:

- Wê gavê tu bi sirê min dizanî. Hê ku haya tu kesî jê nebûye, tu min bistîne. Di şûna min de bibe qralê vî welatî.

Mêrik xwe nêzî vî tiştî jî nekir û got:

- Ez bi qraliyê çî bikim? Min çalîka xwe ya baxçê felekê heya ber devî av tijî kir.

Keçikê çiqas lava kir jî, mêrik nepejirand. Ji vê derê jî qetiya. Ji nû ve ket rê. Mêrik çû, çû... Gihîşt ba gur.

Gur got:

- Kurê mirovan, ez

te bi kêf dibînim. Tiştê ku tu lê digeriyayî, te dît?

Mêrik got:

- Erê, dermanê serêşa te ji mejiyê mirovekî ehmeq bûye...

Gur got:

- Sax bî, di rê de çî di serê te de derbas bû, ka çika bêje.

Mêrik hemû tiştan yek bi yek ji gur re got. Bo çî yakûtê binê pidiyê masî nestandiye, ji bo çî qraliyê nepejirandiye... ji ber ku çalîka xwe ya bexçê felekê heya ber dev bi avê tijî kiriye û hewcedariya wî bi tiştên weha nemaye, got.

Gur ji nişka ve diranên xwe di qirika mêrik de derbas kir û mejiyê wî derxist. Ji alîkî de jî:

- Ez yekî ji te ehmeqtir li ku derê bibînim, digot.



# NIŞTIMANA XWE BINASE

# SEMSÛR

Selahaddîn MIHOTULÎ  
Werger : Rojê CIVAKNAS

Semsûr, li jora tejana (havza) çemê Ferat û başûrê çiyayên Toros de cih digre. Semsûr di navbera Dicle û Feratê de cih digre. Li bajarê Semsûrê bilindiya çiyayê herî mezin 2567 metro ye. Bilindî ji bakur ber bi başûr ve dest bi nizmbûnê dike. Dešta Semsûr, dešta Kexta û dešta Keysun ji aliyê çandiniyê ve pir bi kêr tê. Gelê Semsûr bi piranî bi aboriya heywanan xwedî dike. Semsûr ji aliyê madenên binerdê ve, {sifir, krom û neft} pir dewlemend e. Havîn, pir germ û ziwa derbas dibe. Zivistan li gor rojhilata bakur ve hîn germtir e.

Amed li rojhilat, Meraş li rojava, Meletiyê li bakur û Dilok (Antep) û Riha ji li başûrê Semsûrê dikevin.

Lêkolînên ku li şkefta Palanê, li girê Şehremuz û li tûmê (Höyük) Grîtlê çêbûne, eşkere dikin ku di her dema dîrokê de mirov jiyana xwe li vir berdewam kirine.

Semsûr di bin tixûbên bapîrên Kurdan Hatî, Hurî-Mitanî, Urartu, Kumuh û Medan de maye. Pers. Part, Sasanî û dû re jî, di nav tixûbên (sînorê) Farisiyan de maye. Erîşên Asûr. Îskît û Kîmeran jî, hatine ser vî bajarî. Semsûr ji qral-

tiya Komagene re bûye peytext. Berî Zayînê 69 û Zayînê 72'an, Komagene bi Romiyan û Partan re polîtîka nermayî kirine. Qral Antixos, ji bo ku bi cîranê xwe Solekît re nekeve şer, bi qîza wî re zewiciye. Di qraltiya Komagene de tişteki pir enteresan jî heye ku 105 sal bi kesî re şer nekirine. Ne dewletê Îranî, ne Romî û ne jî Bizansî tu carî rojhilat û rojavayê çemê Firatê nexistine bin destê xwe.

Ji sedsala 7'an pê ve rîşên

musulmanan dest pê kirine û ev der ketine bin destê Eyubiyan. Semsûr di bin rîş û talanên Moxolan, Tirkan û Tîmuran de jî, maye. Semsûr di sedsala 17'an de jî ketiye bin destê Osmanîyan. Semsûr di bin ev rîş û talanan de jî, dîsa çanda, orf û adetên xwe ji bîr nekiriye.

### Ciyografya û Dîrok :

Qraltiya Komagene bi taybetî Antixos, serketina têkoşînê bêtir girîng daye çandê. Talankaran her tim rîşên xwe li ser huner û çanda gel çêkirine. Çima? Ji ber ku, kî xwediyê van berhemên hunerî be, ew xwediyê dewletê ye jî. Qral Antixos di girê çiyayên Nemrûdê de perestgehek (tapınak) çêkiriye. Heta 1838'an tu kes bi vê perestgehê nehisa bû. Generalê Elman H. Von Moltkê bi leşkerên Osmanîyan re hatibû ku serhildanên rojhilat vemrîne; wê çaxê wî ev perestgeh kifş kiriye. Li ser vê mabetê heta îro tu talan û êriş çênebûne.

### Çiyayê Nemrûdê :

Çiyayê Nemrûdê ji Semsûrê 106 km dûr e. Bilindiya çiyayê Nemrûdê 2150 metro ye. Li ser vî çiyayî gor û xezîneyên qral Antixos hene. Ev gor û perestgeh bi kevirên pir biçûk ha-



tiye çêkirin. Firehiya perestgehê di navbera 150 metro ye; bilindiya wê jî berê 75 metro bû, niha daketiye 50 metroyê. Li ba vê perestgehê heykelên Xwedê û qralan, navçeyên merasimê, rê û ji tehta kolandî jî, hewdikê êgir û hwd. çêkirine.

Di girê çiyayê Nemrûdê de, ji bakur, rojava û rojhilat ve sisê banokên (teras) mezin hene.

Banokên rojhilat li ser tehteke mezin û di cîkî pir mezin de ye. 8 kevîrê şehîrî li ser hev hatine danîn û li ser vana peykerên (heykelên) Xwedê hatine çêkirin û bilindiya wan di navbera 8-10 metroyan de ye. Ev peykerên hanê, ji alî peykerên sembola xurtî û balkêşiyê şêr û eylo ve ji her du aliyên ve têne parastin. Navê van peykerên mezin ev in: Apollo, Mithra, Helios û Hermes di figûrê yekê de ne, Fortuna (Xwedayê Bereketê) jî di figura duda de cih stendiye. Di nav van peykeran de, tenê Fortuna neketiye. Serê wê

merasima rêyan bi hev vedike. Di nîvê banoka dîwêr de deriyek heye; ji vî derî heya serê girê riyek hildikêşe. Peykerê eylo vî deriyê hanê diparêze! Banokê vî dîwarî 85 metro ye.

Ji çiyayên Nemrûdê, sibê wexta ku roj hiltê, li tu cihê dinyayê

bo jînê bidin Xwedê û ji bo ku gel xwe bi xwe ji hev haj bin vêdixistin.

Komagene bîrdariyên xwe bi Latîni û Grekî nivîsandine.

Di dema Îskenderê mezin de Grek û Latîniyan êriş û talan birine ser çand û hunera Kurdistan. Di

vê demê de herdu cildên Zend-Avesta hatine şewitandin, hewdikên agiran hatine xera kirin, peykera zêrînî li hundirê perestgeha Anaîtes ya li Erzîncanê hatiye hilandinê û qesra Ekbatan û Persepolisê jî, hatiye şewitandin.

#### Arsemîa :

Paytextê Komagene Arsemîa ji Kehtayê 26 km dûr e. Li dû lêkolînên ku hatine çêkirin, li vê derê bîrdariyê qral Mithîrîdates û Ares (Herkül) hatine dîtin. Ji bilî vê jî, ji bo ku perestgeh bê zanîn heykelek hatiye çêkirin. Li başûrê kelehê jî, gora bavê Antîxos, Mithîrîdates (mîhrî) heye. Bîrdariyê (anît) herî mezin li vê derê heye. Li serê vî bîrdariyê, her sal wê çiqas qur-



bi çelenga mêwa û bi tûlê xemilandî ye. Di figurê sisêyan de, Zeus-Oromasdes (Ahura-Mazda) û di figurê çaran de Antixos, di figurê pêncan de Herakles û Artagenes, Aresî temsîl dîkin. Li ser van banokên ku li aliyê hewşê dinêrin, roja ku qral çêbûye, rêzananê (yönetmelik) merasimê û zagon hatine nivîsandin. Li rastî van peykerên mezin bi planê damelî (kare) hewdikê agirî cih digire.

Banokê bakur, dirêjayiya wê 80 metro û firehiya wê 3 metro ye. Ji aliyê rojhilat û rojava ve

xweşîkbûnek wilo û rojek ewqas rengîn tune ye. Ev der, cihê ku erd û esman digihêjin hev û cihê ku Xwedê rojê pîroz dike û cihê ku jiyanê ji wir dafirîne ye.

Cihê ku Xwedê lê kom dibin, li serê vî çiyayê bilind him li gorî ola Zerdeştî û him jî, ji ber êrişên dijminan hatiye çêkirin. Di ola Zerdeştî de cihê wê bilind, nêzîkî rojê û pîroz e. Ji ber vê yekê jî, mirovên Zerdeştî miriyên xwe li derên bilind vedişêrin.

Agir li dinyayê birêveberiya rojê ye. Li serê van çiya agir ji

ban bidin, malbata qral û zagonên li ser jiyanê henin. Ji bilî wan jî, hundirê tehta masîf ji bo şkeftê hatiye kolandin û kûrbûna wê 158 metro ye. Mirov bi pêlikan dadikeve binê erdê.

#### Keleha Kehta (Kexta):

Ev keleh îro ji kehta 26 km dûr e û nêzîkî gundê Kehta ya kevin de ye. Ev keleha hanê di her demê de hatiye bikaranîn. Ji dema musulmantiyê vir ve burc (çerx), mizgeft, dikan, hemam û çalên avê tê de ava bûne û heta îro manin. Bi navê keleha nûh jî, tê nasîn.

**Pira Cenderê :**

Kehta û rêya Kehtaya kevin di ser çemên Cenderê de pirek çêkirine. Ev pir 2000 salî ye. Li herdu aliyên nigên pirê, ji 92 tehtên pir mezin hatiye çêkirin. Li herdu aliyên pirê, divê du stûn hebûna, lê yek ji wan winda ye. Firehiya wan stûna 2 metro û bilindiya wan 9-10 metro ye. Serê wan her du stûnan ne li cihê xwe ne.

**Keleha Dêrikê :**

Kela Dêrikê, li başûrê pira Cenderê û li jora gundê F e. Ev cihê pîroz, bi I. Heron a pe-restgeha wî tê nasîn.

neyên silavkirina kesan heye.

**Keleha Gerger (Jêra Arse-mia) :**

Ev keleh ji Semsûr 98 û ji Kehta yê 63 Km dûr e. Ev keleh li gundê Gergerê ye.

Di vê kelehê de mizgeft, mal, dikan û çalên avê henin. Li ser tehtekê, nexîşandina bavê mihrî Samos hatiye çêkirinê.

**Muzeya Semsûrê :**

Di vê muzê de tiştên dîrokî, arkeolojîk û etnografîk tene pê-sandin. Ji dema kevirîn de bivir, ê tîr û kevanan û ji demên din de xilik (çanak) û kedûn (çömllek), heykel, perên bi nexş, fira-

Gava mirov ji Semsûrê diçe, li ser riya gundê Heyderan, di kî-lometrê 10'an de, di hundirê yekê ji şikeftan de, wêneyên bizin-ke heye ku ev wêne wek dîroka mirovî kevn e.

Li gundê Semsûrê Zeyê jî, mal henin ku ji tehta çêbûne. Tehtên mezin hatine kolandin û keleheke du tebaxe çêkirine. Navê vê kelehê, keleha Hesin e.

Li rojaveya gundê Gumuşka-ya û li ber çemê Firatê, tehtên ku bilindiya wan 100 metro ne kolanin û cihokên şikeftan vekirine ku firehî û bilindiya wan 160-170 cm. ne.

**Ava Koturê :**

Ev av 25 km durî bajarê Sem-sûrê û 5 km durî gundê Akçalîyê ye. Ji hinek nexweşiyên mîde û roviyan re baş tê.

**Malpinari :**

Ji bajarê Semsûrê 35 km dûr e. Ji ba tehtên Goksûyê pir av derdikeve. Li vê derê, ji dema Hîtîtiyan kîtabeya hiyeroglîfî ya çargûşe hatiye dîtin. Ev jî, vê ras-tiyê tîne ber çavan ku wê demê ev cihekî girîng bû.

**Burç (Birç) :**

Li gundê Bircê, xaniyek dora wî 13 metro bi planê bidame û du tebaxe heye. Bilindiya wî xanî 10 metro ye. Ev xanî ji kevirên şehkirî hatiye çêkirin ku pîvana wan 50-100-50 ye.

**Samsat :**

Ji Semsûrê 38 km dûr e. Ev der 5000 sal beriya zayîne hatiye avakirin. Asûriyan ev der talan û xirab kirine. Ev der di demeke kin de bûye paytextê Komagenê. Hîna jî li ser girekî keleh, bîrên avê, cihokên avê, tiştên ji ber qesrê mayî, henin.

**Pira Kizilîn (Göksu) :**

Ev pir li ser çemê Goksûyê ye. Ev pir ji sêkemberan hatiye

**Girê Karakûş :**

Girê Karakûş ji dema Hîtî û Mîtaniyan vir ve hew tenê cihê gora jina ye. Di dema Kommene-ge de jî, girê Karakûş cihê gora birdariyê bû.

Ev gor li ser tûmîkekî (Hö-yük) 35 metro ye. Ev tûmîkê hanê ji heft kevirên şeh kirî yê li ser hev danîn ava bûye û bilindi-ya wê nêzî 9-10 metro ya ye. Di vê tûmîkê de 4 stûn û li ser serê stûnekî eyloyek heye. Li ser wan stûnan şêr, ganêr (boğa) û wê-

xên xemilandinê henin.

Di sûka Oturakçiyân de dest-kariyên gel tene firotin.

**Pirîn :**

Pirîn taxeke Semsûrê ye û li bakurî rojhilatê dikeve. Li vê derê 208 tehtên mezin kolandine û ji şikeftan mal çêkirine. Li ser deriyê van malan de wêneyên mirovan çêkirine. Li dûrî bajêr sûr, qesr û pere hatine dîtin. Kanî û birka (havuz) vî gundî kevnare ye. Ji ber van malên pir, navê vî gundî Pirîn danîne.

çêkirinê. Kembera navê xera bûye. Navbera du nigên wê, nêzî 20-30 metro ye. Ji kevirê şehkirî hatiye çêkirinê.

#### Dikilîtaş (Kêl):

Ev kêl nêzîkî gundê Hozgîşî ye. Ev gora birdarî li ser girê Kizildax e. Di nav gel de, navê vê tûmikê Sêseng e. Bilindiya vê tûmê 20 metro ye. Li bakurî rojava, li bakurî rojhilat û li başûr 6 stûn henin. Her stûnek 1.5 metro fireh û metrok bilind û ji heşt kevirên girover hatine çêkirinê. Hundirê tehta masîf hatiye kolandin û 7-8 metro kûr çala avê hatiye çêkirinê.

#### Besnî:

Ji navçeya Besnî ya îro, 5 km li başûrî dikeve.


Gelek avahiyên dîrokî ta îro weke kelehê, perezgehê, hemamê, pir û kaniyan ma ne.

#### Xirbê Bajarê Arî:

Ev der li gundê Sofrazê ye. Gelê Arî pêşiyê li van deran bi cih bûne. Di dema musulmantiyê de beg Hasan Paşa li vê derê mizgeft û minareyên mizgeftan çêkirine. Ji yên dema wî ve xirbeyên wan manin. Di hundirê vî bajarî de axa bi reng di hundirê şûşa de hatiye dîtin. Lê heta vê demê kesî pê dernexistiye ku ev ax ji bo çi hatiye bikaranîn.

#### Mesîreya Degîrmençay:

Ev der li gundê Sofrazê ye. Li vê derê ji gelek deveran av derdikeve. Li her derê şenkayî ye û tehtên mezin bi hev re ahengeke pir xweş çêdikin. Di demên berê de jî, jiyana li vir hebû û ta îro dom dike. Li vê derê mirov teh-



tin kolandine û hinek ji wan jî, ji ber xwe ve hene û mirovan li wê derê jiyana xwe berdewam kirine.

#### Tûmikên Besnî:

Li navçeya Besnê û li dora wê gelek cihên ku ji dîrokê mane û gorên bîrdarî (anîtmazar) henin. Di nav wan de, ê bi nav û deng ev in: Sahantil, Sofraz, Fal, Has-kişiya Jorîn, Çomak, Terbizek, Şambêyat, Levzin û Zircê ne.

#### Germiya Çormukê:

Ji navçeya Besnê 6 km li bakurî rojhilat dikeve. Hurnihêrînên fizîkî û kimyewî (tahlil) çêbûye ku ev av ji bo gelek nexweşî baş e.

#### Ava Rûtika:

Ji navçeya Besnê 23 km'an li bakurî rojhilat dikeve.

#### Kincên Mêran:

Qundera serdirêj, şalvarê navrandirêj, qutikê bê berstûk û îş-

likê reng bi reng li xwe dîkin. Kemberek spî û dirêj li newqa xwe digerin û şaşikekê dixin serê xwe.

#### Kincên Jinan:

Li serê jinan kofî hene. Ev kofî bi zêr, zîv an jî bi madênên din tîn xemilandin û bi şarekê tîn girêdan. Kirasên hef-treng û ji hevirmêş çêdikin. Zendikên kirês fireh in. Ji pembo qutikên mîl-dirêj di bin fistanê xwe de li xwe dîkin. Bi ser vî kirasê rengin de, pêstemaleke erdreşî xemilandî didin ber xwe. Gorên binexş û pêlavên bê pahnî dixin lingên xwe.

#### Dansên Gelêrî:

Di listikên Semsûrê de, jiyana gel, şer, têkiliyên hilbirinê û aborî hene.

Ev tişt di listika Xoftanê de hîn bêtir xwe xuya dîkin. Di vê listikê de têkiliyên aboriyê yên çanda gundiyan û axê, rewşa gundiyan, Xwedê, şahî û bereket tê listin. Di vê listikê de ji destpêka çandê ta palê û benderê, bi figurên folklorê li ber çavan tê raxistin. Xoftan, ji listikên Semsûrê yên dewlemend mînakek e.

Bi rastî, folklorê Semsûrê bi serê xwe beşek serbixwe ye; divê mirov bi taybetî li ser raweste. Ji ber ku folklorê Semsûrê, ne ya Semsûrê tenê ye. Bûye ya Kurdistanê hemî. Belê ev listik, îro ne li ser navê Kurdistanê, li ser navê dewleta dagîrker tê listin; di festîvalên navnavnetewî de bala her kesî dikşîne! Di van festîvalan de li ser navê Tirkan, xelata yekemîniyê distîne. Lê ev folklor bixwe weke bajarê Kurdistan e!

# ZMAN Û RASTNIVÎS

F.Huseyn SAĞNIC

Ji rastnivîsa zmanê Kurdi beşeke pîr gring ji lêkera "bûn" e. Li ser vê lêkerê gelek dabaşên curbecur hene. Hindek rêzimanîvisên me "ji ber ku zmanê Kurdi ji malbata Hind-Avropaye, divê rastnivîsa "bûn" mina ya wan be" dibêjin. Ez beri ji van dipîrsim, "gelo, bla rastnivîsa me mina ya kijanê be?" Ya duwemin ji ez ji wanra "na geli hevalan! Bla rastnivîsa lêkera "bûn" ji mina ya Kurdi be" dibêjim û tkaya dev ji heyraniya biyaniyan berdanê ji dikim. Çawan di gelek mjaranda, berhevi û kombûnê dîbinim, di vîrda ji welê dîbinim, heya kombûnê peywîstî dîzanim.

Em bêne li ser rastnivîsa lêkera **bûn**: Lêkera **bûn**, bi qertaflêkeran tê kêşan. Ji bil qertaflêkera "bû" qertaflêker û qertaftcinavk yekî. Ango eynînin. Teni ji hevdu guhertina wan, cîyê xebitandina wanin. Mina:

## Qertaftcinavk   Qertaflêker   Bikaranina iro

Direvîm	dikevîm	rındîm
bedewîm	rındîm	bedewîm
Direvî	dikevî	rındî
bedewî	rındî	bedewî
Direve	dikeve	rînde
bedewe	rînde	bedewe
Direvîn	dikevîn	rîndîn
bedewîn	rîndîn	bedewîn
Hûn direvîn	hûn dikevîn	hûn rîndîn
hûn bedewîn	hûn rîndîn	hûn bedewîn
Direvîn	dikevîn	rîndîn
bedewîn	rîndîn	bedewîn

Nexwe ev qertaft, gava bi lêkeranra bîn bikaranin, qertaftcinavkî. Gava bi navdêranra bêne bika-

ranin qertaftlêkerin, lê qertaftcinavkî ji. Ango qertaftcinavkî, lê peywîra (wezifa) lêkeran ji hîdane li ser xwe. Dîxwazî li peyva "dîrevîm, dikevîm" û dîxwazî li peyva "rîndîm, bedewîm" bînerin. Dî her du destanda ji **im** bi tîgîha "ez":i bi tîgîha "tu"; e bi tîgîha "ew"; **in** bi tîgîha "em" û **in** ji bi tîgîha "hûn û ew" hatine bikaranin. Ji ber ku desta "rîndîm û bedewîm" navdêrin û bê lêker hevok (cumle) naqedin, ev qertaft di peywîra lêkeranda hatine bikaranin. Ango qertaftlêkerin. Lê qertaftcinavkiyên xwe hêç wînda nakin. Nexwe "im, i, e, in û in" hîm qertaftlêker, hîm ji qertaftcinavkî û ev qertaft çawan bi lêkeranve dîzelîqîn, divê wîsan bi nevdeiranve ji bîzelîqîn û lêkeriya wan bi tîgîhê bête zanin. Bî vi ewayi zman qasek ji ji belaviyê rîzgar bibe.

Xwendevan û rêzimanên hêja! Heger bê sedem ji be, berhevbûn û berhevkîrîn li min pîr xweş tê. Lê bê sedem an ji bi sedemên sîst û pîst belavbûn, an ji belavkîrîn hêç li min xweş nayê. Me ji belavbûn û belavkîrînê gelek ziyar dîtiye. Tka dikim em zmanê xwe bê sedem ji hevdu dûr mexîm.

Dî lêkera "bûn" da qasek ji dabaşa qertaftlêkera **bû** bikin. Her çqas "bû" bi serê xwe lêkere ji, lê di lêkera "bûn" da teni qertaftlêkere û li dawîya navdêran, bi navdêranve tê zelîqandin. Bî vi ewayi kêşana lêkera "bûn" ya dema boriya tîdayî tî hmatê. Nexwe dema nha bi qertaftlêkerên dîn tîne bikaranin, dema boriya tîdayî ji bi qertaftlêkera "bû" tê kêşan û qertaftcinavkî, bi "bû" ve tîne danin. Mina:

## Dabaşa min   Bikaranina iro

Rîndbûm	rînd bûm
bedewbûm	bedew bûm
Rîndbûyî	rînd bûyî

bedewbûyi	bedew bûyi
Rındbûye	rınd bûye
bedewbûye	bedew bûye
Rındbûyin	rınd bûyin
bedewbûyin	bedew bûyin
Hûn rındbûne	hûn rınd bûne
hûn bedewbûne	hûn bedew bûne
Rındbûne	rınd bûne
bedewbûne	bedew bûne

Ew "y", "y" yên kelijandinêne. "-in" ji dî devoka Botida teni tê bikaranin. Lê divê bête tevayî krin. Lewra ciyê cinavka "em" ji digire.

Ev qertaflêkera "bû" ji bî nevdêranve zelîqandin peywîstîye. Lewra "bû" lêkera alikere ji. Gava bî lêkeriya alikeri bête bikaranin, cuda nvisandin û cuda bilêvkirin dîxwaze. Divê ev her du peywîrên wê, ji hevdu bêne qetandin û nasin. Mîna :

#### Lêkera bûn Lêkera aliker

Reşbû, zerbû, sorbûreş bû, zer bû, sor bû  
Dewlemendbû, xızanbû Dewlemend bû, xızan bû

Têgîha lêkera bûn; dî dema borida, reş, zer, sor, dewlemend û xızanbû.

Têgîha lêkera aliker; ne dî dema borida, nû reş, zer, sor, dewlemend û xızan bû.

Her çqas hindêk mrov vê lêkera aliker cuda lî pêşî rengdêran; "bû reş, bû sor, bû dewlemend û bû xızan" datînin û bî vî ewayî lêkera aliker ji lêkera bûn dîqetînin ji, dî zmanê Kurdida ev qayde mîn nedîtîye. Teni ev qayde ji navanra dibe. Mîna : Bû dar, bû kevir, bû şvan, bû gavan, bû karbidest...

**Daçek :** Dî zmanê meda, ji bîl daçeka ji : tu daçek nayêne dawîya peyvan. Anî lî dû peyvan nayêne danin. Ev daçek, cuda lî dû peyvan tê danin û têgîha "daxî" ya zmanê Farisî dîde. Mîna:

Ne teni tu, ez ji ji bin vî bari dernakevîm.

Ezê herîm, tu ji roja pêncemîn were nîk mîn.

Gelê me ji êdî dê rîzgar û azad bibe.

**Daçekên lêker çêkirinê:** (Ve, ra, rê, hîl, ber, der, vê, lê) û êd. Ev hemî ji lî pêşî, bî lêkeranve têne danin û lêkeran curbecur têne hmatê. Ew lêkerên bî van celebên daçekan bêne çêkirin, ji lêkerên xwerû pîr an ji hindîk guhertînin têgîhi têne hmatê (holê). Mîna :

Veketin, daketin, rêketin, hîlketin

Pêketin, berketin, derketin, vêketin, lêketin

**Daçekên raweyî, ango daçekên kêşanên lêkeran:** Teni daçekên dema nha "dî, nî, na" û daçekên fermanê "bî, me" disa lî pêşî, bî lêkeranve têne nvisandin û bî tu ewayê ji lêkeran cuda nayên danin. Mîna :

Dike, dîkîr, dîkare, dîkariya

Nake, naxwe, nîkare, nîkariya

Bike, bîxwe, bîçîne, bîreşîne

Meke, mexwe, meçîne, mereşîne

Divê bête zanin ku çawan "dî" daçeka erêni ya dema nhaye, wusan "na, nî" ji daçekên neyîni yên dema nhanin. Disa divê bête zanin ku daçeka neyîni ya fermanê teni "me" ye. Her çqas iro dî peyîvîna hinde herêmanda û dî nvisandinên hinde nviskaranda, daçeka fermanê ya neyîni dî ciyê "me" da "ne" tê bikaranin ji, lê divê welê neyê krin. Lewra ew mezinên em gîştîne "me" bikartanin. Wêja me ya kevîn hemî, (wêja nû ji beşek jê) "me" hatiyê bikaranin. Hozan û wêjevanê me yên mezin Cigerxwin, rêzîman Mir Celadet Bedîrxan û digel rêzîmanzanên me yên dî, ewên me ku afirinekên wan ditîne, hemîyan ji "me" bikaranine. Vaye ew rêya gelê me yê kevîn û hozan û wêjevanên me lî ser meşane, ez ji lî ser dimeşim. Lewra ew rê rêyekê rast û drîste. Dî zanîna mînda, ji neyîniya fermanêra daçeka "ne" kêr nayê. Ev daçek pzo kêra neyîniyên demên bori, çiroki û dema bê têt.

Dî derbarê daçeka "me" ya neyînîda, divê reform neyê krin. Çawan dî hejmar borida me dabax kribû ku destboriya (selahiyeta) me dî pêkanîna reformêda tune û şxwe naxwaze ji. Lewra reform lî ser karên neqenc û nebrê têne krin. Heger dî neyîniya fermanêda nebrêti hebe, ew payê daçeka "ne" ye. Disa çawan me dî nvisara xwe ya berida ji gotîbû, ji karên wîlora ronensans dîxwaze. Disa lî vîr ji bîbêjim, divê bê sedemên ji dîl, em vajiyê borîya xwe nekevin. Heger em welê nekin, emê dirok û zmanê xwe wusa biherîfînin ku êdî çara vejandîna wan tunebit.

Daçeka dema bê "ê" ye. Ev daçek bî serê xwe tê bikaranin û bî tîpa "w, d, t" ve ji tê danin, lî pêşî lêkeran cuda ciyê xwe digîrê. Heya dîkare ji lêkera xwe gelek ji dûr bikeve. Ango berî lêkera xwe bî çend peyvek pêşî bête danin. Bêweku : Wê Xweşmêr heft roj piştî cejna Newrozê biçe gund. Heger kîrde cinavk be, ev daçeka "ê" dîkare pêve ji bête danin û têgîha dema bê bîde. Bêweku : Ez ê roja pêncan herîm. Dî vê tentêlêda cinavk him peywîra xwe û him peywîra daçeka dema bê dibîne. Tablo-

ya dema bê ya gelemperi :

Xweşmêr ê were, ê Xweşmêr were  
 Dê zeviyê biçinin, zeviyê dê biçinin  
 Tê hesp bibeze, çêlek tê şir bide  
 Wê Reşo kar bike, Reşo wê kar bike  
 Tuyê gelek rojan bîbini, hûnê bîbinin

**Daçeka blani :** Yek ji "bla, bra, bere û bera" pêktê. Ev her çar celeb gorê devokên herêmanin. Lê têgihên wan hêç naguherin. Ango tu kêjanê bikartini bî kêfa xweyi. Divê bête zanin ku bê daçeka blani, lêkera blani nayê zanin. Her çqas hindêk rêzımanıvisan bê daçeka blani dabaşa lêkera blani krine û wusan rût bıkaranine ji. Lê têgıha blani nade û ez gelek lê xebitim, bî tu ewayi mın nekari têgıha blani jê serwext bîbım. Ango çawan dema nha û dema bê, bê daçeka xwe nayên zanin. Daçeka blani cuda lı pêşi lêkeran tê danin. Ev daçek ji mına daçeka dema bê dıkare ji lêkera xwe dır bikeve û lı pêşıwan peyvên beri lêkera blani disa cuda bête danin. Dı vê tıntêlêda disa têgıh naguhere. Teni gorê xwestına meqaman, ev tıntêl pêktê. Mina :

**Bla :**

Reşo hemi karên xwe bıqedine paşi bête welat  
 Reşo pışti qedandına hemi karên xwe bere bêt.

**Bla** ez bêm, **bere** tu bê, **bera** ew bêt, **bra** kes neyê

"**Bla** rê be **bla** dır be" : **bla** keç be **bla** pir be."

"**Bla** av bor be **bla** kûr be" (Gotina Mezınan)

"**Bla** bit saimê dehrê, **bla** iftari carek bit." (Melayê Cziri)

Daçeka vênı, yek ji "**divê, geleke, gereke û goti**" pêktê. Ev celebên daçekan gorê devokên herêmanin. Ango her herêmek gorê devoka xwe yek ji van daçekan bıkartının û têgıha hemıyan mına hevduın. Dı drova iroda em nıkarın terciha yekê lı ser yên dınê bıkin. Şxwe tercih naxwazeji. Lewra hemi ji mına hev bı Kurdiñe. Teni graniya xebata min lı ser daçeka "**divê**" ye. Lewra ez vê daçekê çêtir dıkarım bıkarınım. Beri, ji vê daçekêra "daceka fiıla lazımı" dıgotın. Lewra ew lêkerên bı vê daçekê bêne pêkanın, bı têgıha bıvêneviyê, peywıstiyê (lazımıyê) ye. Bê daçeka vênı, lêkera vênı (lazımı) nayê zanin. Ango danına daçeka vênı dı lêkerên vênıda peywıstıye.

Daçeka vênı cuda lı pêşi lêkeran tê danin û têgıha vênı tê hmatê. Ev daçek ji mına daçeka dema bê û daçeka blani dıkare ji lêkera xwe dır bikeve. Ji lêkera xwe dır ketın, têgıh hêç naguhehere. He-ya mrov dıkare bêje têgıh tekûstır dıbe. Lewra herı-

kına hevokan û rewşa meqaman sererastır dıbe. Ev bûyerên welê taybetiyên zmanê meye. Qenc dêna xwe bıdın tabloyê. Mina:

**Divê** du roj pışti cejnê ez û maliya xwe herin  
 Ez û maliya xwe du roj pışti cejnê **divê** herin  
 Ez û maliya xwe **divê** du roj pışti cejnê herin  
**Goti** ez bêm, **goti** tu bêy, **goti** ew bêt, **goti** bên  
**Gereke** Xweşmêr here, **gereke** bı Kurdi bıpeyvın.

**Geleke** Kurd bıxwının, **geleke** Kurd bınvıısın.

**Divê** gel pxwe nvıseniya (qedera) xwe tayın bıke.

Ew **m, y, t, n** ya dı rêza "goti ez bêm" da ci gırtıne, ew qertafcinavkın û tam ciyên cinavk û navan gırtıne. Dı zmanê meda gelek qertafcinavk hene. Ev beşek ji wanın. (Lı "Hêmana Rêzımana Kurdi" bınerın)

Daçeka Merc-(şert) daxwaz yek ji "**ger, wer, heger, eger û ku** ye. Ev daçekên han, hemi ji ji ali hozan, wêjevan û nvıskarên meve hatıne bıkaranın û hemi ji Kurdiñın. Her çqas me ji vê daçekêra "daçeka merc-daxwaz" got ji jêra "daçeka merci" bête gotın çêtire. Ev daçek gava bı lêkerên pêşkerıra bên, wan dıke merciyên pêşkeri û gava bı lêkerên daxwazıra bên, wan dıkın merciyên daxwazi, angı merc-daxwaz. Mina: "Blani, dema bê vênı" bê daçek ev qayde pêknayê. Hindêk rêzımanıvisan bê daçeka merci, merc-daxwaz bıkaranine û hindekan ji ji çirokiya dema bêra merc, an ji merc-daxwaz gotıne. Ez gelek lê xebitim, bı tu ewayi mın merc û merc-daxwaziya wan ne zani.

Ev daçek ji mına daçeka "dema bê, blani û vênı" cuda lı pêşi lêkeran tê danin û lêkeran dexe tentêla merci. Ev ji dıkare ji lêkera xwe dır bikeve û têgıh ne guhere ji. Mina :

**Ger** gelê bındest rızgar nebe tentêl naguhere

**Wer** tu welê neki ez bı tera tu cari napeyvım

**heger** pırtûkan nenıvısım gel rewşen nabıt

Roja bist û pêncê mehê **ku** ez neyêm hal xrabe

"**Ger** bı kuştın, **wer** bı hıştın emr û fermana teye"

(Melayê Cziri)

**Heger** heye naqedınım vi pilonê reş neqetinım" (Gotina Mezınan)

Baş dêna xwe bıdınê ku qaydên "dema bê, blani, vênı û merci" gışk mına hevduının. Teni daçekên wan ji hev cudanın.

Bı hêvi gumana hev serwext krınê.

Bımının xweş...

# ÇARŞEM

F. Huseyn Sağnıç

Ew roja ku jêra "Roja bê bereket" digotin, ew çî roje û çra bê berekete? Ew roja ku jêra "Roja bê oxir" digotin, ew çî roje û çra bê oxire? Ew roja ku seydayên medresan ji suxtên (telebên) xwera "Roja çarşemê dest bî sey û pirtûkên nû bîkî da zû bîqedîn. Jî ber bê bereketiya wê rojê, sey û pirtûk kurt dibin û mrov zû jî wan difilte" digotin. Ew çî roje û ki ew seyda bî vi ewayi dabû bawer krin? Ew roja ku kebanîyan ne dihîşt, tu kes devê fraxên dev venekirî veke, ew çî roje û ki ev sey dabû wan? Jî bo çî, roja çarşemê devên dêzên çlo, devên lotên giya-yê û deryên kadinên deri venekirî venedikirin? Ev tabu jî ali kive hatibû danin û çra tu kes lî pêşber vê efsana hanê gemar dernediket? Jî bo çî roja çarşemê derketina geşt, bê oxirî dihejmartin û çî raz (sır) têda hebûn? Ji bo çî roja pêşemê dest bî sey û pirtûkên nû ne dihate krin û cra, heger roja pêşemê dest bî van karan bête krin, dê xwendin zêde bîdomine û zûbîzû naqedin" digotin? Jî bo çî ew karên din hemî dervazê roja pêşemê dikirin? Gelo fezileta pêşemê lî ser çarşemê çiyê? Maqey her du jî ne rojên Xwedanin?

Dibêjin ku roja çarşemê roja tedila cnane, roja çarşema dawîya meha reşemiyê (sbatê) heya roja çarşema pişî ya meha adarê, roja têdila cnan ya mezine. Dibêjin ku roja çarşema dawîya reşemiyê, Dirdanperiya keça padişahê cnan, jî mala mêrê xwe diçe mala bavê xwe. Roja çarşema pêşî ya meha adarê jî mala bavi difetile mala mêrê xwe. Jî ber vê yekê, dî wan rojanda heftê bela û teşqele têne rûyê zeminê. Gereke her kes xwe jî wan teşqelan bîparêze. Heger xwe ne parêze, an jî sistayi bike dê rasti teşqelek jî wan wusan bê ku bî tu ewayi ne kare xwe jê rîzgar bike.

Hnek mrovên falavêjên nviştker, jî bo xatirê.havilên xwe yên rojane, her weku ev yeka han raste didin diyar krin û jî gelê belengaz wec dibinin. Bî van sextekariyan, gelek karên djên kêrhatinên gel tinin hmatê. Bî rewşek welê dezgehên xwe saz kri-

ne ku pêşber derketin gelek koteke. Lewra ne bawer krina van efsanên çewtên nadirîst, her weki inkar krina ola islamê û ne bawer krina quranêye, dî serê gelê bê çareda dane cih krin.

Dî van taybetiyanda gelek jî çirokên sosret yên jî hşê mrovên dîr hatine afirandin. Ango çirokên dî navber cin û mrovanda dervaz bûyî, wusan lî hev du anine ku ew mrova ew çirok çêkirî jî, lî rastiya wê dikeve şubhê û "Dibe ku ev çirok rasbe, xweda êxistibe dlê mîn û mîn jî nvisandibe an jî gotibe" dibêjin. Dî hnek çirokanda dersên gring jî hene. Ango ew çirok hemî ne valane.

Dixwazim jî xwendevanên hêjara çirokek jî wan pêşkêş bikim. Çirok lî Deşta Rehwayê û dî Xana Elemanda hatiye hmatê. Jî ber vê yekê, divê pêşî Deşta Rehwayê û Xana Eleman bîdîm nasin:

Deşta Rehwayê lî ser rêya Bitlis-Tetwanê û lî navber zozanê şkerinê û çiyayê Kerkorêdaye û guhîşkekê (guşekê) wê digihêje çûntarê çiyayê Nemrût. Lî qeraxê Deşta Rehwayê pênc gund hene: Çilxor, Eleman, Xafrêf, Svar û Papşên. Beri çiyayên dora deştê hemî "rêl" bû û dî destê wan gundiyên lî dorêdabû. Her yek jî wan gundiyan rêla xwe baş diparastin. Darên wê gelek gîr bîbûn. Wusan gîr bîbûn ku dep (texte) jê dihate çêkirin. Pîştî damezrandina daira Ormanê, ew dar hemî brin, tenî devî man. Dibêjin ku pîştî destpêkirina şerê gerilayê, dewletê ew devî jî şewitandine. Ango nha ew çiyayên têrdar, hemî mane tazi.

Lî ali rojava deştê, rêya Muşê jî asfalta Birlis-Tetwanê diqete.

Xana Eleman lî niveka deştê jî ali Xusro paşayê xêrker û xêrxwazve hatiye ava krin. Dibêjin ku du mîzgevt, du serşogeh û du fron têda hebûne. Wê Xanê hîm peywîra (wezifa) karwanserayiti kriye, hîm jî Zanoşgeh bûye. Dî nêv afirinekên Xusro paşada, jî hemîyan mrêstir (muhteşemtir) ev xan bûye. Gava mîn dit xan xrabebû.

Pîştî vê danenasina kurt, êdî dikarin dabaşa çî-



roka xwe bikin:

Dibêjn ku du mroy, yek jê pır kal, pıştqûz û kincqetaybûye, yê din xort, bedew û kincnûbûye. Her du bî hevre jî Tetwan bî ali Bitlisêve çûne. He-ya gihîştine tanga Xana Eleman, lî wan bûye şev. Gava nêzik bûne jî nava xanê dengê dehol û zirnê hatiye wan. Her du rêwi şaş bûne. Lewra wê şeva tari, lî wê xana xrabe û wêrane, dengê dehol û zirnê çî dîke û çra hebit ne dızanina.

Kalê pıştqûz jî hevalê xwera, "De ka tu lî vır raweste ez herim, lê bîmêzinim, ka vê şeva tari û lî vê xana xrabe, ew çê denge, hinbim û bêm" got û çû.

Dema kalo ket hundır, dit ku deweta cnane û dewetek pır jî gumreye. Daholjen dehol dijene, sazende lî sazê dixê, blûrvan pıf dîke blûrê, zirnevan qêrin bî zirnê xıstîye û govendker, bî ahengiya mzirqê (muzikê) ra him dilokan dibêjn, him dileyzin. Leyzbazan, govenda sêpê, koçeri, xerzane, paporê, tanzere, helepîşte û êd. dileyistin û seyrkeran jî çepik lêdixistin. Gor her leyzek meqamê mzirqê diguheriya. Xwezay (tabî) meqamê dilokan jî diguheriya û bî wanra ahengi dîkir. Lê peyv û tegih jî roja çarşemê pır dîr ne dîket. Dilok bî vê tehra jêrin dihate gotin:

Çarşeme xweş çarşeme, lo çarşeme.

Mala bûkêl ber çeme, lo ber çeme.

Bûk zavêra bî kene, lo bî kene.

Çarşem rojek piroze, lo piroze.

Serê zavê koloze, lo koloze.

Zaval bûkê bî doze, lo bî doze.

Çarşem rojek çî xweşe, lo çî xweşe.

Xêlî hatin bî meşe, lo bî meşe.

Anin bûkek keleşe, lo keleşe.

Çarşem roja xwîdaye, lo xwîdaye.

Deryê xeman dadaye, lo dadaye.

Kêf û xweşi têdaye, lo têdaye.

Çarşem çarşem çarşeme, lo çarşeme.

Çarşem çarşem çarşem, lo çarşeme.

Çarşem çarşem çarşem, lo çarşeme.

Kalê pıştqûz mlê leyzbazan girt. Him bî wanra leyist, him jî dilok got.

Dî navekra govend û mzirqê rawestandın. Serdewet, derbarê fezileta roja çarşemê gotarek (nutqek) da û lib û lib jî xêliyan pırsa roja çarşemê sedemê fezileta wê kır. Her yek bî awayê zanina xwe bersiva pırsa serdewet dıda. Kalo gelek qenc guhê xwe dıda pırs û bersivan. Şxwe jî hemiyane yek pırs dıhate krın. Pıştî sê-çar liban dor hate lî ser kalo û

pırs û bersiv bî vi awayê jêrin destpê dîke.

**Serdewet** – İro çî roje?

**Kalo** – İro çarşeme. (Halkubo ew roj roja inîbû)

**Serdewet** – Dî hefteyêda roja qenc û bî fezileta kêjane?

**Kalo** – Roja çarşemêye.

**Serdewet** – Ew roj çra qenc û bî fezilete?

**Kalo** – Ew roj, roja qenci, xweşi û bereketêye.

Bzava Kalo û bersivên kalo lî hemiyane xweş hat. Serdewet gazi kalo kır, bre lî bal xwe û pırsa daxwazê wi jê kır. Kalo, "maqey ew yaka jî bo mın daxwaz bıt dê hûn bıkarın pêk binın?" pırsi/ Serdewet serê xwe hejand û "Belê" got. Kalo, "Nexwe vê griya qûzitiyê jî ser pıştî mın rakın da ez him rehet bım û him jî bî hêsani bî karım bıgerım" daxwaza xwe pêşkêş kır. Jî bo pêkanina daxwaza wi, serdewet kalo radestê du cnan kır. Wan kalo brın, ew gri jî ser pıştî wi rakırın, derman lêdan û hema sıx bû. Destek kincê qenc xıstine ber û cotek plav û gure xıstine pêyan. Pıştî pêkanina van karan, jêra "O-xır be" gotın. Kalo bî vê drûva xwe ya mrês (muhtem) hate cem hevalê xwe. Heval jî vê rewşa xerib şaş bû û jê pırsi. Kalo sedemên vê bûyerê ne dızaniya teni deweta cnan dızaniya, cnan kêfa xwe jêra anîbûn û ev qenci lê krîbûn. Kalo çî dızaniya jî hevalê xwera got. Heval jî Kalo, "Heger te zêr bıxwesta, gelo dê bıdana?" Pırs kır. Kalo, "Hemine ku ewên vê karê gran bıkarın bıkın, dana zêran lî nık wan pır hêsane" got.

Lî ser vê yekê hevalê xort rabû û çû xanê. Dema xort çû hundirê xanê hê jî pırs û bersiva fezileta çarşemê didomand. Gava dî bersivanda, "İro çarşeme, fezileta roja çarşemê jî hemî rojên hefteyê zêdetire û dî roja çarşemêda bereket heyê" bhıst gelek acız bû. Bê hemdê xwe qêrek da wan û "Ev gotın hemî derewın. 1- İro ne çarşeme, eyniye (ine). 2- Fezileta inêye jî hemî rojên hefteyê zêdetir. 3- Bereket jî dî roja pêşem û inidaye" got û rawesta. In ser vê yekê cın lî dorê wi cevan û jêra, "Tu çawan pêşber rêya rast û rêzıkên me derdıkevi" gotın û hıldanbrın. Ew griya quzitiyê ku jî ser pıştî kalo rakırîbûn, danine lî ser pıştê, bejna wi qor krın û jî xanê derxistin. Bî wi rewşa perişan hate lî cem hevalê kal û jêra dabaşa serdahatiya xwe kır.

Pıştî vê çirok û şrovekirina jorin, êdi em dıkarın lî ser roja çarşemê rawestin. Hemine ku em nıkarın zêde drêj bıkın. Ango qasi dî nvisarek kovaranda bête cıh krın, emê ew qas bınvısinin.

Belê çarşem, roja tedila Kurdane. Çawan ini roja tedila Îslamêye, şemi roja tedila Beni Îsrailiyane û yekşem roja tedila Xristiyanane wusan çarşem ji roja tedila Kurdane. Ango hefteya Kurdan ji roja pêşema iro despê dikir û roja çarşemê diqeda. Çarşem li dawiya hefteyêbû û rojên din ji gor wê rêz kribûn. Piştî xrakirina rêza rojan, disa çarşem lînk Kurdan roja pirozbû.

E başe ev çî bû hate serê çarşema me? Bersiv pîr hêsane: Pêşi mjokerên Ereba, dûra mjokerên din çawan êrişê li ser çanda Kurdi krîn, wusan dest avêtine çarşema me ji. Bî sedan bêbextî lêkirin û iftira xistin stû wê. Pêşi, "Ev roj (çarşem) roja cînanê" gotin û dûra çqas peyvên neqenc hene pêve danin. Ne ew peyvên li jorin rêzkirî tenî jêra gotne. Jî bo bizikirina (nefretkirina) mrovan, çî peyvên nebaş di serê wanda hebûn hemî dane roja çarşemê. Ev çewtiya mezin bî beşek Kurdan ji dane pejrîrandin. Lê li cem beşek Kurdan hê ji roja çarşemê rojek piroze. Ew heftêya li navber çarşema dawîya meha reşemî û çarşema pêşî ya meha adarê ku Ereban jêra, "Eyamunnehîsat" anî ew rojên têrteşqe le gotine, bî navê heftêya tedila cînan ya mezin dane nasîn; ew roj, roja tedila Kurdan ya mezinê. Jî bo ne nasîna wê heftêyê, bî fêlbaziyekê tekûs û bî hostatîyek pîr mezin çê wê jî alî mjokeranve hatîye guhertin. Ango li salnama (teqwîma) romî sazandîne. Belê disa li navber çarşema paşî ya meha reşemîyê û çarşema pêşî ya meha adarêyê. Lê ew meh mehê romîne. Tê zanîn ku li navber mehên Kurdi û yê romî heşt roj, li navber mehên Kurdi û yê miladî xar û jor bîst û yek roj ferq heye.

Heftêya tedila Kurdan ya mezin, jî çarşema dawîya meha reşemîya Kurdi destpê dîke û roja çarşema pêşî ya meha adara Kurdi diqeda. Newroz, di navber wan her du çarşemandayê. Dewra berî, jî bîl kêf û şahîne di wê heftêda tu kar ne dihate krîn. Îro jî li hinde herêmên Kurdistanê, xar û jor şahîna newrozê welê tê krîn. Disa li hinde herêmên Kurdistanê, hê jî di hemî çarşemên meha adarêda şahîne dikin û diçîne geşt. Jî alî hinde herêmê Kurdistanêve, di roja meda Newroz du şev û rojek tê piroz krîn. Mxabîn, hinde herêm jî tenî rojek piroz dikin.

Heger Newroz bîkeve roja çarşemê, jêra Newroza mezin tê gotin û şahîna wê, jî Newrozên din mrêstîr (muhteşemtr) tê krîn. Lewra di rojekda du cejn pevra tene piroz krîn.

Bî kurtasi çarşem rojek jî rojên netewîye. Gereke em Kurd hemî xweyîti lê bikin. Lî ser ne jî bîrkirina piroziya roja çarşemê bîminin xweş

## Pêkenîn

# EYEYE

### Girê Dersilê

Mele çiqas di ber jinikê re diçe, jî jinikê re dibêje :

- Eyeye!?!...

Jinik jî mêrê xwe re dibêje :

- Mele çiqas rastê min bêt, jî min re dibêje "eyeye".

Mêrê wê dibêje :

- Tu jî, sibê jê re bêje "eyeye". Bila şevêk din were mala me.

Mele û jinik hev dibînin. Mele dibêje "eyeye", jinik jî dibêje "eyeye". Soz didin hev, ku Mele êvarê bê mala wê.

Mele êvarê bexê sor serjê dîke, dîde ser birincê û diçe mala jinikê. Rûdinin ku şîvê bixwin, li derî tê xistin. Mele dibêje :

- Ev kî ye hat?

Jinik dibêje :

- Mêrê min e.

Mele dibêje :

- Ez çî bikim?

Jinik dibêje :

- Here ser afirê golikê.

Jinik Mele li ser afirê golikê girêdide û dibêje :

- Carna wek golikê biore.

Mêrik tê hundir. Ew û jîna wî, goştê bexê dixwin. Mele dîke orîn. Mêrik dibêje :

- Golika me çîma diore? Ezê herim binêrim.

Diçe ku dest bavêje Mele, Mele direve. Roja din rastê jinikê tê. Jinik jê re dibêje :

- Eyeye?!

Mele dibêje :

- Çî "eyeye"? Hûn hîn bûne bixwin goştê berxikê û bînin golikê...

# ŞÊXO ZURA

Seîd VERROJ

Cay bî, cay çinî bî... Yew wext Diyarbekir de yew mêrdimo feqîr bî. Vanê yew tarîx de xelay ronyay bî; nan şîrîn bî û îdare çetin bî.

Ay mêrdim zê, hîrê çiyer ge de jê, yew ceniya jê û yew maya jê bî. Xelay bî û xwera verênî zê feqîr bî, îdarê jên nêbînê. Yew roj mêrdek ceniya xwera va :

- Cenêkê ez dişmiş bena, yew aqil ameyo mi sere. Heke ey aqilî reyd şima vanê, ma cay ra şêrê (şorê), ma ko pey nan borê. Eger şima goşa mi nêdanê û nêvanê, ma ena rezîlê de, wita gês-te mirene.

Cenêke va :

- Ti vanê çi mêrdek? Ma hezê to bikê.

Namê cenîda jê zê, Gul a. Mêrdek tadya va :

- Gula mi, heke ti bala mi dana, ma ena memleket ra vejî. Yew deka mi esta, heke ez ay biçarna, ma ko tam bibê mêrdim, ma ko tam nan borê, ma ko zengîn bibê.

Cenêk agiray, va :

- Ti çi vanê mêrdek?

Mêrdê ja va :

- Ez qestîra xwe kena şêx, şeharo gird û cayê padîşay de, şêxê û xocayê pere kena. Cayê xerîb de zurî pere kenê, şar kê nêsinaseno, hewes kê beno. Enasar yew ca de, ma şênê xwe rê loqmê nan borê.

Cenêk va :

- Ti zanê mêrdek.

Wariştî, tay pertalê jên bî, têro piştî û wegrot û ray kewtî şî. Ha wita, ha weyra, ma ferz bikê şî Îstenbol. Şî Îstenbol resay, kinaredê yew mehla de, xwe rê yew ban kirya kerd û dekwetî. Mêrdekê to ca da xwe, şî yew fistano sipî û derg (sey fistandê şexan) fesilna piragirot. Erîşê (erdîş) xwe veraday, yew şaşik best; raşt nê m literî ya, citê dizbayê xwe dest kerdî; heze qoqê rêsta. Miyandê keyî de yew ode xwe rê aqitna û dekwet zere; yew perde zê ant xwe, zere de îbadet keno, nêvejyeno teber. Cîranê jên pê hesyay ki, yew mêrdimo enowayên ameyo wita; la eno şêx o, eno pêxember o, eno eshabe wo, eno çî yo? Nêvejyeno teber û yewî reyd qalî nêkeno, ehlê perdî

yo. La bêrê ma şorê veynê. Ay a dî ra va, ay a dî ra va û mehla ra cenî, carmêrd, xort, gede pêro pêser bî û şî amê.

Eee, şêxê to hinî tam şêx o. Mileto ki şona wêra, şonê destanbê jê, şonê linganbê jê, hedye derê benê û to rê vaja çî-mî... Nêmey Îstenbolî pê hesya û tadya jê ser de.

Vanê rojî rojan miyan de padîşa pê hesya. Padîşa pê hesya, ke yew şêxto anasarên esto. Xwe het dişmiş bî û va :

- Liya yew çîdo anasarên esto, ez berşawa jê dim biyara û yew dostê reyd rona. Miheqeq wayîrê yew keremat o, rojî mi rê lazim beno. Ez wayîrê neyaran a, neyarê mi zaf î, gûrê kê serîserd yenê, yew embazê kê, yew şêxê kê, yew enawa wayîrê kerematan bibo, tam yew paştî ya. Ez jê bisinasna.

Padîşa veynda jê dano û jê dawetê keydê xwe keno. Û vera vera mabênê jên beno weş.

Şêxê to nopol-dopol şarî rê nuşte keno. Zurî ya. Çiyekî çinyo. Û tîmo zê vano :

– Gulê to dî?... Ma xwe rê gamî aver biamênê. Eno xenîmet. Şar qîmetê kê zano.

Bi enî haway reyde key xwe pîrê çî kerdo. Nêzanê çî borê, çî pîragîrê.

Vanê rojî padîşay erşawit dim û va :

– Ti zanê se biyo?

Şêx va :

– Nê...

Padîşay va :

– Giştîrî cenîda mi vinîbiyo, ma niştê veynê. Ti nêzanibê kam zano.

Şêxî va :

– Rehet o.

Ey mevaj ke giştîrî cenîda padîşay zê, bêsilma jê tirawito. Û bêsilma dî ki şêx ame şî padîşay het. Qarqure ja çarneno û kê vanê qay zelzele dekewto. Xwi het va :

– Wilahî ko eka şêx raşt biko û xwera hinî cay mi çinîko.

Şêx hema cor nêresa bî, sili-man sero şî xwe vist dest û lingandê jê, va :

– Şêxê mi ez rica kena, ez bextê to kewta, destê to lew padana, mi yew gi werdo, hinî ti se kenê bik, maşela ti yew heway bikê.

– Şêx vano :

– Çî nêbeno keyna mi, çî nêbeno. Ti mi rê vaj veyna senî hawa yo?

Keynek vana :

– Ena hawa, ena hawa, ena hawa...

Şêx agêreno vano :

– Kergê padîşay estî?

Cenêka bêsilma vana :

– E, estî.

Şêxî va :

– Temam. Ti şêna giştîrî dek mîrî miyan û bida kerg? Tira dim gûrê to pê çinyo. Qet meraq

mek, meters.

Keynek giştîrî dekerd mîrî miyan û da kergda siyay, werd.

Şêx şî hizurdê padîşay het û agêra padîşay ra va :

– Ena mesela to senî hawa ya?

Padîşay va :

– Ez nêzana, giştîrî cenêk vinî biyo. Ti se kenê bik, yew rayîr derê veyn.

Şêxî va :

– Rehet o, ti hîrê rojî mi rê mûsade bik, ez giştîrî vejena.

Yanî şêx enawa sextekar û wayîrê dek û dolapan o. Padîşay va :

– Wabo, hîrê rojî to rê molet.

Hîrê rojî beyntar de vîrat û şêxê to rojo hîrin vejya ame. Padîşa vera warîşt pay, ca da bide û tadya va :

– Se biyo, se nêbiyo?

Şêxî va :

– Temam o.

Padîşay va :

– Senî?

Şêxî va :

– Kergandê to miyan de kerga siyay esta yan çinyo?

Padîşay va :

– Esta.

Şêxî va biyar ay kerga siyay se-rebirne, miheqeq pîzedê ja de wo. Giştîrî keynek nêberdo, cenêk nêberdo, yewekî nêberdo. Kewto, sirmitya yo û cay kerg werdo.

Eno vatedê şêxî sero, kerg day ardiş û serebirnay, ki raşt haniyo giştîrî pîzedê ja de wo.

Ena dawara pey, hinî şêxê to şî aver, deha vêşî name girot, padîşay deha vêşî hewes kerd bide, qîmetê jê deha vêşî bî.

Wezîranê padîşay zê tira fam kerdo û vanê :

– Vanê eno wayîrê kerema-

tan niyo, eno kûra ra ameyo la? Eno filim-mîlima virazeno.

Padîşa vano :

– Bewnînê! Şîma şêxtê mi ra qalî vajê, xatîrê mi maneno. Şêxê mi şêxo raştikên o.

Rojan miyan de yew roj, yew mêrdim ame şêxî ra va :

– Ti zanê se biyo?

Şêxî va :

– Nê!

Mêrdekî va :

– Xizna padîşay abiya.

Mêrdek şî û şêxî veynda cenîda xwe da, va :

– Eha Gulê! Ma gi werd.

Gul va :

– Meters.

Şêxî va :

– Ez çî nêtersa, xizna padîşay abiya, miheqeq erşweno mi dima, ma veynê ez sekena.

Gul va :

– De tiyo ki to ma ardî eno memleket, ti xwe rê zanê ti sekenê. Mi-to ra lûxmê nan ma dest kewto, ma lez wey tara wene şorê, heta ki zurê ma nêvejyay. To va nê. Ewta rind o ma rê. De şo!

– Şêxî va :

– Çî nêbeno.

Çendey vîrat, padîşay wesêna şêxî dim û şêx ame. Padîşa tadya şêxî ra va :

– Şêxê mi roş. Ti zanê se biyo?

Şêxî va :

– Se biyo?

Padîşay va :

– Hal û hewal enawa yo. Xizna abiya û dizdan sendoqa altunan bina hewanaya berda.

Şêxî va :

– Çî nêbeno. Rehet o.

Ey eno vatiştê şêxî ra dim, zera padîşay tikê weş bî. Padîşay va :

– Ti sekenê, se beno?

Şêxî va :

- Çewres roj molet bid mi, ez miheqeq ena xizna vejena.

Padişay va :

- Temam, çewres roj torê molet.

Şêx agêra padişay ra va :

- Feqet tay şertê mi zê estî; şima her şew yew kerga qelew sur kenê û mîrê erşawenê. Çewres rojê to qedya, bê xizna xwe mira biwaze.

Padişay va :

- Wabo.

dim û mesela derê vata. Û xwe het vanê eno şêx heme çî zano, wayîrê kerematan o, nêçe enawa gûrê vetî û ko ê ma zê vejo. Wardê veynê şima çî rayîr derê veynenê. Yan ma peran berê biderdê, yan zê ma jê biyarê ortaxê xizna bikê, yan zê ma yew çî jê serî serd biyarê.

Serokê dizdan agîra va :

- Emşo wa ma ra yew şoro, bindê pajada jê ver goştaro; vey çî qalî keno, çî vano, çî qîrar dano. Miheqeq ko keydê xwe di qa-

- To se kerd?

Va :

- Willa yew qal jê feka vejay û vengê jê ame mi va -cenêkê yew şî- hayo.

Ena qal. Serokê jên va :

- Ti vanê çî rê vato?

Va :

- Nêzana willa.

Bî şewa bîn, serokê dizdan yewna mêrdimê xwe erşawit ki paja şêxî goştare. Ena ray zê Şêxî kerga surkerda werd qedênay û va :



Şêx tadya ame û ceniya jê tira va :

- To se kerd?

- Şêxî va :

- Çewres kerg marê çewres roj yena, ma keyfê xwe kenê, heta çewres kerga ma biqedyo, çewres rojê ma biqedyo, pîl Humo yo. Heta ay çax ma ko cay çî mî pêbiyarê.

Yew qifley dizdan zê esto, çewres ten o. Miyandê jên de zê, yew serokê jên esto. Enî dizdî pê hesyay ke padişay wesênayo şêxî

lî bikê. Abo gorê ma bizanê.

Yew dizd şî, bindê paja de xwe limit ki jên goştaro.

Şewa verên kergê surkerda amey. En ant kerga surkerda ser, kerga xwe werd, destê xwe şitî û şêx agîra va :

- Cenêkê yew şî.

Ena qal. Yanî yew kerg şî. Û enara pey qal fektê jê ra nêvejyay. Hayo ay qala xwe va, sewbî veng tira nêvejya.

Mêrdimekê dizdan şî, sarokê jên persa va :

- Cenêkê didî şî.

Hayo. Veng tira birya. Mêrdimê dizdan agêra şî. Serokê jên va :

- Şima se kerd?

Va :

- Willa qal û vengo ki ame ma; va -cenêkê didî şî- Hayo.

Serokê keleşan xwe het fikirya, va :

- Hela, hela ay ray vato yew şî û ena zê vato didî şî.

Tadya ay bînîra va :

- Hela ena ray ti şo!

Şewa hîrin yewna mêrdimê dizdan şî. O zê ame, sey ay bînan vat. Serokê dizdan va :

- Temam. Mi fam kerd. Şewa verên ti şî vato yew şî, şewa bîn vato didi şî û şewa hîrin vato hîrê şî. Eno çî ki esto ma mareno ha! Ko heta peynî ma bipawo û cako. Ma se kenê?

Peyanê jê va :

- Willa ma zê nêzanê.

Serokê jên va :

- De şorê goştaritiş dewam bikê, ma veynê heta peynê sebe-no.

En dewam kerd, jê dewam kerd, heta kergda peyên. Çewres rojê şêxî qediyay û kerga peynî ya çewresin zê werd. Û tadya cenîda xwera va :

- Temam. Çewres heb tem-mam bî.

Mêrdimê dizdan şî va :

- Willa peynî day, çewres heb tamam bî emşo.

Serokê jên va :

- Willa enawa bo sek tamam, ma heme çewres zê tamam kerdî. Nimajî ko padişaya berşawo ma dim, ma bero viyey ma pirodo. Şima sekenê bikê, enî gûrî safî kê. Ma şorê rica û xwe finê bide, mela cay biko.

Dizdanê bînan va :

- Hinî ma niştê şorê. Ena ray ti şo. Ti jê kenê ortaxê ma, ti rica kenê, ti ma benê teslîm kenê ki qarîşbê ma nêbê, sekenê ti gerek bikê.

Serokê dizdan warişt şî key şêxî û şî dest û lingandê jê. Şêxî va :

- To xêr o? Ti çiy? Çikarey?

Serokê dizdan va :

- Willa hal û hewal enawa yo. Ti zanê.

Şêxî va :

- Çî nêbeno.

Dizd agêra va :

- To va çî nêbeno, la ma sekê?

Şêxî va :

- Rehet o. Vaj ma veynê mesela to beyndê mi kûwena sek, ma hal bikê.

Dizdî va :

- Willa ma ye gi werdo. Ma çewres heb dizdî. Û altûnê padişay ma tirawitî. Rica maya ki tora esta; ti rica ma qebûl bikê; ma altunan bidê to û ti berê teslîmê padişay bikê û namê ma zê nêdê; yanê ti nêvajê filankesan tirawitî. Willa padişaya ma kişeno! Feqet altunan ti çî çax û kûrad biwazê, ma biyarê teslîmê to bikê. Bes ki wa padişaya ma nêanco hizur, ma di dewa nêko, namê ma nêdo. Ti ma bixelisnê enara rindêr çiyekî çinyo.

Şêx agêra va :

- Çî nêbeno, rehet o.

Şêxî seroktê dizdanê va :

- Şima sindoqa altunan wenenê anê filan dikan di ronênê û caverdanê şonê, gûrê şima pê çinyo.

Şêxê to zê da piro şî padişay het. Dizdan sindoqa altunan wênay ard (erd) ay dikan di ronay û şî. Ey çewres rojê jê tamam bibî, çewres kerg heb kerga xwe werd bî. Gerek hinî bişînê, şertê jê û padişay enawa bî.

Şêxê to şî hizurdê padişay û padişaya tadya va :

- Şêxê mi ti amê...

Şêxî va :

- E, ez ameya.

Padişay va :

- To sekerd?

Şêxî va :

- Rehet o.

Padişay va :

- Senî?

Şêxî va :

- Temam o. Altunê to bi qûtîda to ra senî hawa şî, ay hawa hanîkê dikandê filan kesî di ronayeye. Eskerê xwe berşaw wa şorê biyarê.

Ey padişaya bawer nêkeno. Xwe het vano; ecêba? Senî? Kûra ra amê? Erşaweno qûtî anê. Qûtî anê ki sey verê ya. Bira nê abiya, enawa şîya, enawa ameya.

Şêxî va :

- Temam?

Padişay va :

- Temam.

Şêx tadya padişaya ra va :

- Qala to mend?

Padişay va :

- De qala mi, ti dizdanê mi mi rê vejê.

Şêxî va :

- Nê padişay mi, anasar çî nêbeno. Ez nêameya wita ki qetîlam rona, madem ki ez şêxê to ya, ti qedrê mi zanê, mabênê ma weş o, rexbetê mi zê to het esto û ez nêameya wita qetîlam rona. Enî altunê to çewres heb dizdan berdî, ti enî çewres heb dizdan biyarê dekê heps û bikişê, vijdiyane mi qebûl keno? To mira va altunî. Altunî to amê, ti gerek ena dawa bikişê.

Padişay va :

- Madem enawa yo, mi day xatirbê Humay û xatirbê to. Ti şêxê min î. Eger ti enawa vanê, ezê sey to kena.

Û padişay to ay çewres heb keleş efo kerd. Şêxê to vengra, bi dek û dolaban û bi zuran reydeno gûrê zê xwe sera viyarna.

Tay wezîrê padişaya zê estî, vanê :

- La wilay eno çî pa çinyo, ne wendişê jê esto, ne çî, enî zur î!...

Padişaya wezîrana vano :

- Bewnî, heke şima qarmîşê

şêxtê mi bê, wilahî ez şima terk kena. Enawa fam bikê. Şêxê mi, şêxo raştikên o.

Wezîrê padîşay vanê :

- Liya ma enî se kê? Ma enî rê yew filim virazê, ma qe jê risiya nêkenê padîşay het. Liya padîşay qîmet (rûmet) ma de nêverdayo. Ne o bo, ne şêxê jê bo.

Pêro qalanê xwe yew kenê û vanê ma şorê yew sênî biyarê, bindê yew sendoq de ronê, dî-rê hebî qevdê mawerdan (yew bêj gul î) biyarê ay sênî ser nê û yew perde boncê bide û ma hêdîka veynda şêxiy dê, wa bêro. Ma padîşay ra vajê :

- Heke şêxê to şêxo raştikênno, wa bizano bindê ena sendoq de çi esto. Eger o rašta wayîrê kerematan bo, ko vajo, eger çi jê çinîbo, ma jê risiya kenê xwera. Wo ko çi zani bo, gi zano. Wezîranê bînan zê va wabo, eno aqil

beno. Û pêrin yewbîn dî, şî mawerdî çî-nay ardî dekerdî sênî ser û miyandê qûtî di ronay, yew perde ant bide û



veynda padîşay da. Va :

- Bê ewta temaşe bike, eyro şêxê to beylî beno.

Padîşay va :

- Senî?

Wezîran va :

- Eno hewa. Ma veynda şêxê to danê, eger şêxê to şêxo raştikên bibo, eyro beylî beno.

Padîşay va :

- Çiyo? Mirê vajênê.

Wezîranê jê va :

- Nê, wa wo bêro, şertê ma zê estî. Eyro heme çi vejyeno raşte.

Padîşa erşaweno şêxî dim, jê ano û ode de roşayneno û wo zê kiştid roşeno. Qûtî ronayaya, perde bide anteyo; çiyer kiştîra erd resayo. Wezîran vêşêr yew nêzanno çi bin de wo. Wezîrî agêray padîşayra va :

- Eger şêxê to heqiqî şêxo, çi miyandê ena qûtî de esto, ko zanibo.

Ey paştîya padîşay şêxî ra pêta. Xwe het vano şêx heme çi zano, heqiqeten pê bawer biyo ki şêx o. Wezîrî zê yeqîn jênê hasil biyo ki, eno mêrdimo zura yo. Û wezîrî şêxî ra persênê, vanê :

- De vaj, çi miyandê ena sendoq di esto?

Vanê şêx fikirya, fikirya, fikirya ki riy xwe siyako vajo çi... Çi nêzano. Vindert, vindert xwe pîze di va; liya ceniya mi va ma weytara şorê, mi bala ja nêday, mi zanaynê ko rojî yew bela ma

sawyo. Enka ez çi ciwab dana. Şêx xwe rê vinderto dişmişyeno; ên zê vanê de vaj. Padîşa zê pîzedê xwe di vano "şêx wayîrê kerematan o, wo heme çi zano". Biney wext beyntar de vîrat, şêxî da sênedê xwe ro bi namebê cenîda xwe va :

- Ax Gulê, ax Gulê...

Wextok enawa va, de mawetî zê yew bêj gul î, padîşa erd ra hol bî, qoqa jê lew pa day û jê ziyaret kerd. Û agêra wezîrandê xwera va :

- Mi vatê şêxê mi heqiqê şêxo, wayîrê kerematan o, şima vatê nê.



Perde qûtî sera hewana, ewniyay bin di qevda gulan a. Wezîrî têra ewniyay risiyay bî zê, lakim se kê. Padîşay va :

- Mi vatê şêxê mi heqiqî şêxo, şima vatê nê. Bewnî şima senî rezîl bî!

Ena zê şî.

Şêxê to.ame keye va :

- Gulê!  
 Gul va :  
 - Ha!  
 Şêxî va :  
 - Willa eyro enî namedê to ra nê bînê, ka mi bixeniknê. Re-zîleya mi hinî qirik de bî. Ez kewta yew teng ki, mi eno siwend torê werd. Mi va; "ax Gulê, ax Gulê!" To vatê ma şorê, mi vatê ma nêşorê. Eyro sek ay namedê tora nêbînê, senî bînê, tê mede. Mi senîk va "ax Gulê, perde hewana ki bind pêro gul î. Jên va qay zano, enî gulana vato. Halbikê ez bacyaya, teqyaya, mi xwe rê bi namê to veyn-da. Mi ena rayzê xelisna, şî.  
 Gule va :  
 - Ti enka ra pey se kenê?  
 Şêxî va :  
 - Ward hinî ma ewtara koçkê şorê. Bes o.  
 Gul va :  
 - Liya ma kûra şorê? Padîşa newe biyo dostê to, to kere-matê xwe bide nawitî, şehar pê-ro tadyayo to ser di, hema şarî namê to eşnawito, ma senî şo-rê?  
 Şêxî va :  
 - Ez tora vana werz, werz. Bewnî; willay, bîlay, tîlay ez to rê siwend bora ki ena marê nê-manena. Kamik roj bibo, boqê ma vejyeno. De cay çî ma het çinyo, ma enî zuran reyde ewta-ro vejyay. De ma rew wardê ki, ma bi qîba ziway bixelisî.  
 Cenêk vana :  
 - Ez nêwardena, ca ayekî nê şona.  
 Şêx ewniya cenêk linganê xwe erdra verdana, tadya va :  
 - Ez şona, de rojî hesabde şima ame, şima zê mi dima bê-rê, çimkî e zana ki ena mirê nê-manena. Ti zê zana mi di çî çin-

yo, hayo ma end xelisna beso.  
 Şêxê to warişt rayîrî serna, yela şî. Dîrê rojî beyntard vîre-no, padîşa wesêneno ser vano :  
 - Şêx îra vajê wa bêro key ma.  
 Ceniya jê vana :  
 - Şêx enka keyed niyo, key ki ame ma ko tira vajê.  
 Çendey beyntar di vêreno padîşa rayna erşaweno jê dim û ceniya jê rayna vana :  
 - Şêx keye di niyo.  
 Padîşa vano :  
 - Ey pekî eno şêx şî yo kra? Gedê jê vanê :  
 - Willa nêza. Eno yew hew-teyo vinîbiyo, ma nêzanê şîyo asmênan (!), ma nêzanê şîyo memleketandê duran, ma nê-zanê vinîbiyo. Ma zê şaş kerda, zerra ma zê ma dest menda.  
 Padîşa vano :  
 - Hey wax, hey wax! Liya şî-ma senî eno vinî kerd, kûra şû-yo bê mi, Qey mira îzin nêgiro-to. Eno senî hawa yo.  
 Gedê jê vanê :  
 - Willa ma zê nêzanê, zerra ma zê ma dest meda.  
 Padîşa tadya va :  
 - Eman zeman, ezê bide geyrena, şima zê bi de bigeyrê. Şêx, ha şêx!  
 Dîrê rojî beyntard vîrat, ce-nêk gedandê xwe ra va :  
 - Werzênê, werzênê pî şî-ma xwe ra remayo şîyo memele-keket, ma zê werzê rew dima şo-rê, heta ki padîşay yew gûredo pîl ma serîserd nê ardo.  
 Ê bi eno hawa cenî û gedê zê werzênê şêxî dim nanê.  
 Hezek vanê, eno şêx şono dormarê Tireloy di ca beno. Şa-rî tira vatê "şêxo zurayên". Ê hema zê gedê jê ay mal û milkê jê wenê, nêqedyeno.

## HIŞYAR BIN !

Tewfiq EWRÎN

Hey Kurdino  
 di gûşeyên fabrîqan da  
 Hey Kurdino  
 di qanalîzasyon û inşeatan da  
 Hey Kurdino  
 xweyî fabrîqa û şirketan  
 Hey Kurdino  
 xweyî loqenta, otêl,  
 qehwe û meyxana  
 Hûn çî wekî gelê  
 Sodom û Gomorê  
 tevger dibin?  
 Ev çî rewş e hûn têda ne?  
 Ewê xezeba  
 Sodom û Gomorê  
 di ser we da ji we re  
 Birano! Hûn layiqî  
 wê jiyane nînin.  
 De rabin!  
 Îro roja namûsê ye...  
 Îro roja namûsê ye...  
 Îro roja yekitiyê...  
 Hişyar bin!  
 Ê kar û emelê xwe  
 tevlihev kin  
 Hemî bi hev re  
 Destê xwe  
 Dirêjî Kurdistanê xwe ya  
 birîndar kin!



Ji bo tûrne û organîzekirina tûrneyê bixwe, hêz divê. Hêz birêvebirin e. Birevêbirin, bingeha hebûna xebata mizgîniya serfiraziyê ye.

Gava em li xebatên NÇMê dinêrin, armanc, li derdora çanda Kurdî û têkoşîna rizgariya netewî diçe û tê! Ger çanda gelekî ne ji bo netewê xwe be, ew bi

## turneya navenda çandê li Kurdistanê Başûr

Î. XORT



Di vê gera xwe de bi gelek rewşenbîrên Kurdên Başûr re têkilî danîn û ji bilî van rewşenbîran jî, bi kesên konevan, bi kargerên partiyên Kurd û endamên hikûmeta herêma Kurdistanê re jî têkilî danîn. Yek ji van kesan, wezîrê çandê yê berê, Şêrko Bêkes bû. Bi birêz Şêrko Bêkes re bi giranî li ser danûstendina çandê hatibû rawestin. Ji ber ku weke xaka Kurdistanê pîroz, çanda Kurdan jî, hatibû perçekirin û Kurdên li parçeyên parbûyî çanda xwe nas nedikir. Ji bo ku vê perçebûna çandê ji holê bê rakirin, diviyabû ji alî rewşenbîr û hûnermendan gavek bihatana avêtin. Bi pêşniyara kargerên NÇMê û Enstîtuya Kurdî, li ser tûrneyê biryar hate standin. Bi vê biryarê him otorîteyên NÇMê û Enstîtuyê, him jî birêz Şêrko Bêkes pir kêfxweş bibûn. Ev biryar bi protokolekê hate fermî (resmî) kirin. Di vê protokole de, ne bes tenê biryara tûrneyê, biryara tiştên din jî hate standin. Weke di amojgehên (universite) Kurdistanê başûr de xwendina şaxgirtên (öğrenci) Kurdên Kurdistanê bakur, çekirina panel û semîneran, têkiliyên enstîtu, NÇMê û amojgehên Kurdistanê başûr, vekirina şaxên NÇMê li başûr û hwd. ê jî hebûn. Li gorî vê protokole gava yekem NÇMê li Kurdistanê başûr, li Hewlêr şaxekî xwe vekir. Gava diwem jî, ama-

xwe nagihêje tu deverê. Divê berî her tiştî çand, xwerû be; divê çand xwedî bingehê herêmî yan jî netewî be ku bigihêje neteweyên dinê û bibe çandê navnetewî. Bi vê bîr û baweriyê, NÇM jî roja ku ava bûye ta îro xebatên xwe yê çandê li ser vê bingehê meşandiye, dimeşe û wê bimeşe. Berhemên ku têne afirandin, eger negihêjin gel û nebin malê gel, ew berhem wê wînda bibin û tu nixê wan namînin. Ji bo avahiyeke ku li ser çandê dixebite, serfiraziya mezin ew e ku berhemên xwe bi organîzeyê mezin bigihîjine gelê xwe. Em dikarin ji bo NÇMê bi dilekî rehet bibêjin ku gihîştîye vê armanca xwe (tevlî astengiyên dewleta dagirker ku hemû berhem û xebatên NÇMê qedexeyê kiriyê) û têkiliyên xwe, bi gel re xurt kiriyê. Bi

giranî NÇMê ev berhemên xwe bi tûrneyan him pêşkêşî gel kiriyê û him jî, bi çapemenî û çalakiyên xwe kiriyê malê gel.

NÇMê vê havîna ku çû bi tûrneyan derbas kir. Pêşî tûrneya Ewropayê û paşî tûrneya başûr. Par jî tûrneya Behra Sipî çêkiribû. Belê em dixwazin li ser tûrneya başûr rawestin.

Başûrê Kurdistanê ne weke parçeyên Kurdistanê yê din e. Berî her tiştî ev nêzîkî 40-45 sal in ku şerekî çekdarî lê heye. Ji ber vê, mirov dikare bibêje ku jiyana gelê Kurdên Başûr li gorî vî şerê çekdarî şikil standiye. Çek bûye parçeyekî ji jiyana wan.

Berî ku NÇM jî bo tûrneyê biçe Başûr, kargerên Enstîtuya Kurdî û yê NÇMê çûbûn başûr, li ser çandê û li ser têkiliyên rewşenbîrên Kurdan rawestiya bûn.

dekirina tûrnê bû. Li gorî protokola ku hatibû çêkirin wê li çar-deh bajar û navçeyên Kurdistanê

na Nû û endamên kargerîya NÇMê Filîz ûgûz û Îbrahîm Genç û pêşkêşkar Şevîn Civak-



başûr bihata çêkirin. Ev tûrne divêt ku di navbêra 15'ê Tebaxê û 10'ê Îlonê 1993'an de çêbibûna. Belê ji ber hin sedemên teknîkî ne di navbêra van rojan de, di navbêra 27'ê Tebaxê û 18'ê Îlonê de hate çêkirin.

Hunermendên NÇM'ê berî ku herin tûrneya başûr, hîn nû ji tûrneya ewrûpa hatibûn, ji ber vê hebekî giranî li ser wan hebû. Belê ji ber ku cara yekem bû ev tûrneya başûr û xwestina dîtina welêt, ev westandin ji ser hunermendên NÇMê zû avêt. Ya dinê jî, em bi gelî di nava şerekî germ de ne. Westandin çi ye? Çi hunermend û çi ne hunermend?! Bi vê bîr û baweriyê di demeke kin de herçî kesên ku wê beşdarî vê turneyê bibûna xwe amade kiribûn jî. Ji alî teknîkî û ji alî hunerî ve.

NÇMê programa xwe ya başûr, li gorî Îmkanên xwe yê teknîkî, aborî û hunerî çêkir. Li gorî vê programê wê Koma Serhildan (folklor), Koma Amed, Koma Çiya, Ozan Ganî Nar, Şanoya Jiya-

nas wê tevî tûrneyê bibûna.

Turneyê 27'ê Tebaxê dest pê kir. Beşdarên tûrneyê 33 kes bûn. Tûrne ji destpêkê ta dawiyê bi otobusa ku ji bajarê Stenbolê hatibû îcarkirin (kirê) wê bihata çûyîn û hatin.

Di destpêka tûrneyê de bi rastî, em hemû bi heyecan bûn. Ji ber ku wan rojan hîn germa Tebaxê! Derbas nebibû. Me nizani-bû bê wê çi bê serê me. Di gel hewqas pergâlên ku bi me re bûn, weke enstrumentan, kovarên Rewşenê, kasetên ku NÇMê derxistibûn, kostumên folklorê û rengên wekê tîr û mirtalên ku di çavên neyaran re diçikin kesk û sor û zer hebûn. Ji Stenbolê ta Xabûrê di nav hewqas neyar û gerîna wan de emê çawa derbas-bibûna? ev heyecan ne ji tirsê, yan jî, ji girtinekê, yan jî, ji tiştêkî dinê bû. Seranser di demeke wilo girîng de ji serfiraziya tûrneyê bû. Di rewşeke wilo de NÇMê berê xwe da Zaxoyê. Ta gihiştin Zaxoyê. Ji Rihayê û pê ve belkî li deh cihan gerîna leş-

ker û polêsan çêbû. Di van gerînan de, ji xwe pirsra wan î pêşîn "hûn diçin ku û ji bo çi hûn diçin?" Me jî digote wan "em komên hunermend in, ji bo tûrneyê em diçin başûr. em dawetliyê wezareta çandê ne." Me dawetiyê wezareta çandê jî şanî wan dida. Ji bo ku dawetiyê bi tîpên erebî hatibû nivîsandin, ji xwe tiştêkî jê fêr nedibûn. Ji wan heyê ku em dawetliyê wezareta çandê ya Tirkî ne. Me tiştêkî wilo ji wan re nedigot, lê wan wilo fêm dikir. Ji bo ku di hate hesabê me, me jî, dengê xwe nedikir! Bi vî awayî ta Xabûrê bê qeze û bele em çûn! Li gumruka Xabûrê wekilê qeymeqamê Zaxoyê berêz Nîzar Berzencî bi merasimekê, em bi xêrhatin kir. Bi rastî, di vê merasimê de em pir kêfxweş bûn. Ji ber ku destpêk weha bi dil germî û bi şahî dest pê kir. endamên NÇMê û pêşmergeyan, di gel def û zirnê qederê 15-20 deqa ketin govendê. Piştî govend qediya, Kurdên başûr li gorî ku hewqasî birçî û tazî bûn jî, şîva 35 kesan çêkiribûn. Şîv hate xwarin û pê ve di gel tirimbêleke pêşmergeyên muhafiz re, nivê şevê me berê xwe da Hewlêrê (erbîl).

Li gorî protokola ku hatibû çêkirin, wê li 14 cihan program bihatana amadekirin. Programa pêşî li Hewlêr di Hola Medîa de bû. Li gorî mezinbûna bajaran, me dê li Hewlêr û silêmaniyê du program çêbikirina yek di salonê de, yek jî, li derve. Ji bilî Hewlêr û Silêmaniyê, li Kifrîl, Çemçemal, Koysancak, Halebçe, Raniya, Şaqlawa, Rewandiz, Amediyê, Duhok, Zaxo jî, wê program bihatana çêkirin.

Di van programan de wê hevalên NÇMa Hewlêr jî, beşdarî

van şevan bibûna. Me dixwest ku ev programên me pir dewlemend bin, ji bo vê divêt ku hemû komên muzîk, folklor û şanoyê derkevin. Belê ji ber ku dinya ewqasî germ bû, zêdeyî du seatan program nedimeşiya. Gel, ji şevê, ji ber germa diçû. Me jî, ji mecbûrî program kurt çêdikirin û hejmara komên ku wê derketana programê me kêmtir dikir. Di van programan de, di gel kêmasî û hini şaşiyên biçûk, me pir alîkariya hevalên başûr dît. Weke heval Siyabend.

Armanca me di van programan de, ne ku em gel rakin govenda rojekê. Armanca, çanda Kurdên ji hev parbûyî dîsan bi hev bida nasîn bû. Me dixwest, di vê nasînê de em bibin weke pîrekê, ji bo vê nasînê! Li gor baweriyaya me, biçûk be jî, em dikarin bibêjin ku me bîngehek avêt. Li herçî cihê ku programên me çêbûn, Kurdên başûr dewlemendiya çanda Kurdî hîn bêtir dît. Evêna jî, ew pir dilşad dikir. Bi giranî jî, folklorê bandoreke mezin li ser wan dihişt. Çima ku folklor li başûr, hima hima tune ye.

Program, bi pêşkêşkariya hevala Şevîn ji bo hemû çandên

Kurdistanê û şoreşan bi dawetiyaya ser piya dest pê dikir. Di dermafê NÇMê de axaftin çêdibûn (bi Soranî û Kurmancî), mesajên ku dihatin, dihat xwendin, folklor, şano û bi muzîkê dom dikir.

Di van şevan de pîrî endamên parlamento, endamên partiyên, hunermend, rewşenbîr û endamên hikumeta herêma Kurdistanê jî, tevî dibûn. Ev şevên me, di navçeyan de hîn bêtir bi coş derbas dibû. Hima hima hemû kesên navçeyan başdar dibûn. Li navçeyan beşdarbûna jinên Kurd bala mirov dikişand. Nivê beşdarî jin û zarok bûn! Ev jî, li gorî me tiştêkî pir baş bû. Ji ber ku di her demê de jinên Kurdan bîngehî jî çanda Kurdan re kiribû.

Tûrne ji bo NÇMê bi her awayî, di gel kêmasî û şaşiyên xwe, bi serfirazî, bi mizgîniya pêşeroja azad û serbixwe qediya em endamên NÇMê, li ser navê gelê Kurdên bakur spasîyên xwe, li dijî listik û birakujiyê, bi bîr û baweriyê, bi hêviyên ku tixubên ku neyaran çêkirine rabûnê, pêşkêşî hemû kesên ku keda wan di vê turneya me de derbas bûye, hikumeta herêma Kurdistanê, wezareta çandê û hemû beşdaran dikin.

## zarokên me

Tewfîq Jêhat

komek zarok min dît  
li Hekîmbaşî,  
di nav çopê de  
bê çek  
bê medas  
tazî  
birçî  
û  
bê kes, bê xweyî  
dê û bavê wan  
xuşk û birayên wan  
mabûn di bin çopê de  
zarokê me!  
li Kurdistanê  
gulên serê çiya,  
çîçekên  
li dor  
şevkaniya bûn  
belkî kalên wan  
pêşmergeş Şêx Seîd bûn  
belkî xalê wan bû  
Bişarê Çeto  
îro  
li welatê xelkê sêwî mabûn  
bê kes  
bê xweyî  
zarokên me



# rawestanê le lay sayîr

## LETÎF HELMET

### Pismam

*Ba şehaşakan gwê bigrîn  
Şayîrêk deyewê bidwê  
Ba reşebakan Şîrwan Reşîd ra-  
westin  
Nêrgizêk deyewê birwê  
Ba tîfenigekan bê denig bin  
Minalêk deyewê binwê*

Ka delêyn Letîf Helmet yek-  
ser ş'irî be şêwe sade û sivik, bê-  
girêw gol û be nawerok tokme û  
pitewman dête berçaw lew çeş-  
neyka şayîrî mezinî Frensa Ara-  
gon, be xoşewîstekey delêt : *Elî-  
za giyan, mîn be zimanî sadew bo  
hejarekan denûsim, çûnke haja-  
ran parey ferhenig kirîniyan niye.*

Letîf Helmet zor demêke hes-  
tî bewe kirdiwew be êmeşî rade-  
geyênêt ke xewnî mindal le tife-  
nig, nêrgiz le reşeba û textî şayîr  
le textî padişa gewretir û mezin-  
tir e...

Ew şayireye ke çî zordar, çe-  
qo, zindan, polîs, lîs û gûrîsî din-  
ya heye çaw tirsênî naken, û ew  
hîwa gewrew heste pîrozaney le-  
la nakûjin, ke le dilî pencere  
asaw le giyanî hemîşe beharî da  
çekereyan kirdiwe.

*Le destî zordarekan da  
Çeqoy qir û  
Le zewî da, zindan derwê*

*Le dilman da pencerey nwê..*

.....

*Le zewî da polîs derwê  
Le ser leşman da lîs derwê  
Le milman da gûrîs derwê  
Le giyanman da... cîhanî  
nwê...*

Her boye ew leber emhoyan,  
ew le ber ewey ş'irekanî hemîşe  
ew çeke karîgerey bergirî bûwe  
be dest hejaranewe û le ber ewey  
ş'irî ew bestey demî hemû mina-  
lanî gel bûwew çeçoy jehrawî  
naw zamî dagîrkaran bûwe, le  
ber em hoyane ew xoy dezanê û  
her xoşî ew rastiyeaman bo dedir-  
kênêt ke :

*Riqyan lême w ş'irkan im  
Recim deken  
Çî napak û  
Helperist û  
dirozin û..  
Noker e..!"*

Ke delêyn Letîf Helmet ma-  
nay waye delêyn helmetî ş'irî  
Kûrdî, yanî Mehmûd Derwêş û  
Neruda û Mayakovskî eger em  
lewan ziyatir nebêt, ewa ewanîş  
lem ziyatir nîn...

*Em sere  
Ya paytextî xwa konekanî mêju-  
we*

*Eme ş'ire ya gûrîsî qenare ye  
Wa xom bo xom im, ristiwe..!*

Eger ême bixwazîn Letîf Hel-  
met bideyne nasîn û le serî binû-  
sin, pêmwya ye ew kare zorî gere-  
kew le tiwanay bas û dû bas bede-  
re, balam ba carê lem firtsete da  
ewen de bes bêt ba firsetî tir û  
nûsînî çakitir..

Ewey kemawe bilêyin Letîf  
Helmet le salî (1946) le bajarî  
(Kifrî-Kerkûk) le dayik bûwe..  
Yekêke le şayîre gewrekanî  
Kurd û yekêke lew (hende) şayî-  
rey ke binaxey şîrî nwêy Kûrdi-  
yan darişt. Le salî 1970 ta êsta zi-  
yatir le de komele şîrî bilaw kir-  
dotewe wekû (Xwa û Şare Biçko-  
lekeman, Amadebûn bo le Dayîk-  
bûnêkî Tir, Cwantirin Dê, Ew  
Honraweyey Tewaw Debê û Te-  
waw Nabê, Sirûdî Hejaran, Ew  
Namaney ke Dayîkim Nayan  
Xwênêtewe, Gerdelûlî Sipî, Em  
Rûbare Wşîk Nakat, Wşey Cwan  
Gul e Gul.

*Herçim heye lêm bistênin  
Belam twxwa ber lewey ke bi-  
mirênin*

*Çinigê xolî wilatekem  
Le dilekem bipijênin*

.....

*Her çîm heye lêm bistênin  
Herçî yesqan le leşmaye  
Yeke yeke  
Hemûy be gaz derbihênin  
Balam twxwa  
Neken hergîz  
Çilê darî em niştimane bişkê-  
nin*

.....

*Her çîm heye lêm bistênin  
Mûy leşî xom  
Tele tele derbihênin  
Wek gûrîsêk biçînin û  
Bimxinkênin  
Belam neken  
Yek berdêkî  
Em wilate bisûtênin.*

# meşa azadiyê bonn - bruksel

Yusuf CACIM

Werger : Rojê CIVAKNAS

Ji bajarên Bonn ta bajarê Brukselê rewşenbîrên Kurd meşiyên. Ev meş 13 roj dom kir. Rewşenbîrên Kurd, ev 350 km rê bi şahiyêke mezin û bê westan qedandin. Gelên Elman, Holanda û Belçika, rewşenbîrên Kurd bi slavên germ pîroz kirin û himbêza xwe ji wan re vekirin. Ji 150 bêtir mirovên ku nûr ji wechê wan dibare, ji Botanê, ji Mêrdînê, ji Amedê, ji Dêrsimê, ji Serhedê, têkoşîna gelê Kurd pêş çavê mirovên Ewropa kirin. Ji 150 bêtir Kurdên doxtor, mihendis, şayîr, zana, nivîskar û rojnamevan, bi alîkariya birayên xwe yên Tirk, di bin berf û baranê de ev rêya dirêj bi hev re meşiyên û birin serî.

Meşa azadiya rewşenbîrên Kurd ji her kesî ve hat parastin. Gel di nav xwe de digotin :

- Ev meş pir baş e, lê belê dereng ketiye.

Hinan jî, di navbera xwe de :

- Emê namusa rewşenbîran xelas bikin. Di dema pêşiya me de jî, wê têkoşîna me berdewam bike.

Bi hezaran welatparêzên Kurd rîya rewşenbîran girtibûn û wek baranê gul û çiçek davêtin ser serê wan. Welatparêzên Kurd bi mêvantî ev qafîle ji hev didizîn. Gelê Elman di sersala xwe de ev meşa azadiyê temaşe kirin, ji cam û balqonên xwe herdu tiliyên xwe radikirin û ev meş

diparastin.

Prof. Şerîf Vanlî, ji kêfa li ci-hê xwe nedisekinî û digot:

- Feqîrên Kurdan, paleyên Kurdan, gundiyan Kurdan, mezinên wan, partiya wan divê em hîn bêtir bi dinê bidin nasîn û em xwedî lê derkevin.

Di meşa azadiyê de stran hatin gotin, govend hatin kişandin, şano hatin listin, armanca vê meşê û rexneyên meşê hatin kirin. Ev meşên wilo divê ji alî ronakbîr û rewşenbîrên Tirk hîn bêtir bèn parastin. Meşek wilo divê :

- Ji Stenbolê ta Botanê çêbibe ku rihê metropolên qirêj û gomar bi lehiya meşa azadiyê ve bê paqij kirin.

Bi dû sêzde rojan, ev meş bi du rojên rojiya birçîbûnê xelas bû. Di navbera van rojan konsulatê Tirkan li Ewropa vala nesekinîn. Li dijî Kurd û PKK propaganda kirin. Lê ev ji wan re nese-rîfî û ev meş hîn bêtir deng da.

Rewşenbîrên Kurd digotin:

- Ev meşa dirêj destpêkek nû ye. Gelê Kurd jî, ta wek gelên dinê negihîje azadiya xwe, wê meşa me berdewam bibe.

Rewşenbîrên Kurd li ser vê meşê dîtinên xwe gotin.

Prof. Şerîf Vanlî:

- Ez 69 salî me. Ez dixwazim vê yekê bêjim. Ez û Feqî, em karin bi xortên Kurdan re bimeşin. Bi vê meşê, em rewşenbîrên

Kurd, me xwe da nasîn ku em bi gelê xwe re ne û ta Kurdistanek serbixwe çêbibe, wê ev meş bido-me. Li Ewropa meşek wilo me dest pê kir. Sazûmana vê meşê pir baş hat çêkirin. Helbet meşa me li vir xelas nabe. Têkoşîna me wê li derve jî berdewam bibe. Sala 1962'an de Mele Mistefa ji min xwest ku ez têkevim nav têkoşîna Kurdistanê başûr. Li Ewropa min parastina gelê Kurditiyê çêkir. Li gor dîtina min, divê ev têkoşîn û ev sazûman li ser lînga bisekine. Armanca min a vê derê ev e ku ez bi rewşenbîrên ciwan re têkoşîna berdewam bikim!

Ji bo ku em tiliya xwe têxin çavê kor em di vê rê de dimeşin

Ji bo ku em ala xwe di nav alên din de biçikînin em dimeşin!

Kîna hezar salî di dilê me de! Me li ser şoreşê derbikê sond xwariye.

Ji bo ku em agirê Newrozê Li ser çiyayê xwe vêxin em di vê rê de dimeşin.

Guh bidin gotinên Zemanî!

Ro nûh şewqa xwe daye Kurdistanê

Ji bo ku em şitla azadiyê

Li ser rûyê dinê biçikînin em dimeşin.

Zemanî bi vê helbestê dest bi gotinê xwe dike :

- Di dinê de tu gel bê al ne-mayî ji bilî Kurdan. Tu dibê qey Xwedê gotiye : Tu carî ala Kurdan li ser rûyê erdê li ba nabe! Belê, divê ala Kurdan li ber perê asûman li ba bibe. En ku ji xwe re dibêjin em rewşenbîr in, marksîst in, bila dev ji teoriya Mîsak-i Millî berdin û li ba vê têkoşîna Kurd cihê xwe bistînin. Ger li

Tirkiyê têkoşînek hebe û Kurd gelê Tirk neparêzin, wê demê bila Kurdan rexne bikin. Tu kes nikare Kurdan bi şovenîstî rexne bike. Ev meşa me ji wan re şiqamêk e. Gava ku pêşniyara meşa azadî ji min re hat, wê çaxê ez çûm, min ji xwe re solek kirî. Em ne di nav şerê gerîla de ne. Em li Ewropa dijîn, ev wezîfe ji me re şeref e. Dilgeşîya min bi peyvan nayê gotin.

- Jiyana min a li Cizirê, li Şirnexê, li Amadê û kêfxweşîya min a Newrozê, ez li vir dîsa dijîm.

Bi dû van peyvan Haşîm Kutlu dest bi gotinên xwe kir:

- Di vê meşa dirêj de cih girtibûna min, wezîfa mirovahiyê ye. Ev meşa azadî li ser navê rewşenbîrên Kurdan hatiye sazîkirin. Ev nîşanî me dide ku rewşa têkoşîna Kurdan gîhaye dereceyekî girîng. En ku dibêjin. em mirov in, divê di vê têkoşînê de cihê xwe bigrin.

Hozan Emekçî :

- Ez, ji bo ku wezîfa xwe ya welatparêziyê û deynê mirovahiyê bînim cih, tev li vê meşê bûm. Ger ez xwe mirov bihesibînim, ez xwe ji 30-40 milyonê Kurd bihesibînim û azadiya gelê xwe bixwazim û vê têkoşîna bimirêz bibînim, ez mecburî vê meşê me.

Berî deh salî dengê Kurdan nizm bû. Kurd tirsonek û histûxwar bûn. Niha Kurd serbilind û dengbilind in.

Hinek rewşenbîrên Tirk di bin navnasê Kemalîzmê de, xwe ji têkoşîna Kurdan dûr xistin. Berê, dema mirov di rojnama Cumhuriyetê de binivîse hatiye girtin. Îro divê salixa rewşenbîr û yobazan qenc bide nasîn.

Li ser navê sazûmana TKP (Partiya Qominîstên Tirk) Îs-

mail Gerçekler dest bi gotina xwe dike :

- Rewşenbîrên Tirk li ber pirsîgîrêkên Kurdan pir bêhîsî dimînin. Li gor min ev meş ji alî sê cihê girîng e. Yek : Li dijî têkoşîna gelê Kurd, qetliyamên dewleta Tirk protesto kirin. Dido : Bêdengîya rewşenbîrên Tirkan protesto kirin. Sisê : Li ser rîya partîya xwe, şoreşên Kurd û têkoşîna gelê Kurd re li gor hêzê xwe alîkariya wan bike. Daxwaziya min ew e ku hemû rewşenbîrên Tirk li ba gelê Kurdan cih bigrin. Meşa azadiyê heta berbangaya sibê wê berdewam bibe.

Av. Serhat Bucak :

- Wezîfa we, hûn vê meşê bi rastî bidin nasîn. Rewşenbîrên Kurd divê li ba têkoşînê cih bigrin. Ji bo ku ez dengê Kurdan li dinê bidim nasîn, min di vê meşê de cih girt. Rewşenbîrên Kurd rîya meşa azadiyê vekirine. Rewşenbîr bi gel re bûye canek. Di vê meşê de ji 15 gruban navê sê gruban kedkarên Tirk Kemal Pîr, Hakî Karer hatiye danîn.

Di vê meşê de Dr. Rodî Demîrkapi, moralên rewşenbîran bilind dikir:

- Bila tu kes neyê ba min ji bo lingên werimî. Ez miriyan jî sax dikim.

Dr. bi rê de ji hevalên xwe re weha henek dikir. Sala derbasbûyî de lawê wî Şurzan, ji alî hêzên kontra ve hatibû şehîd kirin. Wê demê ew jî, birîndar bibû. Rodî Demîrkapi hisên xwe dixwest bi helbestan bîne zimên. Lê li ser îsarê me, çend gotin got:

- Ev meşa azadiya rewşenbîran ez diparêzim û ji ber vê yekê jî, ez li vir im. Wek her Kurdî ez mecbur im. Li gor dîtina min, divê hemû rewşenbîrên Kurd di nav vê meşê de cih bigirtana.

## HEVAL

Tewfiq Jêhat

Şev tarî ye heval  
Bi tenê nehêle min  
Ditirsim  
Berf dibare  
Dicemide destê min  
Û destê min jî penc tilî ye  
Gul digire, pênuş digire  
Bi namûs, bi şeref  
Wek destê te  
Û bi destê min bigre, bila  
necemide

Şev tarî ye heval  
Diqefilim ji serma çilê...  
Himbêz ke min  
Bi hev re xwe xiş kin em  
Li ber agirê Newrozê li ser  
kurşê

Şev tarî ye heval  
Ez zarok im, nezanim  
Çîrokek bêje, kilamek bêje  
Ez zanim, te jî hez kiriye  
Evîna xwe ji min re bêje  
Şev tarî ye heval  
Bi destê min bigre, em bimeşin  
Ez birayê te, tu jî kekê min  
Li Zagros, li Agirî, li Cudî  
Em bi hev re  
Navê xwe bikolin



# zaroyên

# AGIRÎ

Amadekar : Sevîn Civaknas

Em vê çaxê behsa Kurdistana Başûr bikin. Hûn dizanin, dijmin Kurdistan kirine çarperçe. Kurdistana Başûr jî,

başûr tişteki mezin û neheqî nedixwest. Bi zorê dest danayene ser axa gelên din û welatên din talan nekirin. Tenê ar-

mancek wan hebû. Dixwestin ku li ser axa welatê xwe jiyane kê serbilind û azad bidomînin. Dixwestin ku zar û zêçên

wek perçeyên Kurdistanê yê din, di dîrokê de bêxwedî maye. Bûye welatê mirinê, bûye welatê nexweşî, welatê xizani û qetliaman. Kurdistana Başûr jî, ji kedxwarî û zordariyê nesîbê xwe stendiye û hê jî distîne. Kurdistan welatekî weke bihûştê ye. Lê ev welat di destên zulumkaran de hatiye talankirin, şewitandin û belavkirin.

Gelê Kurdistana Başûr bi sed salan şer kir, şehîd da û ji bo serkeftinê, ji bo rojên ronî û azad li berxweda. Gelê



xwe di nava xweşiyê de mezin bikin.

Ev sed sal e ku li welatê Kurdan şer berde wam e. Gelê Kurd zilm û zordariya neyar qebûl nekir. Herdemê li berxwedâ... Li Kurdistana Başûr nêzikî 40-50 sal in ku şerekî germ didome. Zaroyên Başûrî di nava şer de ji dayik bûn. Ew hînî berxwedanê bûn. Berî ku leyistokan (pêleyizokan) nas bikin, çek û rextên şervanên azadiyê nas kir. Ev zarok, bi çavên listikê li jiyane nêrî... Dayikên Başûr rojekê

dilxweş nebûn. Dayikên Başûr rojeke bê tirs di nava xweşiyê de nejiyan. Her demê xewê wan bi ramana şerê germî birî. Roj hat, li Helepçê û li deverên din, bi hezaran şehîd dan. Ewrên ku jiyane dibarîne ser xakê, mirin barand ser welatê Kurdistan. Welatê Kurdistan ê ku ji çandan re dêkmakî kiribû. Pêşiyên me dibêjin: "navê mirinê nexweş e"... Belê, li Helepçê baran nedibariya; mirin.

derbas bûn. Jiyanê, li bajarê Helepçê ji nû ve aj da... Lê Helepçê qîrkirina reş ji bîr nekir. Çavên zarokan hîna bi tirs, bi hêsir û bi pirsgerêkan tije ne. Hîna mirina sar li derdora wan diçe û tê. Ez dixwazim ku Helepçê bibe muzeke vekirî û çiqas mirovên dinê hebin li wê bigerin. Bi çavên xwe jana jandilên Helepçê bibînin. Bêhna kizûriyên termên Helepçê bikşînin ku He-



bû rûreşiya ewran bû.

Mazûbanên Helebçê şiva mirinê amade nekiribûn, zarokin di xewnên bê sînor de girt, zarokin di paşilên dayikan de, zarokin ku hîn xatir ji dayikên xwe nexwestibûn girt û zarokin jî di listikên kêfxweş de....

Ji ser qîrkirina Helepçê sal

lepçeyên din çênebin!.. Ez naxwazim Hîroşîma, Nagazakî, Awşiwîtz û Helepçê zêde bibin.

Ji wan çavên bi hêrsa janê tije, ez fem dikim ku di demeke nêzik de ew çav bersiveke baş bide dîrok û jiyane...



## E Z A B E

Ezab e

Li ser axa me

Derdor bi gelê me girtine

Di bin ezabê de

Bang dikin dinê

Dibêjin

Em azad in

Mirovên me her roj şehîd

dikevin

Em yek bi yek sond dixwin

Xwîna wan

Li erdê namîne

Di bin ezabê de

Mirovên me

Her roj

Her saet

Di bin ezabê de

Dijmin dixwaze me bitirsîne

Gelê me her ku roj diçe

bêhtir serî hildide

Em li vir

Tenê, bi tenê azadiya xwe dixwazin

Ev maf jî ji me re

Zêde dibînin

Lê rojek wê bê

Ezab tev biqedin

Gelê me wê bigihîje tev

van tiştan

*Efkar Esmeray (11 salî)*



# İnceleme...

## ROMAN VE ZAMAN

Munzur'un pus içinde savrulur  
birbirimizi tüketiyoruz  
Munzur Irmağı cesetler taşıyor  
haykırışlar, ağlamalarla dolup taşıyor  
İvis'im geçit vermiyor  
savaşıyor ve türkü söylüyor bir yandan...

Müslüm YÜCEL - Özgün E. BULUT

Efsaneye göre bugünkü Dersim'in Ovacık ilçesine bağlı Koyunlu köyü civarında bir ağa ve ağanın koyunlarını güden bir çoban yaşamış. Bir gün Munzur'un ağası hacca gitmiş. Ağa hacda iken Munzur, ağanın hanımının yanına gelerek,

– "Hatun, ağanın canı helva ister. Bir helva yap da götüreyim", der.

Ağanın hanımı şaşırır; sonra,  
– "Herhalde canı sıcak helva istiyor. Ama kendine istemeye utandıği için, ağaya götüreceğini söylüyor", diye düşünür ve helvayı pişirir, bir bohçanın içine kor.

– "Al evladım götür," der. O sırada ağa da hacda namaza durmuştur. Ağa sağa selam verirken birden Munzur'u görür. Ağa Munzur'a,

– "Ne o elindeki?" diye sorar.

Munzur,  
– "Ağam canın helva istemişti, onu getirdim", yanıtını verir. Hayretler içinde Munzur'a birşeyler söylemek isteyen ağa başını çevirdiğinde Munzur yok olur. Ağa hacdan döndüğünde konu-komşu ziyarete gelir. Munzur'un ziyarete götüreceği birşeyi olmadığından, bir çana-

ğın içine bir miktar süt sağar ve ağasının yanına gelir. Ağa Munzur'u görünce, "asıl hacı Munzur'dur. Öpülecek el varsa onun elidir", deyip Munzur'un elini öpmek ister. Munzur koşmaya başlar. Şimdiki Munzur ırmağının çıktığı yere varıldığında, Munzur'un elindeki süt bardağı yere dökülür, sütün döküldüğü yerde bembeyaz sular fışkırır. Munzur dağlarda kaybolup gider.

Efsane bu. Fakat yıllar yılı Munzur, Dersim'le özdeşmiş gibidir. Dersimli olunsun olunmasın, kişi mutlaka Munzur'dan etkilenmiştir. Şairler, yazarlar Dersim'siz, Munzur'suz şiir yazmamışlardır adeta. Kemal Bilbaşar'ın "Cemo" ve "Memo", Mustafa Yeşilova'nın "Kopo", Barbaros Baykara'nın "Dersim 1938" gibi romanları, hep Dersim'i anlatırlar. Hasan İzzettin Dinamo, Kutsal Barış adlı 6 ciltlik kitabında, Cumhuriyet'in Mustafa Kemal'e düğümlenen politikasının bir sonucu olarak Dersim'de isyan çıktığını belirterek, "Şeyh Sait ayaklanışı, ülkeye çok kaygılı günler yaşattıysa da iktidarın ekmeğine de yağ sürmüştür" değerlendirmeye

sinde bulunarak Şeyh Sait hareketini İngiliz kılıfına sokmaya çalışır.(1) Ama tuhaftır ki Dinamo'nun bir türlü sırtını yere getiremediği Kemalizm, onu, Dersim'in Pülümür ilçesine sürgüne gönderir. Bu bakir coğrafyanın güzelliğini, çektiği hasretle birleştiren Dinamo, bu zaman diliminde "Sürgün Şiirleri"ni yazar. Şiirlerinin birinde, "Pülümür kızları çalı çırpı / Pülümür erkeği kara bir daldı" der, Pülümür insanını anlatırken. Yine aynı kitapta, Burada yoktur doğanın kurduğundan daha güzel bir yapı

Ancak bellidir tarihin demir ayaklarıyla çizdiği izler"

diyerek, insanların günlük yaşamından kesitler verir. Bu bir yana, o, devletin zulmünün ve ciddi bir sömürünün bilincindedir.(2)

Dersim, kan ve ölüm. Mağaralara sürülmüş insanların çılgılığı. Yanık et kokusu. 21 Temmuz Laç Deresi. Savunmasız insanlar ve insanların sığındığı birçok mağara top ve tüfeklerle taranır. Kundakta bebekler ve anneleri. Gökyüzünün derinliğini süsleyen yıldızlar kararmıştır.

